

HÊVÎ

KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ



S 6 (Etranger)

HEJMAR 1/İLON 1983

40 FF

ESPOIR

HÈVÎ

Revue culturelle Kurde
No 1 - Septembre 1983

Prix : 40 FF

Directeur de la publication : Helkewt Hekim

Réalisation : Joséfa Bertolino et Mohamad Hassan

Collaborateurs : Ibrahim AHMED (Angleterre), Rojen BARNAS (Suède), Ferat CEWERÎ (Suède), Dr. Kemal FUAD (Berlin), Dr. Cemşid HEYDERÎ (Suède), KENDAL (France), MALMISANIJ (Suède), Simko NAKAM (France), Ferhad ŞAKELÎ (Suède), Hesen SEYF (France), ZILFÎ (Berlin).

SOMMAIRE

Présentation - <i>Kendal</i>	7
LANGUE	
Compte rendu du colloque linguistique de mai 1983	8
Trois points de vue sur les problèmes de l'alphabet kurde - <i>O. Sebri, N. Zaza, R. Barnas</i>	25
DOCUMENT	
Un texte inédit de Nazım Hikmet sur les Kurdes	29
LITTERATURE	
Les petits porte-faix – nouvelle - <i>F. Cewerî</i>	39
L'humanité existe-t-elle encore ? – nouvelle - <i>F. Totanî</i>	44
De quatre côtés, nous sommes entourés de feu – nouvelle - <i>M. Baksi</i>	49
Quatre poèmes inédits - <i>Z. Şiro, R. Barnas, M. F. Baran, O. Sebri</i>	53
EN KURDE DUMILÎ	
Le verbe composée dans le dialecte dumilî - <i>Malmisanij</i>	67
Le folklore dumili - <i>Zilfi</i> (suivi d'un glossaire dumili - kurmancî - turc).	83
EN KURDE MÉRIDIONAL	
Introduction aux problèmes de langue - <i>Colonel Tewfiq Wehbi</i>	199
Quelques remarques sur la linguistique kurde - <i>Dr. Kemal Fuad</i>	190
Le soulèvement des Kurdes Mukrî à Dimdim - <i>Abdullah Merdux</i>	182
Nationalisme et Socialisme – Etude - <i>Horace B. Davis</i>	164
Deux poèmes - <i>F. Sakeli et Hawar</i>	159
Le pain et la balle – nouvelle - <i>S. Muhtedî</i>	151
Désarroi – nouvelle - <i>F. K. Ahmed</i>	136

La revue Hêvî (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS – FRANCE. Tél 824 64 64.

Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne inehkûm ?

Ehmedê Xanî (sedsala XVII)

SERECEM

Evîna zimêñ evîna welêt e - <i>Kendal</i>	6
ZIMAN	
Pirsên alfabeya kurdî	8
Sê dîtin li ser pirsên alfabê :	
Elîbêya Kurdî - <i>Osman Sebrî</i>	19
Çend gotin li ser zimanê kurdî - <i>Dr Nurêdîn Zaza</i>	21
Çend gili û gazind ji bona zimanê kurdî ! - <i>Reşîd Simo</i>	22
Rastnivîsına Kurdî - <i>R. Barnas</i>	25
BELGE	
Destnivîsareke Nazım Hikmet li ser Kurdan	29
ÇÎROK	
Barkêşen piçûk - <i>Firat Ceweri</i>	39
Ka merivatî ma ye - <i>F. Totanî</i>	44
Çaraliyê me agir e - <i>Mahmut Baksî</i>	49
HELBEST	
Çend sedsal e li pey hev bi xwînê sor dibî tev - <i>Zinar Sîro</i>	53
Li kelebesta - <i>Rojen Barnas</i>	54
Te difikirim - <i>M. Ferzend Baran</i>	55
Bijî welatê min - <i>Osman Sebrî</i>	58
PIRTÜKËN NÛ	59

DUMILÎ

Dimilkî de lêkerê hevdudanî - <i>Malmîsanî j</i>	67
Folklorê Kurdî ebe zarava dimilkî - <i>Zilfî</i>	83
Ferhengok dimilkî - kurmancî - tirkî	107

KURMANCIYA XWARÊ

ZIMANEWANÎ :	
Zanyarî giştîy pêşekî - <i>Kolonel Tewfiq Wehbî</i>	199
Çend seretayekî zimanewanî - <i>Dr Kemal Fuad</i>	190
LÊKOLÍNEWEY MÊJÛYÎ	
Rasperînî Dimdim û qelaçoy Kurdanî Mukrî - <i>Abdullah Merdux</i>	182
ROŞİNBİRİY GIŞTÎ	
Nasyonalîzm û sosyalîzm – tîoriye Marksistî û kirêkariyekan derbarey nasyonalîzm ta salî 1917 - <i>Horace B. Davis, wergêrawî</i>	
<i>Hesen Seyf</i>	164
HELBEST	
Geraneweyek - <i>Ferhad Şakeli</i>	159
Razî derûn - <i>Hawar</i>	155
KURTE ÇIROK	
Nan û fişek - <i>Selahuddînî Muhtedî</i>	151
Lê gejaw da - <i>Fazil Kerim Ahmed</i>	136



Evîna zimêن evîna welêt e

Her gel xwediye mafê (heqê) jînê û azadbûnê ye. Lê hin ji wan, ji vî mafê bingehî hatine bêpar hiştîm û bindest dijîn. Bindestiya xelkekî, pirîcar, ji kêmasiya yekîtiya wî, ji paşdemayîna wî ya çandî û zanistî û ji qelsahiya wî ya leşkerî tê. Pirr gelên îro azad û serbixwe di demeke dîroka xwe de, ji ber sedemên wisa, bindestî û işxala hêzên biyanî dîtine.

Bindestî, işxal û qelsahî ji bo xelkekî müsîbetekê mezin e. Lê müsîbeta hê mestir ew e ku endamên xelkekî li hemberî zimanê xwe, çanda xwe, wêbêya xwe laqeyd, bêxem û dilsar bimînin. Gelê ku li çanda xwe xweyî dernakeve mîna dara ku qirn û rişeyên wê hew tén avdan, ji hev dikeve, dirize, winda dibe. Parastin û pêşvebirina çanda xelkê pareke serekeya şerê welatparêziyê ye.

Ziman dilê jîndarê çandê ye, lîmê zanava (huwiyyeta) neteweyî ye. Di nav sedsalan de, di nav jiyanê de, bi xebat, tevbûnî û tevkariya bi milyonan kesan çêbûye, dewlemendiya hiş, hest û nérînên mirovên xelkê nîşan dide. Ziman şahidê şehrezayî û bajarvamiya gelekî, neynika giyan û bîra wî ye. Sermayê wî yê dîrokî ye. Ji xelkekî hiz kirin, bi hizkirina zimanê wî dest pê dike. Evîna zimêن, di cihkî de, evîna gel e, evîna welêt e.

Em hemû dizanin ku îro zimanê kurdî di talûkê de ye. Zimanê resmî (tirkî, erebî, farisî), bi riya xwendegeh, qışle, radyo û televîzyonan îndî ketine bajarok û gundêن welatê me. Koça gundiyyên kurd ber bi bajarêن mezin, ên ku navendêن (merkezêن) çandêن serdest in, siyaseta bêgidiya dewletêن ku dest danîne ser welatê me û dixwazin bi hemû awayan rêç û şopa kurdîtiyê, çanda kurdî ji riyê erdê rakin, veguhêriyîn ciyakî, dikin ku roj bi roj peyivandina kurdî di nav neslêن nû de paş ve diçe. Îro em ketine rewşike wilo ku pirîcar hêzên welatparêzêن kurd, têkoşerêن kurd, di civînêن xwe de, di nav hev de, bi *tirkî* dipeyivin, bi *tirkî* dinivîsin. Welatparêzêن ku bi salan ji bo doza kurdî di zîndanan de mane, zimanê xwe hînî zaroyêن xwe nekirine, zimanê ku ji bay û kalêن xwe fêr bûne, negihandine neslêن nû. Hin welatiyêن me yên din bi salan li derveyî welêt mane, çend zimanêن awrûpayî hîn bûne, lê serê xwe ne êşandine, di nav serbestî û azadiya Awrûpayê de jî zimanê xwe yê dê hîn nebûne.

Ev meşa han, ku pêşî lê neyê girtin, dikare di nav 40 - 50 salan de me têxe rewseke trajiktir : neteweyek ne tenê bê dewlet, bindest û bêxweyî lê wisa jî bê zar û ziman, mehkûmê ji rûpelên dîrokê windabûnê.

Wezîfa dîrokî û acila hemû ronakbîrê kurd e ku li zimanê gelê xwe xweyî derkevin, wî biparézin û pêş ve bibin. Lê xweyî derketin : divê ku ronakbîrê kurd, di peywendî û danûstanê xwe yên devkî an nivîskî de zimanê kurdî bikar bînin, rûmet bidin kurdîyê, bawerî bidin karker û gundi-yênc perçiqandiyênc Kurdistanê. Bila bi kurdî peyivîn îndî mîna nîşana «gundîtiyê» an «paşdemayînê», wekî tiştekî şermezârî, xuya neke ; bi tirkî an erebî axaftin jî ne be işaretta «medeniyetê». Divê ku em bawerî bidin keç û xorêtê şoreşgerênc kurd, bi wan bidin fehm kirin ku «enternasyonalîzm» bi zimanê neteweyê serdest peyivîn nîne ; dijane, li rûmet û çanda gelê bindest xweyî derketin e, wan ji gefa windabûnê rizgar kirin e. Divê ku ronakbîrê kurd dewlementiyênc zimanê kurdî, delalî û şîrînî, ronakî û zelaliya wî diyar bikin, biparézin, pergalekê têxin nav rîziman û rastnivîsına kurdî.

Heçî pêşvebirina zimênc, ew pêwistîyeke jiyanî ye : zimanê ku xwe nû nake, ku nikare bersiva nûyîtiyênc jiyanê, yên ramanê, yên zanistî û teknîkê bide ji rûmetê dikeve û dibe pêbiliya folklorvan û heweskarênc tiştênc kevna-re. Riya pêşveçûna zimanê me di nêzandina zarava û devokan de derbas dibe. Di milê din de, me divê kurdî ji zanîn û pêkahiyênc sedsala XXa re vekin, wî dewlementir bikin, zimanê gelerî berebere bibe zimanekî edebî û zanistîyî fireh, zengîn, bedew, ahengdar û zelal.

Kovara «HÊVÎ» ji bo vî şerê çandî derdikeve. Rûpelên wê ji bend û nivîsarênc li ser pîrsîn zimanê kurdî, ên dîrok û civaknasî, ên pîşe û zanistî re, ji çîrok û helbestan re, ji légerînênc folklorî û ji wergerandinênc nivîskarênc biyanî re vekirî ne. Hemû weletiyênc me, yên ku di van waran de tiştekî wan ê gotinê heye, dikarin tê de, bi kurmancî, bi dumîlî an bi kurmanciya xwarê binivîsin. Bêgûman berpirsiyare her bendeke xwedîyê wê ye û di rûpelên «Hêvî» de propaganda an şerê hêzeke siyasî kirin mimkin nîne.

Di dîroka gelê kurd de, «Hêvî» yekemîn kovar e ku bi sê zaravayênc serekeyênc zimanê kurdî derdikeve û dixwaze riya yekîtiya wan veke. Tê de xweydan, ked û xebata endam û hevkarênc Enstituyê, yên nivîskarênc kurdênc ji hemû parçeyênc Kurdistanê heye. Ew di van demênc dijwarî û bindestiyê de pêtiyeke piçûka hêviya azadiya gelê me ye û roniya xwe ji agirê ku berî sê sed salan zane û kurdperwerê nemir Ehmedê Xanî vêxisti bû, ji tîrêjênc «Kurdistan», «Rojî Kurd», «Hetawî Kurd», «Gelawêj» û «Hawar» ê distîne. Geşandin û gurkirina vê pêtiye welatparêziyê barê hemû ronakbîr, hemû azadixwazênc kurd e.

Kendal
Serokê Enstituya Kurdî

Pirsên alfabeya kurdî

Ji 23 ta 28ê gulana 1983, sêzde nivîskar û zimannasên kurdên Iraq, Iran û Tirkiyê li Parîsê civiyan û li ser pirsên alfabê, ên rastnivîsîna zimên û ên pêkanîna yekitiya zaravayê kurdî xebitîn.

Piştî civîna giştîya roja pêşîn, sê komên xebatê – dumilî, kurmancî û kurmanciya xwarê (1) – hatin danîn. Her komekê du roj û nîv li ser pirsên taybetiyê zaravayê (lehçeyê) xwe xebitî. Paşê, di civînêni giştîyê rojên dawîn de raporêne xebatê hatin minaçeşe kirin.

Dî Civîna Gulanê de hin ji pirsên bingehiyêni nivîsîna zimanê kurdî zelaltir bûn ; ji bo lêkolîna ên din ewê Enstitû salê *bi hindîkî carekê* pisporêni zimanê kurdî bîghîne hev. Amanc : rojekê hemû zaravayê kurdî bi alfabeke standard, bi awayekî ronak û yekbûyî bêni nivîsin. Zimanekî yekbûyî, bi gotinêni hemû zaravayan dewlemendkirî û zelal, ku Kurdên hemû navçeyêni welatê me dikaribin pê ji hevûdu fehm bikin, yekûdin binasin, nêziktirî hev bibin. Yekîtiya zimên bingehê yekîtiya gel e.

Va ne, bi kurtî, dîtinêni ku di Civîna Gulanê de diyar bûne û bîryarêni stendî :

KÎJAN ALFABE ?

Îro Kurdên Tirkîye, Sûriye û Libnanê zimanê xwe bi tîpêni latînî, yêngî Iraq û Iranê, piranî, bi tîpêni erebî dinivîsin. Heçî Kurdên Sovyetistanê, ew nivîsarêni xwe yêngî zanistî bi latînî, yêngî din bi tîpêni kîrîlîk (rûsî) dinivîsin. Anglo, di dema îroyî de, zimanê me bi hindîkî bi 3 alfabekeyen cihê tê nivîsin.

(1) *Akademiya kurdiya Bexdayê ji zaravayê kurdiya nîvroya Kurdistanâ Iran û Iraq re «Kîrmanciya xwarû», ji zaravayê Kurdistan Tirkîye re ji «Kîrmanciya serû» dibêje. Gotina soranî ji bo devokê welatê Soran, ku yek ji navçeyêni Kurdistanâ Iraqê ye, tê bikar anîn. Weki ku ji devokêni navçeyêni Behdînan û Botan re behdînanî û botanî tê gotin.*

Ziman

Ç û Ç'

Di bilêvkirina ç ya normal de lêv baş ji hev vedibin, ziman çibigire ji ciyê xwe nalibite. Wekî di gotinên çak, çap, çar «4», çê, çolang, çûn, hwd ...

Lê gava em dibêjin çemê Mûsilê an çiyayê Herekol nîvekê zimên bi esmanê dev ve dizeliqe û dengekî kerr derdikeve . Ji bo vî dengî, ji yê ç ya çûnê veqetînin emê şanekê deynin ser : ç'

Di zimanê kurdî de dora 40-50 gotin vê ç' ya kerr bikar tînin. Lê gotinên ku bi ç yên cihê têr bilêvkirin û wekîhev têr nivîsîn ji dehî kêmter in û talûka tevlihevbûna wan nîne.

Em li mîsalên jêrîn temâse kin :

Çar : jmara 4

Ç'ar : ç'arî, xêlî

Dirûvê her du gotina bi hev dikeve. Lê gava wan di hevokê de bikar tînin tu têkelî namîne :

Çarê gulanê : roja 4 ê meha gulanê

Ç'ara serê bûkê : ç'ariya, ç'arika serê bûkê.

an : Ez çar şev li Dêrikê mam ; ç'arşevê (2) mala ku em lê diman spî bûn.

Ço ! (di ajotima kerê de) Ç'o : dar

Ç'oyen gavan : darê gavan

Li kerê çô kirin : nav di kerê dan ta ku ew meşa xwe bilezîne.

K û K'

Di piraniya giran a gotinan de k wekî ya **Kurd** an **Kurdistan** tê bilêvkirin. Lê di fonetika kurdî de k ya kerr jî heye û di dora 70-80 rayêñ (qirnêñ) bêjeyan de dixuye. Hin gotinêñ ku bi alfabeşa Hawarê wekîhev têr nivîsîn, manayêñ cihê didin.

Her wekî :

Ka : pirs; kanê ?

K'a : k'aya genim

Kal : negîhiştî; zebeşê kal

K'al : mérê biemir

Kam : 1 - kamik, ritûbet

K'am : moşene, cercere

2 - esmanê dev

(2) Gotina ç'arşev ji çara şevê tê û di gelek navçeyan de çarşev tê bilêvkirin. Ev jî nîşan dide ku cihêbûna nava ç û ç' piçûk û guhêrok e.

Bi ser de, nivîskarêن «soranî» hemû alfabeya erebî bi yek awayî bikar nanîne : bi van tîpan jî 3-4 guhartoyêن sereke hene. Kurmancî, ji salêن 1930 an bi vir de, piranî, bi alfabeya latînî ya Hawarê hatiye nivîsin. Lê hin nivîskar, carina, hin tîpêن vê alfabe guherandine, an işaretêن nû bi ser ve kirine. Ev gelemseyî di riya belavkirina xwendin û nivîsandina kurdî de, di riya belavbûna fîkîr û ramanan de asêyîyeke mezîn e. Îro di tu zimanekî din de ev qas têkelî û gelemseyî nîne. Divê ku nivîskar û ronakbîrêن me bi ber-pirsiyarî bilivin, pergalekê têxin nav nivîsandina zimanê me yê dewlemed, da ku welatiyêن me dikaribin hevûdu bi hêsanî bixwinin, yekitiya gelê me bê parastin û têkûz kirin.

Beşdarêن Civînê hemû hemfikîr in ku alfabeya latînî baştır bersiva hewcedariyêن nivîsandina zimanê kurdî dide û divê rojekê Kurdêن Iran û Iraqê jî derbasi tîpêن latînî bin. Lê mixabin, di hoyêن (şertêن) iroyî de, ev yek hê ne mimkin e. Ji ber ku :

- zimanêن resmiyêن van dewletan alfabeya erebî bikar tînin û Kurdêن ku xwendewar in jî bi tîpêن latînî kêm dizanin.

- guherandina alfabe, di dorbenda (çarçeva) van dewletan de, wekî daxwaziyeke serxwebûn an vejetinxwazî dixuye û dikare Kurdan ji hêzêن siyasîyêن van her du dewletan dûr bixîne.

- çapxane û dezgeyêن teknîkiyêن bi tîpêن latînî li Iraq û Iranê bi dijwarî bi dest dikevin.

Di rewseke wilo de em dikarin, qet nebe, du tişt pêk bînin : a) pergaleke têkûz têxin nav alfabe kurdî ya bi tîpên erebî, da ku ziman bi yek cureyî, bi awakî standard bê nivîsin ; b) afirandinêن serekeyêن Kurdêن Iraq û Iranê, li derveyî welêt, bi tîpên latînî çap kin ji bo ku Kurdêن ku tîpên erebî nas nakin dikaribin ji wan istifade bikin.

Di vî warî de pisporêن kurmanciya xwarê dan zanîn ku di alfabeya latînî ya «Hawarê» de du deng kêm in ji bo rastnivîsandina zaravayê wan : l ya stûr û r ya stûr.

KÊMASIYÊN ALFABEYA HAWARÊ

Gelo derî L û R, di alfabeya latîniya Hawarê de kêmasiyêن din hene ? Divê, berî her tişti, em bi bîr bibin ku ev alfabe di sala 1932 de ji bo zaravayê kurmancî hatiye danîn, hewcedariyêن zaravayê din ne daye ber çav. Lewre, divê berê bizanibin ka di rastnivîsîna kurmancî de tu kêmasiyêن wê hene.

Pisporêن kurmancî li ser vê pirse xebitîn. Di vê xebatê de, xasme, ferhenga kurdî-rûsî ya Qanatê Kurdo (ku bi 34 000 gotinêن xwe dewlementirîn ferhenga kurmanciya ta îro çapkiri ye) bikar anîn. Diyar dibe ku di fonetîka kurmancî de hin deng hene ku di alfabeya Hawarê de cih negirtine : ç', k', r a stûr, p' û t'.

Kap : hestî, kapa gulerî
Kar : 1 - şixul, xebat
 2 - qazanc (3)
Kel : kela şir
Kelek : tiştê ku zû dikele
Kelem : lahana ku ji pelên
 wê apraxa çê dikin
Ker : navê heywanê
Kew : ji kewandinê
Kêl : pîvana giraniyê (16 kg)
Kêm : ava zer a kînor û
 pizrikan
Kêr : kêrik
Kulek : a küçük an tendurê
Kur : qure, mexrûr

K'ap : hevsar
K'ar : k'arik, k'ara bizinê
K'el (4) : qele, k'ela Dimdimê
K'elek : k'elekên ser Diclê
K'elem : xîp, pîj
K'er : yê ku nabihîze
K'ew : k'ewa gozel
K'êl : a dirûtinê
K'êm : hindik
K'ér : ji bi kêr hatinê
K'ulek : kesê ku dikule
K'ur : law

Gava ku ev gotin di hevokê de têن bikar anîn şolîtî û têkelî pirîcar namîne. Ji du bêjeyên ku di alfabeya Hawarê de wekhev têن nivîsin lê cihêmana ne, an yek nav e yê din rengdêr (5) e, an ku her du nav bin yek ji wan nêr e, yê din mî ye.

Mîsala jêrîn bi alfaba Hawarê hatiye nivîsin, lê tê de şasfehmî çê nabe :
Ferho kareñ xwe li sûkê erzan firot ; di vî karî de tu kara wî ne bû.

An dema ku dibêjin : *Bîşar kal e*, kesî ku tê negihê ku wî gelek salan borandiye, di nav salan de çûye, bi emr e, extiyar e nîne. Dîsa gava dibêjin *ev hirmê kal e*, herkes dizane ku hirmê negihîştî ye, ne ku extiyar e.

Lê carina rewş ev qas zelal nîne : *Cembelî ka li ku ye ?*

Gelo ci jê tê fehm kirin ? Kanê Cembelî li ku ye ? An ji Cembelî dipirsin ka (ya kadînê) li ku ye ?

Bexçê me tejî kelem in ?

Dîsa du têgihiştinî : 1 - bexçê me tejî xîp (k'elem) in
 2 - bexçê me tejî kelemên apraxa ne

Min kewa wî dayê.

Hin ewê fehm kin ku min têra wî lêxistiye (wî kewandiye), hin jî ewê bêjin ku kewa wî li nik bûye, min daye wî.

(3) Kar, gava ku navekî nêr be bi mana şixul û xebat e : karê min şivanî ye. Navê mî du mana dide 1 - qazanc : kara gavan siwariya keran e. 2 - kara xwey : kara xerza, kara zivingê, xweya karê.

(4) K'el, gava ku navekî nêr be bi mana conege té : k'elê bor.

(5) K'ur gava ku rengdêr (sifat) e, ji bo dewaran mana qiloçjêkirî, ji bo mirovan ya por-jekirî dide. Di mana law de k'ur navê nêr e : k'urê pîrê.

Misaleke dawîn û têkiltir : *Derdê kerîtiyê nayê kışandin.*

Gelo hun jê ci fehm dikin ? Ku derdê kerîtiyê (bêeqiliyê) nayê kışandin an yê k'erîtiyê (nebihîstinê) ?

Lê divê ku em ji niha de bêjin ku di gotinê kerîti û k'erîti de ne tenê k lê wisa jî r cihê ne û emê vegeerin ser vê pirsê.

Bi kurtî, di fonetîka kurdî de du dengêñ k hene : k û k'. Gava ku ew bi yek tîp têñ nivîsîn, ji derveyî çend rewşen istisnayî, şâşfehmî û dijwarî peyda nabe.

P û P'

Derveyî P ya normal di fonetîka zimanê me de P yeke kerr jî dixuye. Lê gotinêñ ku wê bikar tînin gelek kêm in, nagihêñ deha.

Va ne ji bo agahdariyê du mîsal :

Par (navê mê) : beş, behr, peşk **P'ar** (hoker) : sala çûyî

Pîr (navê nîr) : 1) pergal, edeb **P'îr** (rengdêr) : jina extiyar

2) mamoste

(pîrê tariqetê)

Gava ku di hevokê de wan bi kar tînin tevlihevi peyda nabe : *Pis-mamê min par para xwe da bû min.* An : *Pîra te jîr e û bipîr e, lê pîrê we zehf bêpîr e.*

Lê dema dibêjin : *Mixabin, pîr carina bêpîr in,* ji pîrê merem ci ye, pîrêjin an mamoste ? Diyar nîne, lê ev ziraviyêñ ziman in û di gotinêñ ku wekîhev têñ bilêvkirin de jî rewşen wilo xwe nîsan didin.

PIRSA R

Di hemû zaravayêñ zimanê kurdî de 2 r hene : r ya zirav û ya stûr.

Di destpêka gotinê de r timî stûr e : *rabûn, rakirin, rastî, rê, rik, rîşe, roj, rûniştin, hwd.*

Di nav du dengdêran de r pirîcar zirav tê bilêvkirin : *arav, baran, narîn, serek, zerî, jérîn, birin, kirin, tîréj, soran, sore, gurandin, tûrik, hwd.*

Lê di hin bêjeyan de, r ya nav du dengdêran stûr e : *birîn, firîn, kirîn, gerok, girik, berahî, kerik, hwd*

Du gotinêñ ku di alfabeya Hawarê de wekîhev, bi eynî r têñ nivîsîn carina manayêñ cihê didin :

ber (bi r ya zirav), n.n (6) : 1 - meywe, mahsûl (berê darê)

(6) n. n : navê nîr ; n. m : navê mê ; r : rengdêr (sifat) h : hoker (zerf) l : lêker (füll)

- 2 - sing (sing û ber)
 3 - kevir
 4 - firehî (capûnê du ber)
 5 - rû, pêş (wî berê xwe da min)

ber (bi r ya stûr), n.m : texliteke mehfürê (bera eywanê)
têr (bi r ya zirav), r : yê ne birçî
têr (bi r ya stûr), n.m: çewalê mezin
pir (bi r ya zirav), n.m .: avahiya ji bo derbasbûna av û çeman (pira Diyarbekrê)
pir (bi r ya stûr), h : zehf, gelek
girik (bi r ya zirav), n.n : girikê nan
girik (bi r ya stûr), r : xeydok, bîhnteng
bîrîn (bi r ya zirav), n.m : kula bîrîndar
bîrîn (bi r ya stûr), l : bi birek, kér an haletekî tûj veqetandin, jê kirin (goşt bi kérê bîrîn)
gur (bi r ya zirav), n. n : gurê neyarê pez
gur (bi r ya stûr), r : qewî, xurt (bayê gur, agirê gur, mijê gur)

Di van mîsalan de ihtîmala têkelî û tevliheviya manan kêm e, ji ber ku zayendê (cinsê) gotinêñ dirûvdar û fonksiona wan a di nav hevokê cihê ne. Lê di çend gotinan de (ji dehî kêmtil) têkelî dikare peyda be. Mîsala klasik ya kerîtî (n.m) ye. Ci jê fehm bikin ? Bêeqîlî an nebîhistinî ?

Bi kurtî, di fonetîka kurdî de pirseke r heye. Hejmara gotinêñ ku r ya zirav bikar tînin bi çend sedan e. Gava ku di nivîsandinê de cihêbûn naxin nava her du vîneyêñ (texlîtên) r talûka tevlihevbûna manayêñ çend gotinêñ dirûvdar zehf kêm e. Divê ku di alîkî de légerineke kûr bê çekirin ji bo diyar be ka gelo her du bilêvkirinêñ r bi ci qaîdan ve girêdayî ne. Di milê din de divê lista çend gotinêñ ku bi r yên cihê têñ bilêvkirin lê wekîhev têñ nivîsin û dikarin di têghiştinê de şolitî bidin peyda kirin derînin û di wan gotinan (ku hejmara wan ji dehî kêmtil dixuye), de di dewsa r ya stûr de rr deynin. Mîsal :

pirr ji bo zehf, **kerr** ji bo kesê ku nabihîze.

Kengî ku légerinêñ fonetikî yên zaravayêñ kurdî yên din pêwistiya danîna işaret an tîpek din nîşan dan, hindê dikarin wê nûyîti an guherandinê têxîn nivîsandina kurmanciyê jî.

T û T'

Derveyî t ya adetî, di zimanê me de t' yeke kerr heye, lê ew gelek kêm hatiye bikar anîn. Va ne çend gotinêñ ku me wê tê de dîtiye :

t'a (yê dirûtinê), **t'am** (a xwarinê), **t'ar** (a mêtzinê an ya defê),

t'eng (ne fireh), t'ûr (ê ku genim an zad dixinê) û t'ol (a ku çavlider e, dilkoçer û doxînsist e).

Gelo talûka ku mana van gotinan û yên ku di alfaba Hawarê de wekî wan têr nivîsîn nîne ? Bextewarane, naxêr !

ta (hoker) : heta, sibê ta êvarê

ta (n. m) : êşa paludîzmê ; ta girtin, ketin taya mirinê.

ta (n. m) : taq, qat ; xaniyê sé ta, ta kirin.

Ev mane hemî ji ya ta yê dirûtin an por dûr in. Wisa jî mana tam (temamî, tevahî) ji ya t'am a xwarin û vexwarinê qenc cihê ye. Maku, di kurdî de di şûna tam de temam gotin rastir e. Talûka ku kesekî t'ara defê an sergîna tevî tara mirîşkan an tar (par) kirinê bike jî nîne.

Hecî teng (n. m), ew bi mana cih e : tenga wî xuya ye. Gava ku tê gotin sola min teng e, herkes tê digihê ku ew nefireh e, piyê min dişidîne.

Di kurdî de derveyî t'olê, gotina tol (n. m) heye û bi mana heyfê ye. Gava ku dibêjin «wî tola xwe hilda», merem piçek şolî dixuye. Gelo wî heyfa xwe an t'ola (qehpika) xwe hilda ? Ji bo şâşfehmî nebe divê ku bibîr bînin ku rastiya gotina tol (heyf) tole ye û hindê tu têkelî namîne.

Derdikeve ku yek t bersiva nivîsandina zimanê kurdî dide.

BIRYAR

Di fonetika kurmancî de 5 deng hene ku di alfabeaya Hawarê de cih negirtine : ç', k', p', t', û r yek ji her du r yan. Ji bo her çar dengên pêşîn danîna tîpekî an işareteteke nû ne licih e û hin mahzûran dide peyda kirin. Ji ber ku :

1 - Hejmara gotmên ku bi van 4 dengan têr bilêvkirin kêm e û gava ku ew bi tipêr ç, k, p û t yên adetî têr nivîsîn talûka tênegihiştin an tevlihev-kirina wan yekcar hindik e. Di gelekî zimanê cihanê yên din de jî gotinê ku wekîhev têr nivîsîn lê cihêmana ne, an bi awayekî têr nivîsîn lê piçekî cihê têr bilêvkirin hene. Di zimanê pêşveçûyi wekî ingilizî û fransizî de rewşenê wilo ji kurdî zehf bêtir in.

2 - Piraniya gelê kurd nexwendewar e û welatparêzên ku nivîsına zimanê kurdî hîn dîkin, xwediyêñ kêm imkanan in û carina bixwe jî ziraviyêñ fonefîkê rind nizanîn. Bi kesen ku li derveyî xwendegahan, pirîcar bi dizî, hînê xwendinê dibin, cihêbûnê nava ç û ç', k û k' dan têgihiştîm hêsa nîne û dikare bibe sedemê şolibûna hişan. Maku, hin gotinê ku li hin navçeyan bi k' têr bilêvkirin li cihine din bi k têr gotin û ewê xwendewar timî di nav dudiliyê de bimînin : Gelo ev gotin bi k bû an bi k', bi ç bû an bi ç' ? Ji bo belavkirina xwendin û nivîsandina kurdî alfabê dijwar kirin, dijwariyêñ nû saz kirin rast nîne.

3 - Pêşveçûnen teknikî berebere materyelê çapê standardize dike. Peyda-kirina makînê nivîsînê ên xwediyê tip û şaniyêñ taybetî hingî diçe dijwartir

dibe. Niha hebûna Serdayî ya ^ û tîpa ş karê çapkirina rojname û kovarên kurdî dijwar dike. Roja ku ç', k', p' û t' hebin emê hew dikaribin ji binî derkevin. Dewleteka kurda tevî bazareke fireh nîne ku çêkiroxên makînên çapê ji bo wê çapxaneyine taybetî imal kin. Divê ku em dijwariyê nû saz nekin û pirsên teknîkî, yên pêşveçûnên teknolojîyê timî bi bîr bînin, ji veguherîniyê dînyayê dûr nekevin û bêpar nemînin.

4 - Di alfabeaya Hawarê de 31 tîp hene û ew yek ji dirêjtirîn alfabeyen latînî ye. Biservekirina tîpén nû ewê wê hê girantir û dirêjtir bike.

Herçî dengê r, heye ku stûr an zirav bilêvkirina wê girêdayî hin qaîdan be. Divê ku ev pirs qenc bê kolandin. Di vê navê de, çend gotinên bi r ya stûr ku dikaribin bibin sedemê şâşfehmiyê, emê rr binivîsin. Ta roja ku lêgerînên li ser fonetîka dumili û kurmanciya xwarê pirsa r zelaltir bikin.

Bi kurtî, alfabeaya Hawarê bê kemasî nîne lê dikare, bê guherandin, bersiva nivîsandina zaravayê kurmancî bide.

NIVÎSÎNA DUMILÎ Û KURMANCIYA XWARÊ (SORANI) BI TÎPÊN LATÎNÎ

Ewê alfabeaya Hawarê bingeh bê qebûlkirin. Sistemê latînî yên Mac Carus û Tewfiq Wehbî ku di hin kitêbên Kurdên Iraqê de hatine bikar anîn ji alfaba Hawarê çêtir û pratiktir nînin. Hê yek ji wan di nava Kurdên Iraqê de rûnenistiye, lê alfabeaya Hawarê iro bûye ya *piraniya* gelê kurd. Ji bo nêzikkirina zaravayan û ber bi yekitiya alfabê çûyinê, Enstitü ewê dumili timî bi alfabeaya Hawarê binivîsîne. Ewê nivîsarên latînî yên kurmanciya xwarê jî bi vê alfabê bêñ çap kirin.

LI SER «ı» Ü «i», «i» Ü «î»

Di salêن 1960an de li Tirkiyê hin kitêb û kovar di dewsa i ya Hawarê de, i ya tirkî û di şuna î de jî i bikar anîn. Di destpêkê de ev ji ber sedemên teknîkî bû (di çapxanêن tirk de peydakirina î dijwar bû) ; paşê di hin hawiran de bû adet.

Ev yek ji me re xelet dixuye.

- Di dema ku Kurdên Sovyetî jî berebere alfabeaya Hawarê bikar tînin, hin tîpén vê alfabê guherandin dibe sedemê perçebûneke nû di nav Kurdan de. Di van rojêن tunehîya otoriteke merkezî de berpirsiyariya xwenda û ronakbirêن kurd mezin e. Divê ku em tiştêن bi zor, cefa û zehmet avakirî, heta ji me tê, têkûztir bikin, lê xweyî derkevin, pêş ve bibin.

- Di warê zanistî de jî ev ne rast e. Tîpa ı tenê di tirkî de heye û dengekî taybetî dide. Ev deng ji dengê i ya kurdî cihê ye ; i ya kurdî wek ya ingilizî (di *this is de*) ye. Gava ku wê wekî ı ya tirkî binivîsin ew him ji bo

Kurdên Tirkîyê û him ji bo kesên din ên ku bi tirkî dizanin û dixwazin hînî kurdî bin dikare bibe sedemê tevliheviyê.

î ya kurdî wekî ee ya ingilîzî dengekî dirêj e.

- Di alî pratik de, li Tirkîyê bikaranîna i hêsatir e, ji ber ku ev tîp di alfabeşa tirkî de heye. Lébelê li welatên din, xasme li Awrûpa, makînên ku tê de tîpa i hene bi destxistin gelek dijwar e. Herwekî iro piraniya mezin a kitêbên kurdî li derveyî Tirkîyê çap dibin, di alî pratik de bikaranîna i û i yêñ Hawarê ji ya i û i çêtir e.

Em ji hemû welatiyêñ xwe hêvî dîkin ku di vî warî de berpirsiyariya xwe ji bîr me kin, cih nedîn peydabûna dijwarî û tevliheviyan.

PERGALA ALFABÊ

Alfabeya Hawarê, alfabeyeke latinî ye û di hemû zimanêñ ku tîpêñ latinî bikar tînin ev alfabe xwedî pergalekê ye, rêsandina tîpan naguhire. Lê hin nivîskarêñ kurd, heye ku di bin têşîra elîbêtka erebî de, x di nava h û i de, ê di nava i û i de, q di nava k û l de datînin, hin v di nava f û g de, x di nava h û i de, q di nava j û k de dinivîsin.

Ev awa hemû ne licîh in. Yêñ ku 2700 sal berê alfabeña latinî çêkirine, jê re pergalekê jî danîne ; guherandina vê pergalê heqê me nîne.

Va ye pergala rastiya alfabeña me ya latinî : a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, i, î, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, y, z.

BIRYAREN DIN Û CIVINÊ

* Ji bo nêzikkirina zaravayan divê berî her tiştî, dewlemendiyêñ her zaravayekê qenc bê nasîn. Ji vê bûnê, divê em hemû imkanan seferber bikin ku zûtirîn wext gotinêñ her zarava û devokekî, bê guherandin û bê gotinêñ van salêñ dawî çêkirî, bicivînin û ferhengêñ zaravayan pêk bînin. Ewê ji ber ferhengêñ devok û zaravayan ferhenga zimanê kurdî derkeve. Enstîtu ziman-nas û zanayêñ kurd gazî xebatê dike û ji çapkirina berhevok û ferhengêñ wan re amade ye.

* Xebata ferhenga kurdî-fransizî, ku çend sal in dom dike, bilezînin da ku ew riya çêkirina ferhengêñ kurdî û zimanêñ biyaniyêñ din veke.

* Lîsta ferhengêñ kurdî yêñ ku ta iro çap bûne derînin û di kovara Enstîtuyê de çap kin ji bo alîkariya kesên ku li ser zimanê kurdî dixebeitin.

* Divê ku Enstîtu kovareke çandiya giştî derîne û tê de li rex bend û lê-gerînen zanistî li ser ziman, edebiyat, dîrok û sosyolojî, afîrandinêñ nivîska-

rêñ kurd jî çap bike. Sala pêşî ewê ev kovar ji salê du hejmar derkeve (7), her hejmar dora 120-160 rûpel be û sê zaravayêñ kurdi (kurmancî, dumili, û kurmanciya xwarê) bikar bîne.

Rojekê, ku imkan dest bidin, dikaribin kovareke din, bi reng û wêne derîn ji bo belavkirina xwendin û nivîsandina kurdi di nav karkerêñ kurd ên Awrûpayê de.

* Zûtirîn wext «Rêzimana kurmancî-soranî» ya Qanatê Kurdo ji rûsî wergerînin û ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot jî ji fransizî wergerînin kurdi û zimanêñ din (8).

* Di vê navê de ji hemû nivîskarêñ kurd tika dikan : em heryek di tenga xwe de gotinêñ nû çê mekin. Bi vî awayî em zaravayêñ kurdi ji hev dûrtir dixînin, gelemseyiya nav zimêñ zêdetir dikan. Gava ku gotinekê di zaravayek de tune be pêşî binêrin ka di zaravayêñ din de di şûna wê de gotinek heye an na. Ku hebe wê bikar bînin, zaravayan nêzî hev bikin. Gava ku gotinek di tu zaravayeke kurdi de nînbe û jê re di zimanê zanistî an edebî de hewcedarî hebe, pêşneyarêñ xwe ji Enstituyê re bişînin ku ew, piştî bi nivîskar û zimanasên kurdêñ din re şêwirî, dikaribe wê di kovara xwe de ji hemû xwendayêñ kurd re pêşneyar bike.

(7) *Kovara hêvî ji bo bicihanîna vê erkêl (wezîfê) derdikeve.*

(8) *Karêñ wergirandina van her du rézimanan havînê dest pê kirine.*

Sê dîtin li ser pirsên alfabê

ELIFBÊ YA KURDÎ

Elifbê (1) ew tişt e ku ziman pê tête nivisîn. Ev rastiyekê berviçav e ku her kes dizane. Lê kêmî û zêdehiya ku ketiye elifbeyê hin gelan ne tiştekî xuya ye ku her kes bîra bibe, an tê bigehê. Lê kesen ku bi ziman mijûl bûne û xwe di wî warî da westandine di bilêvkirina bêjeyan da ew kêmanî dîtine û nasîne.

Çiroka danîna elifbêya kurdî vedigere berî cil salî. Gava rehmetî Celadet Bedirxan xwest elifbêya latînî têxe şûna elifbêya erebî hin kes ji xwendayêñ kurdan ku digel ziman bendewar bûn civandin serhev û elifbêya ku ji bo zimanê kurdî pêk anîbû raveyî wan kir. Ez jî hingê di nav wan kesan da bûm. Herweki diviya bû mirovekî jîr û serwext bike, Celadet jî dixwest bizane ka dîtina kesen civî di warê elifbêya pêkhatî da çî ye. Camêrên ku hatibûn civînê çiqas ku xwenda û bi ziman ra bende-war bûn jî, di warê ziman da xebat nekiribûn û pê mijûl ne bû bûn. Hemîyan dixwest ku elifbeyekê kurdî bête danîn û bi vê yekê dilgeş bûn. Di nava kesen ku di civînê da hatin dîtin tenê ez û Celadet bi ziman mijûl bûn û me herduyan dikarî di vî warî da bipeyive. Piştî em bi ser û ber li

elifbêya pêkhatî hûr bûn, Celadet ji me pirsî û got :

— Ma hûn tiştekî kêmanî di vê elifbeyê da dibînin ?

Kesekî ji hevalên di civînê da deng nekir. Hînga min gotê :

— Erê ez tê da çar tipan kêm dibînim ku di zaravayê kurmancî da hene. Divê em çavêñ xwe li ser tinebûna wan tipan negirin. Tinebûna wan di elifbêya me da kêmaniyeke berbiçav e.

Hîngê Celadet li min vegerand û got :

— Tipen kêm kîjan in ?

Min gotê :

— ç p k t ne, ku zaravaye kurmancî ji van tipan dagirtî ye.

Hîngê rehmetî li min vegerand û got :

— Rast e ev herçar tip di zaravayê kurmancî da hene. Lê em dikarin ji tipen nîzîkî wan (ç p k t) destkewtî bibin, herweki me bi tipen erebî dini-visandin. Va ye hemî elifbeyê Awropî di navbera 29 - 31 tipan da ne. Eve elifbêya me bûn 33 tip.

Min lê vegerand :

— Hêja ye em jî wek Awropiyan bi pêşkevin, lê ne bi kêmkirina tipen elifbê.

Dema min dît camêrên di civînê da giraniyek nedan gotina min, bi serva min zêde kir, got :

— Dibînim vê gotina min di serê we da cih negirt. Lê çi gava komelek zanistî li Kurdistanê pékbê, ez dê vê kêmaniya di elifbêya kurdî da bidim ser çavêن wê komelê.

Di vê navê da cil sal borîn, ne Kurdistan û ne jî komala zanistî ya ku min dixwestî vê kêmaniya di elifbê da raveyê bikim çar bû. Ez jî kal bûm min xwe nîzîkî gorê dît, min nexwest çavêن xwe li ser vê kêmaniya di elifbê da bigirim, terka Cihanê û gelê xwe yê bindest bikim û biçim gorê. Par bi navê «Elifbêya tikûz» min elifbêyek ji kesen ku dixwazin bi mezinatî hînî xwendina zimanê xwe bibin danî û da hin biraderên kurd ku bidin çapkirin. Heya şopa heyîna van herçar tîpan wenda nebe.

Tevî ku ez bi hebûna van herçar tîpan di zaravayê kurmancî da bawer im jî heya îro min nexistine nav nivîsanên xwe. Naxwazim ji wan kesan bim ku bi serê xwe tiştan bikim. Çi gava Enstitû qîma xwe bi van herçar tîpan bîne hînga dê bi wan binivîsim.

Li vir tiştek heye ku hez dikim di dawiya vê bendê da bidim ber çavêن Enstitû û xwendevanên kovara «Hêvî». Ev herçar tîpêن ku me çela wan kirî di elifbêya biraderên me Kurdêن Sovyet da jî hene. Lê wan işaret danîne ser tîpêن latînî. Herçî min işaret danîn ser herçar tîpêن ku di zimanê kurdî da hene, bawer im ku kira min rastir e. Ez vê yekê dihêlim ji hilbijartina Enstitûyê ra, bila herçiya rast dibîne pê bigire. Biji Enstitû û lebatêن wê yén sergiran.

Osman Sebrî

(1) *Camêrên ku di warê elifbêya Kurdî da peyivîne, an nivîsîne wek Awropiyan bi «alfabe» navandine. Tevî rûmetigîriya min ji zanabâna wan kesan ra, divê em herweki Kurdan di berê da bi «elifbê» bi nav kirine em ji weki bilêvkirina Kurdan binavinin, ne wek Awropiyan. An na em durvê xwe yê kurdî hîdî hîdî wenda dîkin. Dil dixwaze ku em Kurd di her kir û warî da durvê xwe yê kurdî biparêzin, ne wenda bikin.*

CEND GOTIN LI SER ZIMANÊ KURDÎ

Rehmetî mîr Celadet dizanî ku di zimanê kurdî de (kurmancî û zara-vayêñ din) bêtirî 32 deng hene; wek : 2 h, 2 k, 2 l, 2 r, û hin din. Ewî welê didit ku di xwendinê de, peyayêñ ku di dibistanan de hînî kurdî bibin ewê bikaribin van dengan ji hev derêxin. Ji lewre, ewî nedixwest ku elfabeya kurdî girantir bike. Ez bi xwe, pejnên wî rast dibinim. Lê ez wan nakime Mishefa Reş, ne jî Qoran. Heke, sibe yêñ kurdî didine xwendin (mamoste) û yêñ kurdî dixwînin bibînin ku bi vê erebeya ha rêveçûn nabe, ewê bivê, nevê li guhartina wê bigerin.

RAST NIVÎSÎN Û RAST AXAFTIN :

Ev tişt girêdayî salan e : divê Kurd di dibistan û zanîngehan de bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, li her derêñ welatê xwe, bi serbestî bi zimanê xwe baxêvin û bi serbestî herin û werin, kitêb, rojname, akademî, deng û wêneguhêzên wan hebin.

Heya ev tişt çêbibin, divê em nihûda, bi her awayî *guh bidin* kur-manciya HAWARÊ (ez niha xwe têki-lî Zazan û Soran nakim).

Di koma HAWARÊ de, nivîsandi-nen Celadet, Kamuran, Osman Sabrî, Qedrican û him din hene. Divê ku ev bikevin destêñ kesêñ ku dixwazin hînî kurmanciya «edebî» bibin.

Bi navê Nûredin Usif, ên min jî çend nivîsandinêñ min hene ku kur-manciya wan ne xirab e. Divê ku Insti-tut Kurde van nivîsandinêñ ha bigehî-ne hev û wek kitêbokan wan belav

bike.

Yek kirina zaravayêñ kurdî ne tiştikî hêsan e. Lê, di gel vê yekê, divê ku ciyêñ wek Institut, *qet nebe*, tevî kurmancî soranî jî bidine xwendin. Dibêm «*qet nebe*», bra zazayêñ me nexeyidin ...

DERXISTINA KOVAREKE KURDÎ

Navê wê «*Dengê Xanî** be ne xirab e. Bi vî awayî xelk wê çêtir Xanî kî bû, ci digot û ci dixwest binasin, û bi ser de jî Mem û Zîna wî bixwînin. *Têxistiyêñ Kovare* : Divê tê de ev tişt hebin : Réziman (grammaire), dîrok, çîrok, helbest, tiştine wergerandî, zamistî (sciences), felsefe, lê bê fanta-tîzm ; bikin ku pesndayîna ramanekê de, yek bikaribe rexneyîn xwe bide : *Bi korane*, dev ji pesnedayîna ramansa-zîyan (ideoloji) û rejîmîn siyâsi ber-din.

Li Ewropa gelek kovarêñ kurdî derdi Kevin. Hin ji wan demekê dijîn û piştre dimirin. Jiyandina kovarekê ne hêsan e. Li welatekî wek Swîsre (ISVICRE), kovarêñ ku bi frensizî derdi Kevin tevde girêdayî kovarêñ Swîsreya elmanî ne. Bi serê xwe nikarin bijîn. Da ku Kovareke Kurdî li Ewropa bikaribe bijî, divê hin hebin ku piştâ wê bigirin û bi ser de jî divê kiryarêñ wê (abone) pir bin. Peyda kirina wan çawa dibe, êdî hun ji min çêtir dizanîn.

Kovar, her sê meh carekê derkeve baş e.

Dr. Nûredîn Zaza

(*) *Ji bo navê kovarê gelek pêşneyarêñ din jî hatin. Va ne çend ji van navan: Awat, Asoyêñ nû, Çar Çira, Rêgah, Roj, Rêç, Zaxros, Zanyarî, Niştiman, Pîrsiyar.*

ÇEND GILÎ Û GAZIND JI BONA ZIMANÊ KURDÎ !

Mirov dikare bêje : Toreya Kurdî ya nivîsandî ji sedsala dehan dest pê dike. Heye ku ji berî vê dîrokê be jî, lê mixabin tiştekî wilo hêja di destê me de nîn e, ku em bêjin : Toreya Kurdî ji vê dîroka ku me li jor gotiye kevintir e. Kevneşopên torenivîsen me yên hezar salên borî jî ewqas ne pir û zehf in. Bê gûman gelek tiştên hêja ji nivîsarên wan torenivîsan winda bûne û xelkê Kurd tu guhdarî û giringiya mezin nedane wan kevneşopên giran-bîha, ku wan ji windabûnê biparêzin. Üştên serekîn ji vê yekê re, li gora bîr û baweriya xwe ez di van bendêñ jérin de dibînim :

1 - Zimanê ola me ne bi kurdî bûye. Di derbara ku em ola musulmâniyê bi zimanê zikmakî binivîsin û bixwînin gelek sînor û kîlik jê re hatine danîn, ta vê yekê bi gunehhekî mezin jî dihejmîrin.

2 - Tu dewletêñ me Kurdan li ser tevahiya axa Kurdistanê pêk nehatine. Ger hinek imaret pêk hatine jî, wan imaretan serekî dirêj li berxwe nedâne. Dewletêñ zorker zû bi zû rê li pêş wan girtine, ku ew nebin bingehê dewleteke kurdî mezin.

3 - Parvebûna Kurdistanê di navbera Imparatorî û dewletêñ Rohilata Navîn de, çi di dîroka kevin de an nuh de. Vê yekê hêştiye ku em tim bibin hindikahiyeke milî di hundurêñ wan Imparatorî û dewletan de, ku tu kiyan û biha ji zimanê me re tunebe.

Bi bandûriya van bendêñ jorîn kesen me yên zîrek xizmeta zimanêñ biyanî kirine, ew bi xwe jî hukumdarê me bûne, wek Tirk, Ereb û Farisan.

Di dawiya sedsala nozdehan de tevgera kurdîtiyê ji bona sazkirina welatekî serbixwe hinekî seriyê xwe hildabû. Ji ber gelek üştên civakî, siyasi û navnetewî, ew merem û mebestahan bi ser neket. Em dikarin bêjin : wan rîyeke nûjen ji neviyêñ xwe re vekirin, ku ew bi guh zimanê xwe din, wî binivisin û bixwînin. Tiştê ku wan bavpîran ji me re kirine û hiştine, rojname û kovarêñ kurdî derxistine, kevneşopên me bi qasî ku ji wan hatiye civandine û nivîsandine. Em dikarin bêjin : wê tevgera siyasi bi xwe re vejandineke toreyî an wêjeyî jî hanî. Xelkê Kurd bêtir guh da zimanê xwe û lê fikirîn. Gelek şopên hêja di derbara réziman, helbest ji me re hiştine, yeka hîn héjatir wan kesan zimanê kurdî derbasî qonaxa nivîsandina têkist an metinan kirin û bingehê vê yeka giring ji me re danîn. Kurmanciya jêr û jorîn bi taybetî ya pêşîn gelekî bi pêşket. Lê mixabin her du zarava bi du alfabetîn cuda (erebî û latînî) hatin nivîsandin, ta bi niha jî hîn ev yeka han berdewam e, tu xizmet hîn ji bona yekbûna alfabetî-yekê û zimanekî netewî nehatiye kirin. Helbet ûst û sedemên vê gelek in. Li gor nérîna pisporêñ zimanê kurdî alfabetîya latînî gelekî bi kîrî zimanê kurdî têye û ziman dikare pê gelek gavêñ fireh bavêje. Wek nimûne, jî heft saliyê ez tipêñ erebî dinasim, lê hîn ta bi niha jî, ez nikarim bi serbestî ne zimanê kurdî û ne jî yê erebî pê bixwînim.

Îro zimanekî lêtretûrî ku li hemî Kurdistanê hukum dike nîne . Her

devereke Kurdistanê bi devok û zara-vayên xwe yên deverîn dinivîsin. Ji xwe nivîsandin û xwendin bi kurdî ji bilî Kurdistana Iraqê qedexe ye û gunehkariyeke mezin e, divê mirov ji berdêlê ve bête kuştin û di zîndanan de salan bikişîne, ta li Kurdistana Iraqê jî di warekî gelekî teng de zimanê kurdî têye bi kar anîn.

Mixabin ewqas zanîna min li ser kurmanciya jérin nin e, lê ez dixwazim çend rézan li ser kurmanciya jorîn binivîsim. Ta bi niha kurmanciya jorîn bi van awayên jérin têye nivîsandin :

1 - Devokê devera Bahdînan bi (tipênerrebî). Ew gelekî paqij û baş e, lê ew nabe zimanê giştî yê zaravayê kurmanciya jorîn, ji ber ku ew devokê devereke piçûk e.

2 - Awayê nivîsandina Kurdêñ Soviyêt. Ew gelekî bi devokekî deve-rîn û teng têye nivîsandin, ne rêziman û bingeh jê re heye. Ew ji zû de bi devokê xwe dixwînin, lê mixabin ew li ser bingehke şâş e û ne rast e. Helbet ew jî bi alfabeya Rûsî dinivîsin.

3 - Awayê nivîsandina kovara Hawarê bi berpirsiyara rehmetî Cela-det Bedirxan. Ew gelekî paqij û

hêja ye, ji ber ku xwedîyên ku bi vî awayî nivîsandin gelekî li ser girame-tîk û pêşketina zimên rawestiyane ka ci awa dikare bibe awayê kurmanciya jorîn. Ji bingehke rast û xurt de dest pê kirine.

4 - Li dawî divê ez van kesên ku li Ewrûpa rojname û kovaran derdixî-nin hinekî wan bêşînim. Lavayîya min ji wan ew e, ku hinekî gava ew dinivîsin bi kurdî bifikirin û paşê binivîsin. Bi awayê ku ew dinivîsin hemî avahi-yên zimên hildiweşînin. Mirov di nav nivîsarên wan de mat dimîne ku ew bi ci zaravayî û devokê ne !

Lê xuya ye, kolîdaran gelekî mî-jîyê me şuştîye. Nema em dikarin bi kurdî bifikirin û binivîsin. Ji bona xatîrê vê yekê jî, em gelek gotin û termî-nolojiyên çekirî, ku ne bingeh û bini-yat jê re di zimanê kurdî hene, di nivî-sarên xwe de bi kar tînin. Bi vê yekê jî tîhna me naşkê, em destêñ xwe dirêjî alfabeya ku ev bêtirî pêncî salî ye, Kurd pê dinivîsin û dixwînin, bi wê jî dilizîn. Bi vê kirê em bingehê alfabeyê û yekbûna wê di Kurdistanê de hildi-weşînin û tar û mar dikin.

Reşîd Simo

ALÎKARÎ JI BO FERHENGA KURDÎ - FRANSIZÎ

Enstitû ferhengeke kurdî - fransizî çêdike. Ev xebat karên ku Kamuran A. Bedirxan di sî salên dawînên jiyana xwe de pêk anî bû didomîne û temam dike. Ta niha qasî 55000 gotim hatine berhev kirin û wergerandina fransiziya gotinên ku bi tîpê A, B, C, Ç dest pê dîkin qediyaye, tîpa D jî di ber qedandinê de ye.

Ev ferheng ewê mezintirîn û firehtirîn ferhenga zimanê kurdî be û dixwaze, qet ne be, piraniya mezina dewlemendiyê zimanê me diyar bike. Piştî çapa wê ya fransizî, ewê çapêni bi zimanê din (tirkî, almanî, ingilîzî, erebî, farisi) bêñ amade kirin.

Ziman malê hemû kurdan e. Wekî derya ye, kûr û fireh e. Ci şivan, ci gavan, ci koçer, ci cotkar, ci dengbêj, ci nivîskar, her welatikî me vekî inasiyan di nav vê deryayê de mezin bûye û jê parekê stendiye. Enstitû di xebata xwe de hewcê zanîn û alîkariya hemû welatîyen me yén bixiret e. Em dixwazin ku kevirê her Kurdekkî dilsoz di vê avahiya giştî de hebe. Kerem kin, navêniyîn giya û daran, en hêşinatî û meywan, ên rawîr û teyran, en haletê kar an gotinêni ku hun bawer dîkin nadir û kêmđîti ne ji me re bişînin. Ku dikaribin her gotinekê piçek izah kin an wergerandina wê bi zimanê ku hun pê çêtir dizanîn li kêleka wê deynin baştır dibe. Heçî navê giya û daran, heta dikaribin diyar bikin bejna wan çend bilind e, li ku hêşîn dibin (di erdêni avî an bejî de, li devêni çeman an li çolan), berêni wan çawan in, ci reng in, çiqas gir in, têni xwarin an na, tama wan çawa ye ? Ku dikaribin pelek ji darê an jî berê wê, an wêne (resm) yê giya an teyr bişînin hê jî çêtir dibe. Tikaya dawîn :ji bîr me kin, di nameya xwe de bêjin hun ji kijan bajar an navçeya Kurdistanê ne.

Ji niha ve, spasêni germîn ji bo alîkariya we

* * * *

Nameyan li ser navnîşana jérîn bişînin : Ferhenga Kurdi, Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS, FRANCE.

Rastnivîsîna Kurdi

RASTNIVÎSÎNA KURDÎ

Zmanê me î nivîsanî, bi tîpêن erebî ji Eliyê Herîrî, bi tîpêن latînî ji Celadet Bedirxan dest pê dike. Rastnivîsîna bi tîpêن erebî bi ci awayî bû, bi ci awayî nebû baş pê nizanim, lê serpêhatiya rastnivîsîna bi tîpêن latînî ji destpêkê ta îro gelek tevlîhev û bi geleme ye.

Di warê rastnivîsîna bi tîpêن latînî de, ji destpêkê ta îro , sê awa an sê rêgeh berpêşî xwendevanên kurd bûne. Gelo meriv dikare ji van rêgehan re bêje «ekol-école» an na.

Ev sê rêgeh an ev sê ekol ; ne bi xetêن mutlaq, lê bi nézîkayî ev in :

- a - **Ekola Hawarê**
- b - **Ekola Kurdêن Sovyetî**
- c - **Ekola bêla (ne ji aliki)**

Ekola Hawarê bi qasî jiyana kovara Hawarê hevahengiya xwe kudand, di pey mirina Mîr Celadet Bedirxan de ; Mîr Kamuran Bedirxan rêgeheke cihê, Osman Sebrî û Nûredîn Zaza rêgeheke cihê dan ber xwe. Di vê ekolê de cihêtî li ser nivisandina daçeka neyînî bi lêkera laperandi ve nivisandin û nenivisandin e.

Ekola Kurdêن Sovyetê di nav xwe de gîhiştiye yekîtiyé. Bi destê Prof. Qanatê Kurdo gramera kurmancî hatiye bîhevxitin. Bersîva hewcedariyên kurmanciya dorhêla Qersû Agirî dide, lê , ji bo tevahiya kurmanciya jorîn ji bersîv dayinê dûr e.

Ekola bêla, di eslê xwe de ne ekol e. Ji vê tofê (grûb) rastnivîsîn û termînolojiya du kesî ci bigre hevûdu nagrin.

Di xwendin û nivisandina zmanekî de, yekîti û wekheviya rastnivîsînê , serê hemî tiştî ye, kilîta qefla xwendin û nivisandinê ye.

Di warê Kumanciya jorîn de, xwenda û nivîskar, di nîsbeta miletên dinê de hîç tu ne ne, di nîsbeta gengaziyêن (îmkanên) miletê me de çendek in. Bê şik ev kesen ku bi nivîskarî têñ nas kirin û riya nivîskariyê dane ber xwe, bi ceweta gurr kirin û ges kirina agirê tevgera rizgariya welêt , warê çandeyî ji xwe re bijartine. Di vê rêgehê de bûne sparteka moralî bo tékoşerên rizgarîxwazên Kurdistanê. Lê dîsa jî di navbera giştan de tunebûna yekîti û wekheviya rastnivîsînê kil û kemasikî ye.

Çerçewa rastnivîsînê gelek fere ye. Yek bi yek li serê rawestan, ji ber çerçewa vê nivîsarê ne gengaz e. Mebesta vê nivîsarê rawestana li ser teşeyîn neyînî (forme négative) ne.

Belê di ekola Hawarê de neyînî çawa hatiye nivisandin. Daçekên neyînî (me, ne, na, ni) bi lêkerê ve divê bê nivisandin, an cihê ? Pirs ev e, û lêhûrbûna me jî li vê ye.

Bi awayê Mîr Celadet Bedirxan (1)

A) Lapérina* lêkera nederbaswer (verbe intransitif) (Demêñ tofa yekemîn)

1 . Boriya borî (prétérit)	Ez ketim	Ez ne ketim
2 . Boriya dûdar (prétérit narratif)	Ez ketime	Ez ne ketime
3 . Boriya berdest (imparfait)	Ez diketim	Ez ne diketim
4 . Boriya berdesta domdar (imparfait duratif)	Ez diketime	Ez ne diketime
5 . Berdesta bilanî (imparfait du subjonctif)	Bila ez biketama	Bila ez neketama
6 . Hekînî (Teşeya 1a)	Ezê biketama	Ezê neketama

B) Demêñ hevedudanî (temps composés) Demêñ pêşkerî (temps de l'indicatif)

1 . Boriya çirokî (plus-que-parfait)	Ez keti bûm	ez ne keti bûm
2 . Boriya néze-çirokî (plus-que parfait approximatif)	Ez diketi bûm	Ez ne diketi bûm
3 . Wêbêya berdest (futur antérieur)	Ezê keti bim	-----

Demêñ bilanî

4 . Boriya bilanî (subjonctif passé)	Ez keti bim	Ez ne keti bim
5 . Boriya çirokiya bilanî (plus-que-parfait du subjonctif)	Bila ez keti biwama	Bila ez ne keti biwama
6 . Hekînî (Teşeya 2a)	Ezê keti biwama	-----

C) Fermanî (impératif)

1 . Fermanî	Bikeve	Mekeve
	Bila bikeve	Bila mekeve
2 . Nihoya pêşkerî (présent de l'indicatif)	Ez dikevime	Ez nakevime
3 . Nihoya domdar (présent duratif)	Ez dikevime	Ez nakevime
4 . Wêbê (futur)	Ezê bikevime	neyînî tu ne ye an ez nakevime
5 . Nihoya bilanî (présent du subjonctif)	Bila bikevime	Bila nakevime

* Pirsên rezimanî hé di kurdî de baş bîcîh nebûne. Yén vê bendê ji ber kitêba Prof. Kamûran Bedirxan «Langue Kurde» hatina girtin û em wan teví wergerandina wan a fransîzî didin. Lapérin (bilapére !) a lékeré bi mana kîşandîna, bikar anîna fi lîye. Gotina borî ji borandiné te û dema borî nişan-dide. Kurden Iraqê jê re rabirdû û ji wêbê re dahatû dibêjin. Teşe şekl e, «forme» e.

Şandek I

ANİN
EXISTIN

bîne
bêxe

me bîne
me êxe

Bi kurtî :

Di tofa (grûba) A de ; 1, 2, 3, 4, cihê 5, 6 bi lêkerê ve,
di tofa B de gişt cihê,
di tofa C de gişt bi lêkerê ve hatine nivîsandin. Di raweyên fermanî yên lêkera anîn
û existin de daçeka neyînî dîsa cihê hatine nivîsandin.

Mîr Kamuran Bedirxan daçeka neyîniyê di Hawarê de mîna Mîr Celadet, lê, piştî
Hawarê bi termamî bi usûla îmla fransizî, ji lêkerê cihê dinivisîne. (2)

Ji ekola Hawarê Osman Sebrî (3) û Dr. Nûredîn Zaza (4) daçeka neyîniyê her bi
lêkerê ve dinivisînin.

Ev daçeka neyîniyê cihê an bi lêkerê ve nivîsandin, di ekola Hawarê de çîma rûne-
nişt ? Çîma hevûdu baş pê serwext nekirin. Bê şik Mîr Celadet zana bû, lê belê sedemên
van têveliyen ci bûn ? Awayê Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza pratîktir e, lê, Mîr
Kamuran çîma bi temamî bi eksa vana çû. Belkî bersîv heye, lê, ez rast lê nehatime.

Ez di mantîqa awayê Mîr Celadet de tênegihîstîm. Her wekî :

Tofa A ; 1, 2, 3, 4, çîma cihê ne, di 5 û 6 de çîma bi lêkerê ve ne ?

Ku mantîq ev be, «daçeka neyînî «bi» hiltîne», wê gavê meriv dikare bêje ku : têve-
liya «di» û «bi» di aliyê fonksiyonê de ji hev ci heye ? Di A / 1, 2 ; B / 1, 4, 5 de bi lêke-
rê ve, ne «di» û ne jî «bi» hene, lê çîma daçeka neyîniyê di vana de ji cihê ye ?

Tofa B ; teşeyên neyînî yên 3 û 6 nayîn nişan dan. Bi dîtina min bo 3 , «ezê ne
keti bim, ezê ne çû bim», bo 6, «ezê ne keti biwama, ezê ne çû biwama/ezê ne çû bûma»
di zimanê axaftinî de tê bi kar anîn.

Dîsa bi dîtina min neyîniya «ANİN» ê meîne an meyne
ya «EXISTIN» ê mexe an mexê ye.

Mîr Celadet jî, Mîr Kamuran jî dibêjin ku neyîniya wêbêyê (futur-e) tu ne ye, an
neyîniya nihoya pêşkerî (présent de l'indicatif) ya wêbêyê ye jî.

Gelo bera tu ne ye ? Ez ketim şikê. Çend pirs û bersîvên teşeya wêbêyê hatin bîra
min. Ka em bi hev re lê binihêrin :

- Tê herî Diyarbekirê ?
- Na, ezê neçim.
- Tê rojiya xwe bixwî ?
- Na, ezê nexwim, lê Ahmed wê bixwe.
- Tê mîr kî ?
- Na, ezê mîr nekim.
- Tê malê bifroşî ?
- Na, ezê malê nefroşim.

Bi vê teşeyê awayê axaftinê heye û gelempere jî.

Rast e, bersîva bi neyînî bo teşeya wêbêyê bi ya nihoyî jî heye. Lê maneyeke dinê
dide :

- a) Bi neyîniya wêbêyê
- Tê herî Diyarbekirê ?

- Na, ezê neçim (nerim).

b) Bi neyîniya nihoyî

- Tê herî Diyarbekirê ?

- Na, ez naçim (narim)

Di bersîva «a» yê de ; hezir û ihtîmal heye. Lê di bersîva «b» yê de bîryardayineke heye. Kirin û nekirin gîhiştiye bîryareke dawînî.

Herweki tê ditin di bareya rastnivîsına teşeya neyînî yên lêkeran de, ji ekola Hawarê sê şax derketine û her sê şax jî awakî dîtir pêk anîne.

Di vê nivîsarê de min awayê Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza pêk anî, lewra min ew pratiktir dît.

Belê pirsa li ber me ev e, yekîtiya rastnivîsına kurdî bi alfabe ya latînî wê çawa pêk bê ?

Malzemeyên berdest. Ekola Hawarê sê rê derkiriye- Ji vana kîjan :

- di aliyê ilmî de rastir e ?

- di nivîsandinê de pratiktir e ?

û çîma ?

Divê bersîvên vana bêñ dayin ku meriv bikaribe bigihîje sentezeke bijûndar (sihhî).

Ji vê nivîsarê mebesta min, di rastnivîsinê de gelşêke piçûk berpêş kirin û di dawiyê de, di navbera zmanzanan de, vekirina vê minaçeşeyê ye.

R. BARNAS

(1) *Emir Djeladet Bedir Khan et Roger Lescot, Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji), Librairie d'Amérique et d'Orient, Adrien MAISONNEUVE, 11, rue Saint-Sulpice, Paris 6e. 1970.*

(2) *Kamuran Bedir Khan, Langue Kurde, Tome I et II, Éléments de Grammaire extraits des cours donnés à l'École Nationale des Langues Orientales Vivantes, Paris 1953.*

(3) *Osman Sebrî, Ziman di Jîna Miletan de, Hêviya Welêt (Berhevok) 1976, rûpel 22-24.*

(4) *Dr. N. Zaza, Şerê Mêşa, Hêviya Welêt (Berhevok) 1976, rûpel 62-64.*

Belge

DESTNIVİSAREKE NAZIM HIKMET LI SER KURDAN

Nazım Hikmet mezintirîn helbestvanê tirkê sedsala XX a tê nasîn. Helbesten wî ta fro, di bêtirî cil zimanên cihanê de çap bûne.

Nazım li ser evinê, li ser dostaniyê, li ser hesreta welêt, li ser azadiyê û gelek jî li ser şoreşê û rizgariya mirovan nivisiye. Wî ne tenê xwezî û şerên gelê xwe, wisa jî yên Asya navîn, Awrûpa, Afrika, yê Hindistan, Çin, Kuba, Endonezya, hwd ... stiriye. Heta li ser azadîxwazên Tanganîka jî helbestan gotiye, lê di nivîsarên wî yên çapkirî de li ser cîranên wî yên kurd, ên ku di salên 1920-1930 li Tirkîyê, dû re li Iran û Iraqê ji bo azadiya xwe şer dikirin, tiştek ne nivisiye. Rejîma tirk a ku wî 17 sal di zindanan de hişt, mecbûrê sîrgûnê kir, bi milyonan Kurdan jî di bin nîrê zordestiyê de diperçiqand, bi sed hezaran di wan qir kir, lê ji azadîxwazên tirk kes, bi eşkere, piştîvaniya gelê kurd ne kir, deng dernexist. Tu kes, heta Nazım jî.

Destnivîsara ku em di kovara xwe de çap dikin, dîtinê helbestvanê navdar li ser Kurdan diyar dike û loma ji me re girîng xuya kir. Ew li ser heşt pelikên 13,5x21 sm hatiye nivîsin û di nav arşîvên Mîr Kamuran Bedirxan de, ku niha li Enstîtuyê ne, derketiye. Li ser pelikan tu tarîx ne hatiye danîn, lê ew di nav dosyake mezîn a belgên din de bûn û li ser dosyê bi xwe, û li ser piraniya belgên wê, tarîxa 1961 hatiye nivîsin. Ihtimaleke mezîn e ku ev destnivîsar jî di sala 1961 de hatibe nivîsin û parçeyek ji nama Nazım Hikmet ji K. Bedirxan re be.

Mîrê rehmetî çend caran ji min re gotibû ku wî Nazım hê ji Stenbolê nas dikir û malbatên wan nasikên hev bûn, ku heta mirina Nazım (3-6-1963) wan ji hev re name dinivîsin. Di salên 1950-1960 de, Mîr serokê Mijûlgeha Kurdî ya Parîsê û wisa jî mamosteyê zimanê kurdî li Zanîngeha Parîsê bû.

Kendal

Kökleri güzellerin derinliklerine olan, 1 tarihiyle, kültüryle kürt milletinin önemli bir soğanlığı Anadolunun bir parçasında yaşar. Anadolunun öbür parçalarında yaşayan Türk milletini kürt milleti kardeşisi sayar. Her iki millet, bütün imparatorluklar gibi; halkları zindan olan Osmanlı imparatorluğununda, Türk ve kürt derebeylerinin, Osmanlı emperatörlerin idaresinin ağır zincirlerine ve sularına düşerler. Osmanlı imparatorluğu yokluktan sonra ise her iki millet emperyalisme karşı tek

bir cephe kurup çarpmışlardır. Anadolu millî kurtuluş hareketi yalnız Türkler için değil, kürkler için de tarihlerinin en şereflü sayfalarından biridir. Odörüs Jelicerenin, sonradan Türk idarecilerine yanak edilen en unutulmaz Türkülerinden biri: "Vurucu Kırk usagi namus günüdü", duya baylar.

Türkçe Cumhuriyetinin kurulmasından sonra, Türk idarecileri ve ejderen şerifleri, Kürk hıcelerinin tanımıya varlıklarını millet

Piraniyeke girîng a neteweyê kurd, ê xwedî dîrok û çandekê ku qirnên wan digihêن kurahiyêن sedsalan , di parçekê Anadoluyê de dijî. Neteweyê kurd, neteweyê tirkê ku di parçeyên dinêن Anadoluyê de dijî (ji xwe re) * bra dihesibîne. Her du netewe, di împaratoriya Osmanî de, ku wekî hemû împaratorian zîndana gelan bû, li zîncîrên giranêن derebegên Tirk û Kurd û yên idara împaratoriya Osmanî hatine xistin. Piştî hilweşandina împaratoriya Osmanî jî her du netewe yek cepheyek danîne, li dijî emperyalîzmê şer kirine. Tevgera rizgariya neteweyî ya Anadoluyê ne tenê ji bo Tirkan, lê ji bo Kurdan jî yek bi şereftirin rûpelê dîroka wan e. Yek ji stranêن ku qet nayê ji bîr kirin ên wan salêن şer wisa dest pê dikir : «*Vurun kürt uşağı namus günüdür*» (lêdin lawê kurd, roja namûsê ye), paşê karbidestêن tirk wê qedexe kirin.

* Gotinêن di nav heyvokê (parantêzê de) di eslê nivîsarê de nîn in, ji bo edilandina wergerandinê hatine danîn.

Ve insan haklarını tanımadı, ~~hatta~~
ipi Kürt milletinin millet olarak var-
lığıne ~~de~~ bile inkâra kadar götürdü.

Bu devir, Türk idarecilerinin ve
egemen sınıflarının ~~emperyalizm~~
le uzlaşmaya başlamasıdır.

Bu inkârla bir uzlaşmanın
ayrı ~~değişiklik~~ devirinde baş gösterdi.
Terimi sadece bir rastlamanın
değildir. Bugün Türkiye Cumhuriyetini
Ona ve yüklen doğuda emper-
yalizmin kalelerinden biri haline geti-

ren Türk politikacılara Kürt milleti⁴
nın millî varlığını inkâr da israr
ediyor ve Türkiye Cumhuriyeti Sınırları
içinde öteki ozenleklerin tanıda-
ğı hakları bile Kürt milletine tan-
~~ıracı~~ mıyor.

Türk ve Kürt halklarının Türkiye
Cumhuriyetinin sınırları içinde
bir ve iş politikada aynı emellerle
harbet sekmeleri bugünkü Türk
idarecilerini konutluyor. Her iki
millet arasında millî kültürlerini,
millî ekonomiklesini geliştirmek,

Piştî damezrandina Komara Tirkiyê, karbidest û hawirên serdestên Tirk mafênet neteweyî û mirovîyên ku ji gelê kurd re wad kiribûn nenasîn. Biserde, ewan pirsê heta înkarkirina hebûna neteweyê kurd wekî neteweyek jî (pêşve) birin. Ev dem, dema ku karbidest û sinifên serdestên tirk dest bi emperyalizmê re lihevkirinê dîkin e. Tesadif nîne ku încar û lihevkirin di ey-nî demê de diyar dibin. Îro siyasetkarên Tirkên ku Komara Tirkiyê xistine rewşa yek ji kelên emperyalizmê di Rojhelata Navîn û Nêzîk de di înkara hebûna neteweyîya Neteweyê Kurd de israr dîkin û mafênet dinav tixûbêñ Komara Tirkiyê de ji hindikahiyêñ din re dinasin jî ji neteweyê Kurd re nasnakin.

toprakta, tâcim arâşârenâ, hürriyeti demokratik haklara kavusmak istiyor. Türk ve Kürt halkları Türkiye Cumhuriyetinin tarafsız bir des politika gütmeyini, emperyalismin sisâ olmaktan kurtulmasına özлüyör. Gerçek Türk yurtseverleri Kürt Kardeşlerinin Türkiye Cumhuriyeti üzerindeki içinde millî haklarına konumda iin yaptığı kargaya can vermek için Kürtlerin destekliyor, ve gümülden nesil destekliyor,

gerçek Kürt yurtseverleri de Türk halkının demokrasî ve millî bayanlığında iin yaptığı kargayı öflece destekliyor.

Anadolu'da yan yan Türklerle Kürtlerin arasında nifak sokmak istiyen genel, sümürcü, karantik kurumlar, emperyalisimle elde vererek halklara mizâz daha kolayca egzme istiyorlar. Kürt ve Türk halklarının bâhtiyarlığı, inanca

Gelên Tirk û Kurd, di nav tixûbêñ Komara Tirkîyê de, di siyaseta derve û hindur de hesreta eynî mereman dikîşînin û ev yek karbidestêñ Tirkêñ iro ditirsîne. Her du netewe dixwazin çandêñ xwe yên neteweyîyê bra, abori yên xwe yên neteweyî bigeşînin, bigihêñ erdê, haletêñ erdçinîyê (ziraetê), azadî û mafêñ xwe yên demokratîk. Gelên Tirk û Kurd bêri dîkin ku Komara Tirkîyê siyaseteke derveya bêali bimeşîne, ji binketiya emperyalîzmê bifilîte. Çawa welatparêzêñ Tirkêñ rastî piştîvaniya şerê ku brayêñ wan ên Kurd dîkin ji bo gîhandina mafêñ xwe yên neteweyî di nav tixûbêñ Komara Tirkîyê de, welatparêzêñ Kurdêñ rastî ji pişta şerê gelê Tirk ji bo demokrasî û serxwebûna neteweyî digirin.

Yaşamaya Varmak İçin Derebeylerine,⁷
Kara Kuvvetlere Şehir ve Kış Ağası-
lorna, gençilere, ailelere millet-
lerin Varlıklarına ve millî hale-
lари и inkar edenlere, halkın
birbirine düşüp sertlərindən
rahatça geçinenlere, emperyalis-
mının usahlarına karsı "şürettii"-
kərəi yeni millî hərbiess sava-
şının zaferi kiçt ve Türk halk-
ları el birliğiyle kazanılır.

ancak böyle bir el birliğiyle⁸
kardeş ilki millət hərriyətə,
milli və ənsən haklarına
karasaklılı

Nazım Hikmet

Hêzên paşverû, kedxur û tarîyên ku dixwazin berberî têxin navbera Tirk û Kurd ên ku li Anadoluyê dijîn, dixwazin destêñ xwe bidin yên emperyalîzinê, gelên me hêsanîtir biperçiqînin. Serketina şerê rizgariya neteweyîyê nû ku gelên Kurd û Tirk ji bo bextewariyê û jiyanekê mirovî li dijî derebegan, hêzên reş, axayên bajar û gundan, paşverûyan, nijadperestan, înkarkiro-xên hebûn û mafêñ neteweyîyêñ neteweyan, (li dijî) yên ku gelan berî hev didin, li ser pişta wan bi hêsanî ebûra xwe dikin, (li dijî) xulamên emperyalîzmê dimeşînin, bi tevkariya gelên Kurd û Tirk bi serkeve.

Tenê bi tevkariyeke wilo her du neteweyêñ bra ewê dikarîbin bigihêñ azadiyê û mafêñ xwe yên neteweyî û mirovî.

Nazım Hikmet

KITÊBXANA ENSTÎTUYÊ

Kitêbxana Enstituyê dixwaze bibe hîmê Kitêbxana Neteweyîya Kurdistanê. Tê de niha bi 25 zimanan qasî 2400 cild kitêb hene. Hin ji van kitêban gelek kevn in, di sedsalên 18 û 19 de çap bûne. Hin destnivîs jî hene.

Ji kovarêñ kevn, civanbendêñ (kolleksiyonêñ) Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û Kurdistan (Iran) temam bûne, ên kovarêñ din têñ berhev kirin.

Di vê navê de Enstîtu, belgeyêñ arşîvên dîplomatîk, film, wêne û diapozîtîf, kaset û sêlikêñ kurdî jî dicivîne. Ta îro dora 1800 diapozîtîf, 20 film û qasî 75 saet mûsîqiya kurdî hatine civandin.

Bê gûman, ev hê destpêk e ; karê şeş mehan e. Divê ku em afirandinêñ li ser ziman, dîrok û çanda xwe bêwestiyan berhev kin, dîroka gelê xwe, dewlemendiyêñ çanda xwe diyar kin, binasin û bi dinyayê bidin nasîn. Civandina arşîvên me yên neteweyî, dewlemendkirina kitêbxana me ya neteweyî karê her welatparêzî kurd, her Kurdekî bixîret e.

Li kitêb, kovar, film, wêne, kaset û belgeyêñ li ser Kurdan bigerin ; we bi çi zimanî çi peyda kir ji kitêbxana Enstîtuyê re bişînin. Çavêñ xwe li dengbêj û çîrokbejan, xasme li yên pîr, bigerînin. Stran û çîrokêñ wan bigrin kasetan û ji me re verêkin. Bila, bi mirina wan, keriyek ji folklorâ gelê me winda me be, ji bîran neçe.

PARASTINA ÇANDA KURDİ, KARÊ ME HEMÛYAN E.

Çîrok

BARKÊŞÊN PIÇÜK

Ferzend bi lez perçak nan ji teşte derxist, derket û bazda. Deh deqîqe mabû, ku trêñbihata. Ger ku ew negihaşa ser trêñê, wê rojê tu tiş bi dest nediket. Gava ku gihaşt ber pirê dengê zûrîna trêñê hat. Ferzend zû zû daqûl bû, solêñ xwe ji pê kir, xiste destêñ xwe û hîn xurtir bazda. Gava ku ji pirê derbas bû, di xwêdanê de mabû. Lê nesekinî, tenê bi piyê qutikê xwe xwêdana ser çavê xwe paqîj kir û reva xwe domand.

Gava ku trêñ gihişte istasyonê hîn ew negihiştibû ber çayxana Beko. Çayxana Beko, bi sê-çar sed metreyî dûrî istasyona trêñê bû. Ferzend hîn bêtir gavêñ xwe rame-dan. Edî gihaşt ser şiva trêñê û xwe di ser şivê de avêt aliyê din. Gava xwe hol kir lin-gê wî ê rastê bi hesin ve aliqî û kete xwarê. Solêñ wî ji destêñ wî pekiyan. Hema zû rabû ser xwe, rahişt solêñ xwe û xwest dîsan baz-de. Lê mixabin, nikarîbû bazda. Gîzoka wî a rastê bi derbekê re werimî bû weke hêkekê. Lê xwe da ser lingê cepê û bi lez kuliya. Gava ku gihaşt ber trêñê, rîwî hemû peya bû-bûn û her du-sê zarok li ber çente û kîsên hinekan sekinî bûn.

Ferzend nihêrî, ku peyak du çentenê mezin li ber e û cigara xwe dikşîne. Hema zû zû ber bi wî çû û jê pîrsî :

- Apo, barkêş ji te re lazim e ?

Mêrik bi milê wî girt, dehf da û got:

- Yaho em ji derdêñ we mirin ! Kîjan tê û dibêje, «Apo barkêş ji te re lazim e ? » Ma ka kî ji we kane rahêje van çentan lawo ? Her yek zêdeyî cil kilowan e !

Ferzend dîsan lê vegeriya :

- Apo, heta bi pêncî kilowan jî ez kâ-nim* hilgirim. Ma mala te li ku ye ?

Mêrik du gav ber bi wî de avêt û got :

- Kuro here bi riya xwe de ! Tu barkêş markêş ji min re ne lazım e lawo, ez li bendî taxsiyê me !

Ferzend serê xwe xist ber xwe, neynû-ka xwe xist devê xwe û bi riya xwe de çû. İbram ji paş de ban wî kir :

- Ferzend li paş xwe nihêrî. Gava dît ku İbram e, kîfa wî hat û li bendî wî sekînî.

İbram gihişt nik wî, destê xwe ê rastê avêt ser milê wî û bi destê çepê pelê pêncî li-re di ruyê xwe da û got :

- Min iro ev kar kir. Ma ne baş e, Ferzend ?

Ferzend lêva xwe daliqand, serê xwe ber bi jér ve hejand û got :

- Liii ... Baş e.

- Ka te çiqas kar kiriye ?

- Min iro tu tiş kar nekir. Ez bi diya xwe re çûbûm ser doktor.

İbram milê wî kişand û got :

- Wer em herin bal deriyê binxetê. Îro dê pir kes ji binxetê bêñ, emê riya xwe bîbi-nin.

- Na lawo, şofêrê taxsiyan nahêlin, ku em li wir barkêsiyê bikin.

- No no, em iro kanin herin wir. Ez şofêrekî nas dikim, dê bihêle em li wir barkêsiyê bikin.

Her du ber bi deriyê binxetê ve meşîyan. Ji xwe her roj her du bi hev re bûn. Gava ku yekî ji wan tu karnekira, ê din tişte ku kar dikir hinek jê dida hevalê xwe. Bi deyn didan hev du, lê dîsan jî baş bû. Her du jî pê kîfxwêş dibûn.

İro kîfa İbram li cih bû. Şansê wî ji ê her roj bêtir bû. Heta bi nîvro pêncî lîre kar kiri bû. Rojêñ din tu caran evqas pere bi dest

* Piraniya kurdan dibéjin ez karim

wî nediket. Pir pir, sî an cil lîre bi dest diket. Ew jî heta bi êvarî kar dikir.

Îbram û Ferzend di emrê hev de bûn. Emrê wan donzdeh an sézdeh bû. Lé Ferzend ji Îbram meztir xuya dikir. Bi qamê jî jé dirêjtir bû. Lé Îbram ji wî xurtir û bihêztir bû. Barênu ku wî hildigirt Ferzend nikanî bû hilgirta. Ne tenê Ferzend, zarokên din kesî nikanî bûn ... Ji ber vê yekê hatibû nas kirin. Ew bi xwe jî pir jîr bû. Kanîbû xwe zû têxîsta çavêni mirovan. Ji xwe nava wî û leşkerên ber deriyê Sûrî pir xweş bû. Ji ber ku li İstanbûl mabû jî, türkiya wî pir xweş û baş bû. Gava ku bi tirkî dipeyivî, mirov digot, qey İstanbullî ye. Lé iro ji her roj jîrtir xuya dikir. Herdem wisa bû. Gava ku şansê wî râdibû bêtir jîr dibû. Girêdana wî a iro ji a her roj xweştir bû. Şalwarê xwe ê qutik, ê ku apê wî jê re ji İstanbullî şandibû, li xwe kiribû û şewqa xwe a leşkeran jî dabû serê xwe. Mirov ji girêdana wî jî zanibû, ku zîrek e.

Gava ku di ber devê firnê de derbas bûn, Ferzend jê pirsî :

- Îbram saet ci ye ?

Îbram henek pê kir :

- Saet hesin e.

- Na lo, de rast bêje, saet çiqas e ?

Îbram tegihişt, ku këfa Ferzend ne lê ye. Nêwest ku zêde henekan bike, li saetê nihêri û got :

- Saet yek û nîv e.

Ferzend wa bê këf serê xwe ber bi xwe ve hejand.

Îbram xwe avêt pêşıya wî û jê pirsî :

- Ferzend, tu ne birçî yî ?

Ferzend bersiv neda. Di mana nabûnê de serê xwe hejand.

Îbram bi destê wî girt, ber bi firnê ve kişand û got :

- Bi şeref tu niha birçî yî. Hadê em herin ji xwe re nanekî germ bikirin.

Her du ketin hundir firnê. Ji xwe re nanekî germ kirîn û derketin. Dû re Îbram ji Ferzend pirsî :

- Dilê te diçe ci ? Em ji xwe re ci biki-in ?

Ferzend milê xwe hejand û got :

- Nizanim. Ma dilê te dihare ci ?

- Dilê min diçe xiyar û firingyan. Em kanin ji xwe re hinek penîr jî bikirin.

Ferzend bi këf serê xwe hejand û got :

- Baş e.

Herdu bi hev re çûn sûka meywe (fê-kî). Ji xwe re hin xiyar, firingî û penîr kirin û çûn nav bexçekî bin siya darekê rûniştin û bi këf û lienek xwarina xwe xwarin.

Di ser xwarinê de ji nişkê ve Îbram got :

- Ferzend, tu zanî me ci ji bîr kiriye ?

Ferzend serê xwe vir û wê de hejand û got :

- No !

- Me gazoz ji bîr kiriye.

- Eeeeh ... Em ê ci bikin ji gazozan.

- Çi lo. Welleh vê dinya germê, gazozên cemidî dê mirov rihet bike. Tu bi a min bikî ez ê herim du gazozên cemidî bikirim û bêm.

Ferzend milê xwe hejand û got :

- Tu zanî, ku te bivê here.

Îbram parîkî mezin ji nêñ kir, rahişt xiyarekî biçûk, rabû ser xwe û got :

- Tu hêdî hêdî bixwe, ez ê niha bêm. Ü ber bi dikana helî nêzîk ve lezand.

Gava ku vegeviya, berî ku bigihêje bal Ferzend bi deh-panzdeh gavan çentekekî pî-rekan ê biçûk dît. Mezinbûna çente bi qasî destekî hebû. Çente bi morikan neqîsandî û hin nivîsên erebî lê hebû. Îbram ji nivîsa erebî fêhm nekir. Behecî, çente di nav destê xwe de guvaşt û got : « Ez di şansê xwe nim. Ez tim li çenten vala rast têm ». Kirî çente biavêta. Lé dîsa neavêt. Her du gazoz xiste destê rastê, çente xiste destê çepê û çû bin siya darê nik Ferzend.

Gava ku Ferzend çav li çente ket, destê xwe dirêj kirê û jê xwast :

- Îbram, ew ci çente ye ? Tu wî çente-kî nade min lo ? Welleh çentekekî wisa ji

diya min re pir lazim e.

Îbram çente neda Ferzend û rûnişt. Dû re devê gazozeke da ser pîjê darê, bi destê çepê pê girt û bi destê rastê heta ku jê hat li qapaxê xist. Qapax bi derbekê re firiya û hinek ji gazoze rîjiya erdê. Ew gazoz dirêjî Ferzend kir. Dû re gazoza din jî eyn bi wî babetî devê wê danî ser pîjê darê û bi hêz destê xwe lê xist. Lê devê gazoze venebû. Dû re devê gazoze xiste nav diranê xwe û bi diranan lê xebitî. Heta ku jê hat diranên xwe lê şidand. Bi vebûna qapaxê re du diranên wî rabûn û devê wî bi derbekê re tije xwin bû. Gava ku çav li xwinê ket, tirsuya. Wisa janê da dilê wî, ku bê hemdî wî hêsisir ji çavén wî hatin.

Ferzend ji wî bêtir tirsuya. Hema zû destmala xwe ji bêrika xwe derxist û xwîna devê wî paqij kir. Lê, xwîn nedisekinî. Her ku tif dikir kulmek xwîn ji devê wî dihat. Zû zû rabûn ser xwe û berên xwe dane nexweşxanê.

Dinya germ bû. Di wê dinya germê de dîsa sûk tije mirov bûn. Piraniya wan mirovan ji gundan hati bûn. Ev nêzîka sê saetên pîrekeke gundi bû, ku li nav bajêr, li lawikê ku dadabû çentê wê digeriya. Wê çentê xwe nas dikir. Mêrê wê jê re di girtî-gehê de bi morîkan çekiribû. Wê ew çente li ku bidîta dê nas bikira.

Îbram destê wî ê rastê li ber devê wî bû, çentekê ku li erdê dîtibû di destê din de bû û ber bi nexweşxanê ve dilezand. Carna jê Ferzend bi gavekê du gavan li dû wî dima. Dest û kincen herduwan di xwînê de mabûn. Yênu ku li wan rast dihatin, bi şasmayî li wan dinihêrin. Heta bi bîst-sî gavan jî dîsan li paş xwe dizîvirîn û li wan dinihêrin. Berî ku bigihêjin nexweşxanê, di nav qerebalixê de pîrekekê kir qîrîn, xwe avêt çentekê di destê Îbram de û got :

- A va ye ... a va ye çentê min. A va ye bêjiyê ku çentê min ji destê min revand !

Hema polîsekî xwe di nav qerebalixê de rakir, hişk bi milê Îbram girt û bi hêrs jê re got :

- Bide peşıya min em herin polîsxanê, bêjî !

Ferzend xwe avêt destê polîs û got :

- Léwik berde. Wî tu çente ji destê kesî nerevandiye. Ez şehad im. Wî çente wisa vala li erdê dîtiye.

Polîs li wî zîvirî û hişk bi milê wî jî girt :

- Hun şirîk in, ha ! Tu jî bide pêşıya min, bêjiyê heram !

Polîs hişk bi milê herduwan girt û ber bi polîsxanê meşîyan. Li polîsxanê komsêr ew pîrek û Îbram anîne rû hevdu û ji pîrekê pîrsî :

- Tu bi cih zanî, ku yê çentê te ji destê te revandiye ev e ?

Pîrekê ziq li Îbram nihêri. Gava ku çav li xwîna ser çavén wî û kincê wî ket, şas ma. Lê dé ci bigota ? Çente çentê wê bû û çentê xwe baş nas dikir. Lê baş nedihat bîra wê, lawikê ku çentê wê revandibû çawa bû û kincen wî ci şikil bû.

Jinikê wisan qederekî li Îbram nihêri û bêdeng ma. Îbram stûyê xwe xwar kiri bû û carê xwîna ku ji dev dihat bi pişta destê xwe paqij dikir.

Komsêr îcar bi ser jinikê de qîriya :

- Yê ku çentê te ji destê te revandiye ev e ?

Jinikê bi cih nizanî bû. Lê gava ku komsêr bi ser de qîriya, got :

- Erê, ev e !

Îcar komsêr rabû ser xwe, destê xwe dane paş qûna xwe û du caran di hundir de çû û hat. Paşê ber bi zarokan çû, bi guhêñ wan girt, serê wan li hev xist û got :

- Hun in, ha ! ... Ji bo ci hun diziyê dîkin ? Ji bo ci hun diziyê dîkin ker lawê keran ?

Îbram pişti ku xwîna devê xwe paqij kir got :

- Em ne diz in. Me tu caran jî dizî

nekiriye. Ev çentê han me wisa vala li erdê dît. Me berde, ez herim nexweşxanê !

Komsêr dîsan serê wan li hev xist. Dû re bang du polisan kir û herdu zarok avétin nezaretxanê.

Gepa Îfram werimî bû, bûbû wek nepoxekê. Wer ku janê dida dilê wî nikanî bû di cihê xwe de rawestiya. Digiriya. Lê giriyê wî tim di qirikê de dima. Giriyê wî ne ji tırsan an ji ber jana diranên wî bû. Giriyê wî ji behcan bû.

Ferzend jî digiriya. Wisan aciz dibû, ku wextî biteqiya. Her du jî di jîna xwe de neketi bûn tu nezaretxanan an tu girtîgehan. Mîrata nezaretxanê çiqas bi wan zor dihat. Dibû ku jî zorbûna nezaretxanê ji bê sûcbûna wan bû.

Piştî ku Ferzend du caran di hundir de çû û hat, paşê keserek kûr berda û ji Îfram pirsî :

- Îfram, ka tu devê xwe veke ez lê binhêrim.

Îfram bi zorê lêvê xwe ji ser hev hilanî û devê xwe vekir.

Diranên wî ji kok de rabû bûn. Goşte şûna herdu diranan wek du kurmukan bi asmanê devê wî ve daliqyabûn. Xwina ku jê dihat, sore-reş û tîr bû.

Ferzend qavêن xwe girt û serê xwe hejand. Dû re hêdîka di guhê wî de kir pistîni :

- Ez tiştekî bêjim tuê bi a min bikî, Îfram !

Îfram di miqamê «erê» de serê xwe ber bi xwe ve hejand.

- Ka çiqas pere bi te re heye ?

Îfram bi her du destan li bêrikên xwe geriya, perên ku pê re hebûn derxist û hejmart :

- Çil û yek û nîv.

Dû re Ferzend jî perên xwe derxist, piştî ku hejmart, ji Îfram pirsî :

- Tu zanî em ê çi bikin ? Tevlî perên min pêncî û şes lîre çêdibin. Emê bêjîn, ku me çente li erdê dît û perên ku tê de bûn,

hew ev bûn. Dibe ku ew jînîk jî qebûl bike. An na em nayêñ berdan. Ku em çend saetên din jî di vir de bimînin, dê eşâ diranên te hîn zêdetir bibe û dê dilê te ji ber bişe.

Îfram li ser tütikan rûnişt. Serê xwe xist nav çökên xwe û qederekî hiziri (fikiri). Dû re rabû ser xwe, du-sê caran di hundirê nezaretxanê de çû û hat, paşê li Ferzend zîvirî, serê xwe kil kir û got :

- No, çê nabe. Ku em bêjîn me çente ji destê wê revandiye em nayêñ berdan. Dibe ku me bavêjîn girtîgehan jî.

Ferzend dîsa wa bi nermî jê re got :

- Em bêjîn nebêjîn, em girtî ne . Jinik çentê xwe nas dike. Lî ku em bêjîn, me çente li erdê dît û perên ku tê de hebûn hew ev in. Wê çaxê dibe ku em bêne berdan. Hingî dibe ku jînîk jî bi úcdan be û bêje, min çentê xwe winda kiriye. Ma te nedît, gava ku komsêr jînîk anî rû te, bê çawa dihizirî û bi dilşewatî li te dînhîrî.

Îfram bi dengekî ne zelal got :

- Baş e, em wisa bikin.

Pir tê de neçû, polîsekî dirêj û bi nav-pî, darek di dest de, deriyê nezaretxanê vekir û kete hundir.

Her du zarok li quncikî nezaretxanê li ser çimento rûnişti bûn. Gava ku polîs kete hundir, her du ji cihê xwe rabûn û stûyê xwe xwar kirin. Polîs ber bi wan çû, bi guhêñ wan girt û serêñ wan li hev xist. Dû re bi dengekî gur got :

- Desten xwe vekin !

Zarok di cihê xwe de sar man, ji tırsan çökên wan lerizîn.

Polîs her yekî darek li çökên wan xist û bi ser wan de qîriya :

- Min ji we re got, «desten xwe vekin».

Ji ber ku Ferzend li aliyê polîs bû, pêşî wî desten xwe vekir. Polîs hetâ ku jê hat darexwe bilind kir û xwest li desten Ferzend xe. Lî Ferzend desten xwe revand, darê polîs li erdê ket. İcar polîs hêrs bû. Sê-çar dar li ser hev li pişta Ferzend xist.

Ferzend kete xwarê û çend dilop hêşir ji çaven wî hat. Polis daqûl bû, bî milê wî girt, rakir ser lingan û dîsan jê re got :

- Destên xwe veke ... Ger ku tu îcar destên xwe birevînî, ezé te bikujim.

Ferzend her du destên xwe dane ser hev û ber bi polis ve dirêj kir.

Polis dîsan heta ku jê hat darê xwe bilind kir û li destên Ferzend xist. Pênc-şes dar wisan li ser hevdu li destên wî xist. Destên wî bi yek derbê re reş û şîn bû û werimî.

Polis dû re vegeriya ser Îbram û got :

- Tu jî destên xwe veke !

Îbram giriya. Ji tırsan, êşa diranê xwe ji bîr kiri bû. Gepa wî wisa werimî bû, ku mirov digot, qey parîk nanê mezin di dev de ye. Îbram destên xwe venekir û paş de ve kişya. Polis bi héz bi milê wî girt û ber bi xwe kişand :

- Ez ji te re dibêjim, destên xwe veke, bêjî !

- Çima ezê destên xwe vekim ? Tu gu-nê me tune ye. Min çente vala li erdê dît.

Polis dîsan bi ser de qîriya :

- Ez ji te re dibêjim, destên xwe veke !

Îbram zanî bû, ku destê xwe veneke dê çend dar zêde lêkevê. Wa bi tırs her du destên xwe dane ser hev û ber bi polis ve dirêj kir. Polis bi héz du dar lê xist. Darê sisîyan Îbram destên xwe kişand û kire qîrin. Dengê wî di polîsxanê de olan da. Bi qîrîna wî ve, jînika xwediya çente ber bi nezaretxanê ve reviya. Lê ji tırsan disa paş de vegeriya.

Dû re polis bi milê herduwan girt û bire oda komsêr.

Komsêr bang jînîkê jî kir. Jînîkê her du destên xwe dane ser hev û kete hundirê oda komsêr. Îbram wisa li bin çavan li jînîkê dinihêrî, ku xwîna wê têketa dest wî dê vexwara.

Komsêr bi dengekî gur ji jînîkê pîrsî :

- Ev zarok dibêjin, ku hew pêncî û şeş lîre di çente de hebû û dibêjin, ku me çente li erdê dîtiye. Tu çi dibêjî ? Tiştên ku ew dibêjin rast in ?

Jînik hebkî hizirî. Ew lawikê ku çente wê ji destê wê revandibû anî ber çavêن xwe. Di dilê xwe de got, «Lawik jî di emrê van zarokna de bû. Lê ez çi gunê wan têxim stû-yê xwe, min ruyê lêwik ne dît. Ez nizanim, ku bê lawik di çi şîklî de bû û kîncêñ wî çawa bûn.

Dû re ziq li Îbram û Ferzend nîhêrî. Her du zarokan destên xwe dabûne ser hevdu û stûyê xwe xwar kiri bûn. Destên her duwan jî reş û şîn bûbû û werimî bû. Xwîna ku ji devê Îbram hatibû, li ser ruyê wî hişk bûbû. Gava ku jînîkê herdu zarok di wê rewşê de dît, weke agir têkeve dilê wê. Wisan dilê wê bi zarokan şewitî. Dû re berê xwe bi komsêr vekir û got :

- Baş nayê bîra min. Nizanim ku min çente ji xwe de xistiye, an hinekan ji min di-zîye. Lê ez wa zanim, ku min ji xwe de xistiye. Ji ber ku bêrîka min bi qul e. Heye tune ye ji bêrîka min de ketiye.

Gava ku Îbram û Ferzend hatin berdan, bi destên hev girtin û rast berê xwe dane nexwesxanê.

Firat CEWERÎ

1982

Hesenê Xelîl li ber siya danê êvarê qilûzka rûniştî bû, pişta xwe da bû dîwêr. Şewqa wî li serî, lê li aliyê çepê xwar kirî bû, bi destê xwe î rastê serê xwe dixurand. Ne ku serê wî dixuriya an gîrrê wî rabû bû, kurmê wî ev bû ; gava li tiştekî bifikiriya bi tiliya xwe ya gustirkê ya rastê şewqa xwe li aliyê çepê yek alî dikir û bi wê tiliyê serê xwe dixurand.

Aytanê ji dermalê derket, bi lotik û çindika ber bi deriyê hewşê ve da tirada. Ji nişka ve gazî kir :

- Bavo ! Ho bavo ! A ...po, a ...po, a ...po, apê min !

Dengê Eliyê Xelîl ji dûrî ve hat :

- Tu sebra apo yî, tu qama apo yî, tu çîra apo yî, tu berxika apo yî ...

Eliyê Xelîl bi destê Aytanê girti bû û dihat. Selav li birayê xwe kir. Hesen bi selav vegirtinê re xwe lipijand, xwedê negiravî ku rabe ser xwe, lê hat bîra wî ku kekê wî ye, tevgera xwe xerab nekir. Lê got :

- Aytê ! Madem ji apê xwe wisa pir hez dikî, de here jê re kursîkî bîne.

Dû re li Elî zivirî, gotê :

- Erd hénik e, tu li erdê rûnanêy ?

Elî li erdê çolemêrgî rûnişt , pala xwe da dîwêr.

Qasekî vir de, wir de ji alûbalê dinya gewrik axifîn. Di vê navê de Perîşanê hat pirsa tiyê xwe kir, qasekî li ba wan rûnişt û dû re rabû çû.

Elî gote birayê xwe :

- De wele êvar e, destê min ji te nabe, bi destûra te be ezê rabim.

- Tu zanî.

- Heta ez bigihîjim malê, melê êvarê wê bixweyîne.

- Lê ! lê ! ancax.

Elî bi qılqılandin belegoşka xwe xurand û li Hesen zivirî :

- Bira ! Wele em ji ber destê mişkan di helakê de çûn. Me dafikê danî ber wan nebû. Min dermanê wan kirî anî nebû. İca min bihîst ku têjika pisîka wa heye û ji we zêde ye. We têjika pisîka xwe bida me, hunê çiqas pê xwedanxêr bibûna.

- Têjika pisîka ci ?

- Têjika pisîka we... Têjika pisîka we...lo !

- Niha tu ji bo têjika pisîka ew qas rê hatî ?

- Wele Xwedê gotiye qûlo rast : min got hem ezê werim pirsa we bikim ; hem bi we, wê bîhna min derê û di vê navê de ezê ji we têjika pisîkê bixwazim. Ku we da mala we ava, ku we neda dîsa jî mala we ava.

- De xwezila keko te ez kuştî bûma ji vî halî çêtir bû. De mala min di oxira te de ye ; dixwazî niha agir berdê. Dixwazî Osmên tayê bitenê serjêke, ku ez bêjim çîma te wisa kir ; ne eferim ji min re. Canê min, rihê min, zarûkên min gişt di oxira te de ne . Lê belê ez hêvî dikim tu daxwaziya pisîkê û têjika pisîkê li me neki.

- Malneşewityo serî binî têjika pisîkê ye ho !

- Ne tu nizanî ku ev pisîk û têjika wê di dilê me de çiwas şîrîn in ? Ma te got qey bera pisîk in ? Na wele... Sebra me ne.

Eliyê Xelîl bala xwe dayê çi bêje, tewş e. Tîrsiya ku paşî wê bibe cirnexwêşî, awirekî bi keser da Hesenê birayê xwe î ji dê û bavê û gotê :

- Hey ... hey felekê ! Xatirê merivatiyê bi qasî rûmeta têjika pisîkekê jî nemaye. Haho ! haho ! Merivatî tu bi kuderê ve çûy ?

Cemaeta îşayê belav bû bû. Mele Cemîl û Hesenê Xelîl li paşıya giştan ma bûn. Mele Cemîl melê mizgeftê bû, Hesenê Xelîl jî ehlî sunet û cemaet bû. Hesenê Xelîl ji Mele Cemîl pîrsî :

- Seyda wî karê xwe çawa kir, bi hev xist bi hev nexist ?

Mele Cemîl bi keser bersiv dayê :

- Na wele Heseno. Ka kî bîst hezar dide meriv.

- Te ji Şêx Sedredin nexwest ?

- Min ji Şêx Sedredin jî xwest, min ji Hecî Tahir jî xwest, bereday bû.

- Mele Cemîl ! ji min tirê malbata we gişt di ber benê mala wan de bûn. Hûn dostê hev i kevn bûn jî, divê hewcedariya te biqedanda.

Mele Cemîl serê xwe pêl kir, kulên wî ji nû ve axibî bûn. Tu bersiveke nedayê.

Hesenê Xelîl dîsa, lê, pîrseke dinê pîrsî :

- Ji min tirê kirîvatîke di nav bera we û mala Hecî Tahir de hebû. Divê wî biqedanda.

- ...

- Lê niha wê çawa be ? Ji bo bîst hezarî ew masûm wê di hebsê de bimîne ?

Mele Celîl axîn rahişt û bi keser got :

- Ka merivatî maye ? Ka însaniyetî ? Ka îslamiyetî ? Ka wijdan û rehim û şefaqet ?

Ka merivatî ka Heseno ?

Hesenê Xelîl di nav destê xwe de tesbîha xwe i selewatan miz da û givaşt, di ber xwe de got :

- Belê wele ne merivatî maye, ne rehim û şefaqet. Kes êdi karê kesî naqedîne. Lê, me digot belkî li ba we alîm û şêx û hecacan mabe.

Mele Cemîl rabû ser xwe ; lembeyên mizgeftê vemart, ji bîr ve kiri bû ku cubê xwe derxe. Li ber derî lê warqılı, lê di xwe re nedît ku bizivire. Deriyê mizgeftê bi kilîtê rada, kilîtê kir berîka xwe. Çend pê avêtin, di tariyê de reşâhiya merivekî di wan de derket ; selav li wan kir. Mele selavê vegirt. Mîrik got :

- Seyda Mele Cemîl ez hatî bûm pey te : Sofî Sebrî miriye, xêra xwe tubihatay te wî bişûsta.

Mele Cemîl herwekî timî got :

- Înalîlah we îne îleyhî raciûn. Kijan Sofî Sebrî ye ?

Mîrik :

- Nêzecîranê me ye. Kesî wî tu ne. Derûcîran xêra xwe lê dînihêrtin.

- Ya ? Wax mala minê ! Xwedê kesê kesan e. Xwedê bi rehim û kerema xwe şâ ke. Bira hun sax bin. Dûrî we be iro çend roj e, ez hema wisa békêf im ; nikarim xwe li piya bigirim. Heke ne nexweş bûma, ezê bihatima lê çawa. Ma însaniyetî û îslamiyetî nemaye. De Xwedê xêra we mezin ke, divê ez herim malê bikevim nav nivîna.

Bi gotina xwe re jî, Mele Cemîl hêdî hêdî dinaliya. Mîrik bi lavayî gotê :

- Seyda destê te radîmîsim, ji êvara xwedê de tu derekî nema ku em neçûnê, me tu melekî neqefalt. Yêñ ku karê wan hebûn, yêñ ku nexweş bûn ... Vêca min tu qefaltıye, bira xêra te be, divê tu werî.

Mele Celîl zorê da nalînê, û bi nalenal :

- Birayê bavê min, ne hewce ye tu xêra min bi bîra min bînî. Ez mele me, ne cahil

im. Ma ez nizanim xêr ci ye, ci nîne. Ez ji te re dibêjim nexweş im. Tu wisa dikî ku êdî ji xêrê dertê. Xêra min jî diçe, ya te jî ... Ji êvara xwedê de ew qas te xêr kir û niha te gişt bi avê re berda. Tu ne gune yî, çima li xwe wisa diki ?

Mêrik di riya xwe zivirî. Mele Cemîl û Hesenê Xelîl ber bi malê ve kudandin.

Mele Cemîl deriyê hewşê bi kîlîta xwe vekir, ket hewşê. Bi çîngîna çengelê derî ve perda paca oda rûniştinê yek alî vebû, jina wî di pişt camê de mîrê xwe fesiland ; rabû hat eywanê pêsiyê, bi xeyd gotê :

- Éra tu li kuderê mayî ? Ji êvara xwedê de Hecî Qasim Axa di ber sekeratê de ye, bi ser de dixweyînin ; tu jî çuyî mîzgeftê. Tu bi qup keti bûyî ?

- Te çima zûtir haya min pê nexist ?

- De haydê zû ! Siûda te hebe tê zû bigihîjiyê.

Mele Cemîl zû zû cubeya xwe derxist avêt ser loda êzinga, bi şipil, bi şiplahiya xortekî çardeh salî li riya mala Hecî Qasim Axa havîlkar bû.

Hecî Qasim Axa dewlemendekî ji dewlemendîrînên vê qesebê bû. Xwediye heft gundan bû.

«Ewê îsqata axê çiqas be ? Nizanim ewê wî teslîmî êvara Îniyê kin nexwe nekin. Ku teslîm kirina, wê perekî hêjâ jê bîhata. Lê ez zanim ku niha cemaeta Mele Nûrî wekî sîsyarekan li dorê hêwîrine, bergehê ji kesî re nahêlin. Bi rastî meletiyê û navê meletiyê herimandine. Meriv ew qas jî yekcar çavbirçî nabe lo ! Ê ku ew dikin êdî ne meletî ye, mirtibî ye ... hetekî ye. Avûrû ji misilmanan re nehiştine. Rizqê feqîr û fiqaran birîne. Yekî wekî min ka wê bi meaşê rût çawa idara xwe bike. Zor e, zehmet e. Ne însaniyetî maye ne îslamiyetî ... Ne merivatî maye ... ne dostanî û xatir ...» Wisa difikirî û di serê xwe de diaxîfi Mele Cemîl. Hat serê kolana mezin ya nav çarşiyê, çavên wî bi Doktor Selîm û Avûkat Cembeli ketin. Sê çar gav li pêsiya wî ve dimeşîyan. Bo ku nekeve pêsiya wan, bê edebî neke, gavê xwe sist kir. Ji xwe re got : «herhal diçin qulûbê» .

Doktor Selîm hûrîk hûrîk digote Avûkat Cembeli : «Rast e, jînik bi derba qebza debancê miriye. Yüzbaşı Kemal bi xwe, bi qebza debança xwe ji paş ve li serê wê xistiye û jînik pê, di hundir de bi windakirina xweynê miriye. Xwedê zane gelek jî ez berketimê. Ev hovîti ye, ev xwînxwarî ye. Ev ne însaniyetî ye. Lê ci heye ku jînik êdî miriye û paş ve nayê. Erê emê bêjîn bira Kemal here cezayê xwe bikişîne, lê ci gunehê jina wî û herdû zarokên wî hene ? » Avûkat Cembeli gotina wî bi pirsekî birî : «Doktor, dibêjin ku Kemal li te gef xwariye, rast e ? » Doktor silikî, bi dengekî ne zelal bersiv da : «Nizanim kî van tiştan ji berê xwe ve çêdike. Ne rast e ; yê ku min kir ne ji tirsê, ne jî ji gefê bû. Însaniyetî ... Ma merivatî, însaniyetî nemaye. Raporekî ye tê du xetan xêz bikî malekî difilitê diçe. Tu nizanî ku gava şekl û sûretên zarûkên wî serseriyê Kemal dihatin ber çavên min, ez çawa dibûm. A însaniyetî ev e, Cembeli însaniyetî ev e». Avûkat Cembeli di ber xwe de lê zivart : «Rast e, te wezîfa xwe ya însanî kiriye. Dibêjin ku pênc - şes zarûk ji wê jînika kuştî sêwî mane. Lê tê ci bikî, qeder û küküksaniya xelkê me ev e. Bi daxwaziya du - sê devrimciyê mîna min û te naguhire. Ji xwe ne meriv in û naxwazin bibin meriv jî. Wê salê di hilbijarê de çiqas ray dan min ...»

Mele Cemîl li xwe geriya, destê xwe avêt berîka şalwarê xwe ya aliyê rastê, tesbiha xwe derxist. Pêsiyê xwest ku wîrdan bikişîne ; çend cara sihîtiya xwe kir jî «subhanallah», «welhemdûlîlah», «welahû ekber», lê gotinê doktor ji hişê wî neçûn. Ne ji hemdê xwe digot : «însaniyetî ...», «merivatî ...», lê, belê lê venebû. Zimanê wî ji berê xwe ve digot : «însaniyetî ?», «îslamiyetî ? », «merivatî ? »

Ji paş ve dengek hate ber guhê wî ve. Bala xwe dayê, belê dengê yekî bû gazî dikirê. Zivirî dît ku Mistê Smaîl e. Ber bi hevûdu ve çûn, bi destê hevûdu re girtin, pirsa hevûdu kirin. Mele Cemil gotê :

- Tu zanî, dibêjin Hecî Qasim Axa di merşeta Xwedê de ye, ez wê de diçim. Te dî hem wezîfa însanî ye, hem wezîfa îslamî ye, hem jî dostanîke me hebû.

Mistê :

- Ê baş e, ji xwe ez jî bi wî aliyê ve diçüm.
- Mistê ! Ka te daweta kurê xwe nekir ?
- Na wele. Lê bi xêr çendekî şûn de emê bikin.
- Çima ew qas bi derengî ma ?

- Mele, perê me hevûdu dernexist. Mala te û camêr ava, iro Şêx Sedredîn heşte hezarî da me, emê deynê xwe î qelen biqedînin û bûka xwe bînin.

Mele Cemîl wekî li hev deliya be :

- Dengê te nehat min, te got kî karê min qedand ?
 - Şêx Sedredîn. Şêx Sedredînê Şêx Muhyedîn.
 - Bi ci qewli ?
 - Li ser genim. Di gerewa çar sed olçek genim de, olçek bi du sedî.
 - Ci ? Îsal ku çû olçek pênc sed û pêncî, bi şes sedî bû.
 - Ê ew perê hazir û genimê hazir e. Ev perê hazir û liserhev û genimê ne hazir e. Dîsa camêr bo xatirê merivatî û însaniyetiyê da. Mesrefa kişandinê jî li min. Mala te û camêr ava be, lo ! Wî me ji tengasiyê filitand bes e. Merivatî û însaniyetî ev e, ew qas dibe. Ne wisa Mele Cemîl ?
- Mele Cemîl li halê xwe fikirî, hê duh bû ku çû bû xwe aveti bû Şêx Sedredîn. Şêx bi úcaxa xwe sondê xwari bû ku ; ne bîst hezar, lê niha gumana wî di hezarê bi tenê de jî naçe. Ji xwe heta sê roja divê panzdeh hezarî ray ke da ku bonoyê xwe bide. Hey... hey-la gidiyê teresê dinyayê !

Mele Cemîl û Mistê Smaîl li ber serê kuça Kaniya Biyê jî hevûdu veqetian. Di xatir xwestinê de, devê Mele Cemîl lê nedigeriya . Mistê Smaîl wekî hemberekî jê re dixuya. Bilqîneke ji kevçika dilê wî hilkişiya hat heta gewriyê, di gewriyê de herbilî ; ji zerpan kuxiya, ji ber kuxînê dilopeke hêstirk gér bû, lê, li xêzika bin çav artîlî, ma. Bi gurçika destê xwe î rastê çavê xwe paqîj kir. Ji kezeba kûr «eşheda» xwe anî, pê re qefesa sîngê wî hilra bû, pişen wî mîna nixaferê li hewa hêmî ya berdestî vê biharê mijîya. Dîsa dest bi wîrîd kişandinê kir. Lê xem û xeyalên wî nedîhiştin ku bêje subhanelah, welhemdûlîlah, Elahûekber. Mêjîyê wî, fikra wî her pê «însaniyetî-îslamiyetî-merivatî» yê didan niqîrandin. Çîrûskekê ji nav serê wî hilfîriya, mîna babelîskê pêsiyê pehn, dû re li hevûdu lefiya û bilind bû, paşiyê mîna dara gûzeke kevnare bi sîwanî şax û gulî, û pelên xwe li esmana pehn kir. Dar li pêsiyâ wî bû û ew her ber bi wê ve diçû, di her pêgavê de nêzîktir dibû. Ji tenga darê, ji nedîtî ve dengek dihatê : «Menafiû... menafiû... menafiû...» Seydayê Mele Cemîl fikirî ; ev ci mûcîze bû ? Xwedê heqîqetê pê dida nîşan dan. Belê, însaniyetî, îslamiyetî û merivatî bi ava «menafiû» hêşîn bû geş bû. Belê, menfeet... menfeet... menfeet... Dar ci bigre êdî bi qası çar pênc metreyan li ber wî bû. Êdî digihîst heqîqetê. Dengekî dawidî ji xeybê ve hat : «La hewlawela quwete î...» Tafile qîrîneke bi îmanî ji nav serê Mele Cemîl çû, got : Sedeq amentû bîlah ! Sedeq amentû bîlah ! Se ... Dengê wî hat birîn. Sebriyê Kerro :

- O ! Mele Cemîl, ev tu yî ?

- Sebrî ! Tu û van deran ?
- Mal ava ! Mala min vayê li vê jêrê ye. Tu bi ku ve diçf ?
- Wele gotin Hecî Qasim Axa di ber sekeratê de ye, min got de îslamî ye ez herim, em xwe bi hevûdu bidin halal kirin.

- Hewar xêr e, elhemdûlîlah. Bi mexrebê re wî birin Diyarbekirê. Ku doktor ji heq derneyên, belkî sibê bi teyarê bibin Ankarayê. Lê belê Eliyê Xelîl di ber mirinê de ye.

- Eliyê Xelîl kîjan ?

- Eliyê Xelîl lo. Birayê Hesenê Xelîl yê cîranê te.

- Ya ? Mala minê guno ! guno ! Çi hewalê wî ye ?

Sebriyê Kerro axîneke rahişt. Wê dest bi axaftinê bikira ku lawikekî deh diwanz-deh salî nêzîkî wan bû :

- Xalo ! Xwedê ji we razî be, we li van deran kurikî çar pênc salî nedîtiye ?

Sebriyê Kerro :

- Na bavê xalo.

Lawik ji wan vejetiya û di nîvetariyê de gazî kir, dengê wî digizgizî :

- Menâfo ! Menâfo ! Menâfo !

Sebriyê Kerro dewam kir :

- Ha ! Minê viya bigota, Mele Cemîl : Xwedê bi rehma xwe bi me re bike. Çiqas dilê min bi Elî şewitî. Ji pesna xeber dida, misêwa digot : «Birao ! Birao ! Birao, o birao ! Mişkan em xwarin. Te pisîkê anî ? De were birao, tevî pisîka xwe ve were. Na ! na ! Hun jî gunê ne... Sebra we ye...» Tu dibêjî xenîmê xwe didît newsa ?

Mele Cemîl fikirî, serê xwe hejand, got :

- Alîmê xeybê ilelah.

Xatir ji hevûdu xwestin. Sebriyê Kerro tafilê di tariyê de nependî bû. Mele Cemîl li pêşîya xwe nihêrt, elektrîkên taxa jêrîn vêketî bûn. Li pey xwe zivirî nihêrt, kuçeya ku tê de hati bû, tarî şevereş bû. Li oxira xwe meşîya. Di vê kuça ku serejêrî taxa jêrîn dibû, teng û herdû milên wê bi darêن hewran neqşandî bû, li ronahiyê nihêrtin ; giraniya ji xewnan şiyarkirinê didayê. Di ber xwe de got : «er rizq û e'lelah» û ber bi mala Eliyê Xelîl ve kudand, di ronahiyê de mîna pîneke reşayıyê dûr bû, piçûk bû, ji çavan nependî bû.

F. TOTANÎ

ÇARALIYÊ ME AGIR E.

Di navberê de heşt roj derbas bûn. Melkemot hêdi hêdi xwe nêzê me dikir:. Ji vê gavê me çavên melkemot ên bitirs didft. Em keti bûn taya mirinê. Diya min serê me şüst, kincêñ paqî li me kir. Pişte du rojêñ din emê winda bibûna. Me bi çavan ji gundiyan xatir xwest. Dîtina me û wan ma bû roja qiyametê...

Şevezek, şevezek havînî pirr dereng, li deriyê me xistin. Ew şev deh rojêñ me qediya bû. Dadê kincêñ xwe li xwe kir û çû bi alê derî ve. Hinek sekinî, li me mîze kir. Tiliya xwe avête çengele û derî vekir. Em ji tîrsa dilerizîn. Me apê xwe Temo zû nas kir. Tivinga Apo di destê wî de diçilwîlî. Nifrîn û agir ji rûyê Apo dibariya. Çavêñ Apo tijî xezep û kîn bû. Çarmergî li erdê rûnişt. Tivinga xwe dani ser çokêñ xwe. Qutiya cixarê ji berika xwe derxist. Cixarekfî pêça. Cixara Apo wek lûla sobê ode tijî dûman kir. Apo nefes ser nefesê li cixarê dida. Destê wî yê bi cixare dilerizî. Tilikêñ Apo ser lêvîn wî ne disekinin. Deng jê dernediket. Apo çiroka dadê seh kiri bû.

Beriya sê mehan bavê min ji hepsa Diyarbekirê firar kiri bû. Bavo mahkûmê idamê bû. Cunta faşîst serê bavo dixwest. Ji bona wan, bavo merivekî pirr girîng bû. Çaralî lê di geriyan. Lê bavo xwe ji lepêñ wan xîlas kiri bû û derbasê Binêxetê bû bû. Zabitê Tirkan deh roj muhlet da bû diya min. Dadê gerek di nav van deh rojan de bavo teslîm bikira. Ne-xwe di ciyê bavo de ê dadê bigirtan. Girtina dadê dibû derbekê mezin ji me re. Ji bo vê yekê apê min dixwest ku em ji gund derkevin û biçin ba bavo.

Piştê cixarê Apo rabû serxwe û ji min re got :

- Emê îşev jîvir herin. Esker ha hatin, ha hatin. Em nikarin zar û zêçen xwe, namûsa xwe di bin lingêñ eskeran de bihêlin.

Dadê bi destekî sivik tiştêñ ku ji me re pêwîst bûn da hev. Di nav çend deqan de dadê sê boxçe girê da. Livîn, sandoq, firaq û tiştêñ gîran li cihê xwe man.

Em ji malê derketin. Şev tarî bû. Çav çavan nedidit. Giraniya şevê wek perdekî reş kişiya bû ser me. Haya tu kesî ji me tune bû. Stêrk di tarîtiyê de îndî ges bû bûn. Diçirisîn. Carna yek ji wan difiriya û ciyê xwe diguhart. Me ji wan re digot stêrkên bi dûv. Pîrika min digot, stêrk zarokêñ ezman in. Ew ji dimirin, dikenin, şâ dibin, û dizewicin.

Belê, em di bin perda tarî de dimeşîyan. Ne haya mirovan, ne ji haya stêrkan ji me hebû. Stêrk di kêf û sefa xwe de bûn. Destê eskerên Tirkan nedigihişte wan. Tîrsa wan ji tu kesî, ji tu quwetî tune bû. Min xweziya xwe bi wan tanî.

Em berjêrê newalê bûn. Newal devê xwe wek dêwekî vekiri bû. Carna em kaş dibûn, dîterpîlin, diketin. Giya, sitirî, kevir li ber çavêñ me dibûn wek lawuran, wek cinan. Ji me tirê ku me di jiyana xwe de vê newalê nedî bû. Lê rûyê tarîtiyê sar e, nexweş e. Di tarîtiyê de qeza û bela tim dikarin bén serê yekî. Mezinêñ me beredayî negoti bûn, pişta xwe nedin mirovîn tarî. Yanî mirovîn durû, bêbext û zâlim ...

Em li dû hev rêz bû bûn. Apo keti bû pêşî. Ji nişka ve hestek çîrisî. Em veciniqîn û me xwe avête erdê. Apo bi hesta xwe bersiva wan da û ji me re got :

- Metîrsin. Heval in. Ewê alîkariya me bikin û ê bi me re werin.

Çar kes bûn. Bi çek û rext bûn. Yek ji wan bêrîvanê da pişta xwe. Ên din bi destêñ brayê min girtin û em meşîyan.

Destê min û ê brayê min Azad di nav destê hevde bû. Em ji newalê derbas bû bûn û me da bû kontara çiyê. A rastî me nizani bû, em bi ku da diciñ. Apo ji me re tiştek negoti bû. Min bi dengekê nizm ji Azad re got :

- Bîra te tê Azad ? Te dît bavo carna digot, ezê hefteyek bikevîm binê erdê. Azad keniya û bersiva min da :

- Çawa nayê bîra min, Hêlin. Ji me ku bavo bi rastî diket binê erdê. Ez nizamî vî navî çîma bi kar tînin. Em jî işev ketine binê erdê, wek bavo. Ma ne wusa ye ?

- Belê, rast e, min got. Tiştên ku bi dizî têñ çekirin, dibin tiştên binê erdê. Ger ku binê erdê tune bû ya, kes nikari bû di ber ordiya Tirkan bida. Dê bila di vê tarîtiyê de we-rin. Wele newerin ji qula xwe derkevin.

Apo û hevalen din bi peyva min û Azad keniyan. Dengê me çûbû wan. Apê min destê xwe danî ser pişta min û got :

- Aferin ji we re. Ji vêga ve hun piirr tişt hîn bûne. Îşê ordiya Tirkan zor e. Bi mil-yonan zaroken me şiyar dibin û ê tola me bistînin.

Dawiya çiyan, newalan nedihat. Êş keti bû lingêñ me. Di me de taqet nema bû. Berê ku dinya gewr bibe em ber derê şikeftekî sekinîn. Berqa zerinî keti bû rûyê ezmên. Roj hêdî hêdî serê xwe bilindkir û çiyan dixist bin hikma xwe. Apê min û du kes çûn nava şikeftê. Devê şikeftê di giya, qamiş û qırşan de ma bû. Em li serê çiyaki piirr bilind bûn. Roj xwe nêzê me dikir. Serma sibê xwe di ber tirêjên wê de dida û germ dibû. Derketina rojê rûyê me geş kir. Dara sî da. Kevir beriqin. Tabiet ji xew şiyar bû. Dengê zarokên tabietê dahl û deviyan, newalan, qulan, şikeftan tijî kir ...

Piştê qontrolê em ketin zikê şikeftê. Apê min eletriķa destâ pê xist. Hevalan ji der ve hinek qırş anîn. Di torbêñ wan de her tişt hebû. Nan, penîr, şekir, çay. Apo çaydanê danî ser agir. Em li dora tifîkê kom bûn. Nava şikeftê honik bû. Zarokên me keti bûn xewê. Haya wan ji dinyayê tune bû. Belkî jî di xewna xwe de bavo didîtin. Dadê şûşen çayê danî ber me û penîr hûr kir. Çay dem digirt. Ji birçîna ûze ûza zikê me bû. Piştê hewqas rêveçûnê zikê me dest bi isyanê kiri bû. Dadê şûşan tijî kir . Me bi ziliyan çayêñ xwe lihev dan. Ji nişka ve apê min li pişta xwe zivirî û eletriķê da kûraniya şikeftê. Şewqa eletriķe zikê şikeftê quł kir ; taritî qelişî, paş de çû. Marekî gewr wek stûnekî devê xwe vekiri bû, û pifinî dikir. Li ber marê dupişkekî reş û xurt dûvê xwe da bû ser pişta xwe û dilebitî. Her dû rawir wek neyarêñ hezar salî êrişê hev dikir. Çekên xwe yên bi jahr û tehlüke nîşanê hev didan. Nefreta wan mezîn bû. Ne hebûna me, ne jî şewqa eletriķe bala wan dikişand. Qerarê xwe da bûn. Ê yek ji wan bimra. Herhal şikeftê têra dû rawuran nedikir. Mar radibû hicûmê, xwaroviçko dibû, di nav toz û telazê de dima. Dûpişk bi sivikbûna xwe nediket faqa marê. Xwe baş diparest. Em ji tirsa lal bû bûn. Ji me tirê ku hawîdora me tevde mar û dûpişk in. Apê min berê tivingê da bû wan, tilika wî li sei tetîkê bû.

Serê wan dirêj ajot. Dawî mar dûpişkê qefiland û wê xiste quncekî asê. Zimanê xwe yê çetel derxist, devê xwe vekir ku dûpişkê gez ke, dupişk ji nedîve xwe li dîwarê şikeftê xist û xwe avêt ser pişta marê. Serê marê sist bû. Mar riciffi, gevîzî, perpitî. Mar xwest bi rê keve. Lî ne bû... Dûpişk ser pişta wê xwe bêdeng kiri bû û lê mëze dikir. Neyarekî ji xwe mestir û zeximtir kuştı bû. Şikeftê edîjê re ma bû...

Apê min da xencera xwe û bi alî wan de çû. Diya min bi şalê Apo girt û kişand. Qîriniya wê zikê şikeftê tijî kir.

- Em ji vir herin, diya min got. Ez pirr ditirsim. Mar û dûpişkên vê şikeftê xelas na-bin. Ez naxwazim ez û zarokên xwe bibin xwarina mar û dûpişkan.

Apê min Temo keniya û got :

- Tû dîn buyî , keçê ? Ma ji bo me tu derên bêtehlike, bêtirs heye ? Tehlika me bi me re ye. Ji bîra xwe mebe, em mahkûmê hikûmatê ne. Em gurên serê çiya ne. Ji bo me mar û dûpişk ji eskeran çêtir in. Mar û dûpişk zaf zaf wê ji me çend kesan dikaribin bikujin. Lé esker ? Ger bi me bihesin yek ji me sax namîne...

Apo şûşa xwe teze kir. Serê xwe danî ser destê çepê û dom kir.

- Ma hewqas jî dibe. Agir bi mala min nekeve. Tiştên Xwedê pirr ecêb in. Tu li vî tiştî mêze ke. Dinya tev dijminê mar û dûpişka ne, ew jî dijminên hev in... Baş e. Firqa navbera wan û Kurdan ci ye gelo ? Ma em jî eynî tişt nakin ? Her çar dewletên qolonyalist û nijadperest dixwazin me ji cihanê rakin. Ev ne bes e, înca em jî hevdû dikujin, xelas dikin... Herhal em û maran, dûpişkan pismamê hev in... Kîn û xezeba me lihev çûne ...

Piştê peyva Apo em raketin. Lé ji tîrsa xew nediket çavên min. Çavekê min girtî, ê din vekirî bû. Dadê digot ku, gava rawur hev dikujin, xwediyyê wan têr û termêr xwe dibin. Çavê min tim li kûrahiya şikeftê bû...

Em bi dengê heliqopteran ra bûn. Ew mar û dûpişkên biperr bûn, Apo xwe li ber devê şikeftê dirêj kiri bû û bi dûrebinê li wan mêze dikir. Li gora rewşê ya me ê şer bikira, an jî emê, biketana zikê şikeftê û kûr biçûna...

Roj li ber xatir xwestinê bû. Gelî bi gelî, çiya bi çiya rê distand û melûl dibû. Quweta wê êdi nedigihîste çiyayênil û sertûj. Çiya hindik hindik, perçe perçe çavê rojê digirtin û xwe jî germa wê azad dikirin.

Roj çû ava. Bakî honik derket. Em hê di şikeftê de bûn. Apo li ber devê şikeftê sekinî bû û li ezmên mêze dikir. Şewqa hîvê devê şikeftê tijî zîv kiri bû. Min di jiyanâ xwe de heyâ iro tiştekê wisa delal, xweşik û rind nedîbû. Di zikê şikeftê de seyra hîvê bê emsal bû. Hebûna hîvê dilê min şâ kir. Xem û kulên min, kesera dilê min di nav hîvê de winda bû. Di bin hîva zivinî de çiyan serê xwe dabûn hevdû û diciirisin.

Me haziriya rêuîtiyê dikir. Em êdi ne bê dost û yar bûn. Hîv hati bû hewara me. Lé em bi rê neketin. Hîv çiya bi çiya baz dida û diciû. Çiya ji rengê hîvê derdiketin û reş dibûn. Apo carna li me mêze dikir û digot :

- Hîv haziriya xwe û xewê dike. Liber razanê ye.

Peyva Apo serê min tevlihev kir. Çima gelo ? Çî gunê hîvê heye ? Bo çi em ji şikeftê dernakevin û naçin ?

Min ji Apo pîrsî :

- Apo, em çima naçin ?

Apo li min zivirî û bersiv da :

- Hêlin, keça Apo. Ez dizanim tu çi difikîri. Lé ez ji te re çewa bêjim. Ma gelo ên ku ji hîvê hez nekin hene ? Hîva delal, rind, xweşik. Hîv ronahiya dîla, sembola evinê ye... Lé çi feyde Hêlin... Hikûmeta Tirkan vê hîva delal jî kiriye dijmin û berdaye me. Ew bûye casûse hikûmatê û me taqîp dike. Di bin ronahiya wê de em nikarin ji şikeftê deren. Ewê esker me bibînin. Dijmin ji me ronahiyê sitandiye û tarîti bûye dostê me...

Peyva Apo zû kete serê min. Apo rast digot. Hawîdora me tijî esker û qerekol bû. Esker tim li welatparêzên Kurdan digerîyan. Tarîti dijminên eskeran, dostê me bû.

Tarîtî me xelas dikir, wana dixwar...

Ez pirr caran fikirî me. Mirov dikare ji diya xwe, bay û brayêñ xwe bixeyide, nefret bike. Lê tucaran neketi bû bira min, ku ezê rojekê ji hîvê jî nefret bikim. Hîv şahidê zarokbûna min bû. Li gund çaxê em ser bana radiketin min tim lê mêze dikir. Ez aşiqê wê bûm. Min derdê dile xwe jê re digot û di xew de diçûm. Ez ci bikim, jiyan xerîb e, jiyan zalim e... Ezê hê pirr tişta derbas kim.

Mahmut Baksı

Helbest

*ÇEND SEDSAL E LI PEY HEV
BI XWÎNÊ SOR DIBÎ TEV*

Kurdistanê delalê
Sev û roj dil li balê
 Şérinê şox û şengê
 Şepalê pir qeşengê
Ziba yî, işwebaz i
Bala yî serfiraz i
 Bêhogir û mamend i
 Tu gul evîna kurd i.
Kurdistan i ciwan i
Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Bi awir tîr dirêji
Dil û gurçik dipêjî
 Kesê tu digrî davê
 Agir dixî hunavê
Arê dilê xortan i
Doza şoressgêran i
 Lê bê kes û heval i
 Di bim destan dinâli
 Kurdistan i ciwan i
 Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Kurdistan i biber i
Tijî gewher û zêr i
 Nift û hesin û av i
 Lê bo Kurdan tu dav i
Neyar ser te rûniştî
Bi jan û derd tu mist i
 Li ser te Kurd bê xwazî
 Dijîn birçî û tazî
 Kurdistan i ciwan i
 Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Navdar i pir bilind i
Heinû bajar û Gund i
 Tev mîrg û çem û kanî
 Rez û deşt û zozan i
Li ser te ceng û şer e
Dinê li ser te har e
 Bi dilxwazî dixwaze
 Her kes li ba te raze
 Kurdisatan i ciwan i
 Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev

Divê kesê bivê te
Ser deyne ber piyên te
 Kesê nerjîne xwîne
 Nikare te bibîne
Ta nerjîne xwîna sor
Nabîne demê gîlor
 Ta nebe şerê gelî
 Bi lêvan nabe bili
Kurdistan i ciwan i
Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Dibêن «devê newêran
nagije bin guhêran»
Dibêن «destê tirsokan
naçe ser sînga gewran»
Yê bêje tu ya min be
Divê jêhat û jîr be
 Bi kuştin û bi lêdan
 Te derîne ji destan
Kurdistan i ciwan i
Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Yê ji dil te bixwaze
Bivê li sîng te raze
 Divê dil û ser û can
 Bi carek deyne meydan
Yê gêj nebe ne nezan
Nafroşe te tu caran
 Dê birjîne xwîna can
 Te derîne ji destan
Kurdistan i ciwan i
Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibî tev
Zinar im ez dinâlim
Li ser te tim dikâlim
 Dixwazim te bibazî
 Çer tî avê dixwazî
Ta dernexim ji destan
Te şérînê Kurdistan
 Ranawestim, ranazim
 Dê bikoşim bibazim
Kurdistan i ciwan i
Cî û warê Kurdan i
 Çend sedsal e li pey hev
 Bi xwînê sor dibê tev

LI KELEBESTA

Me malokan ava dikir li kelebesta
Gava em diçûn beravê
EZ vedibîrim, te j'bîr kir gelo
Wê demê, wê weşê, wê gavê ?

Destê me di destê hevûdu
Bi bayê re em dibezin
Geh diçûn nêrgiziyê, nêrgiza
Geh ji dîna hev nêrgiz diçinîn

Wekî gûstêrkê xuya bû û çû
Zarotiya ji xem û kesera êrî
Zil dide di bîranîna min de
Nizanim gelo tu vedibîri ?

Rojen Barnas

TE DIFIKIRIM

Ho welato

İro careke din qewl dane
(Ev bûcara çaran),
Ku min ji hemwelatiyê bavêjin
Bila be

İro dîsa - nizanim bû cara çendan -
Ji te pênc hezar kilometir dûr
Te difikirim.
Dîsa li kèleka zeryayê rûniştîme,
Zeryayên dilê te difikirim.
Te,
Bajar, gund û çolêñ te
Çiya, av û stérkên te
Law, keç, pîr û xortên te difikirim.

Ez dizanim,

Di vê kelekela havîna germ de
Dijminêñ çavşor
Neyarêñ bextre ş
Dîsa wek teyrêñ birçî têñ ser te
Dîsa bi tang, dîsa bi top bi balafir
Dîsa bi derew, dîsa bi leyistik,
dîsa bi fenêñ xwe ve
Têñ ser te
Dîsa dikujin
Dîsa azadiya te, dîsa hebûna te dilujin

Ax welato, ez dizanim

Tu dîsa li ber xwe didî
Dîsa birîndar, dîsa westiyayî
Lê dîsa xurt i.

Ez dizanim,

Pêşmerga Dilêr, ku nû dergisti bûye
Disa tifinga wî li ser çokan
Di bin roniya heyvê de
Hêdî hêdî cixarêñ xwe dipêçe
(Ji lewre sibê dê wextê wî nebe)
Û te û dergistiya xwe difikire

Ez dizanjm

Xalîya Zînê, ku du lawêñ xwe şehîd daye
Dîsa di berbanga sibê de
Bi destêñ xwe yên pîroz
Xweliya kuçikê daye ali
Û agirê xwe pêxistîye
Û sêla nêñ daniye ser agirê
Û ji bo lawêñ te
Ji bo pêşmergan nan dipijîne

Ez dizanim,

Apê Osman,
ku şêst û pênc sal e şerê parastina te dide
Şêst û pênc bihar e birîndar dibe
Şêst û pênc zivistan e birînêñ xwe ditewîne
Dîsa niha
Di vê germa havînê de
Bi taqeta xwe ya dawî ve
Te dinivisîne

Ez dizanim

Xalê Hesen, ku bi çenda pûştî
bi çenda xirabî
û bi çenda qetf ditiye
Dîsa niha
Li eywana xwe re
Behsa te û tarîx û jan û birîn
û hêviyêñ te dike.

Ho welato,

Hêviya jiyana min
Sedemê min
Ev ci tarîx e welato !
Dijminê te
Dixwazîn min, ango yek ji lawêñ te
Ji te dûr bixînin
Ji lewre lawê te
Yek ji dilopêñ zerya dilê te
Ji bo te xebitiye.

Welato tarix qeşmer e
Durû û fêlbaz e
Kesên do ji te stariyek dixwestin
Îro li ser singa te diarin

Welato,
Heranê, deşta zêrin difikirim
Kaniya medeniyeta Mezrabetanê
Xwendegeha tarixê
Îro wêran e
Û leylana xweziyên dijmin e
Ev çi tarix e !
Şagirt
Pêta agirê daye
bin xwendegeha xwe ya ragirtî !

Welato
Misûlê, Kerkükê
Kaniya zêrê reş
Zozanê Keysarên tarixê difikirin
Zêrê me yê reş, ku têra me
têra wan
têra hemûyan dikir,
Îro xwîna me ya sor diherikîne.
Zêrê me yê reş,
bûye dijminê xwîna me ya sor
Ev çi tarix e !
Bi destêr keysarên îro ve,
Zozanê keysarên do dişewitine !

Ho welato,
Jana dilê min
Êşa mëjiyê min
Ji te pênc hezar kilometir dûr
Li kêleka zerya xweş rûniştî
Xweşiyên te difikirim
Rojnama li ber min,
Bi tipêr reş û mezin wisa dinivise ;
«Êdi 26 kes hemwelatên me nînin»
Welato, ji wan 26 kesan yek ji ez im.
Kurê te
Yek ji dilopên zera dilê te ya
Dikenim welato dikenim

Dewleta dijminê te, lawên te ji te davêje
Disa hêdî hêdî dikenim
Û difikirim, ka
Birayên min jî
Hogir hevalên min jî
Di girtîxana Diyarbekra qedim de dikenin

Birayên min, heval û hogirên min
Hun ji dikenin ?
Birînên xwe ditewînin ?
Û ji birçîbûnê
û ji zulma leşker û germa Diyarbekrê
Dikevin ?

Birano
Heval û hogirno
Şevê bê azadî, bê jin, bê kulîlk, bê vexwarin
Dijwar in
Di dilê merivan de çengal in
Di çiksayıya şevê Diyarbekrê de
Ji sicinê xwe
Binêrin heyv û stêrkên delal
Heyva me, stêrkên me
Yarêن me yêñ hezar salan,
Dostêr me yêñ zîndanan in
Xwişka Gulşin te difikirim
Li Mehabadê pênci û neh kes bidarve bûn
Tu ji yek ji wan bûyî ?
Lêdana dilê te bi gulêñ reş rawesta ?
Mindalên te ji séwi û stûxwar man ?

Xwişka Gulşin
Çem, deşt û rezên Mehabadê xweş in.
Çarçira û bexçen we xweş in
Lê bi xwîn, bi jan, bi qehr û bi serencan in.

Xwişka min
Delaliya azadiya welatê min
Êdi ne şeraba yaqûti û rengsor
Û ne ji heval û destbirayên Xeyam hene îro
Ev hemû pir û pir û pir
Li dûr man
Bûn rêzên rûpelan
Îro şer e

Êrişâ dijminê bextres e

Lawacan, Şêrgo te difikirim
Di vê germa havînê de
Qileqija deşta Cizirî de
Hê jî rûtal û zikbirçî ye ?
Hê jî bê kiras, bê defter, bê pêñûs i ?

Kuro, lawocan
Hêviya welêt, rûkenê Kurdistan
Diljariya kalikê xwe bixwîne
Dema kalikê te, di salê bavê te
Bavê te, di salê te de bû
Hingê kalikê te wisa dînivîsî :

"Dewsa avê xwîn rewan e,
birc û seran tev xirab
Jar û pejmirde dinalin,
tev ku em pergende ne"

Lawocan qurban
Ji wê rojê pêve tu tişt neguherî
Dîsa di her hatin û çûyina hechecikan de
Davên ser welatê me
Dîsa jar û pejmirde dinalin
Dîsa xwîn rewan e
Welato ...
Ji te dûr, di kêleka zeryayek xweş de
Te
Û zeryayênil dilê te difikirim.

M. Ferzend Baran

BIJÎ WELATÊ MIN

Divê em xwe pêk bînin ji bo felatê xwe,
Bijîn serbilind wekî çiyayên welatê xwe.
Berên xwe nedin hevdu û şerên hev nekin,
Bes rêya gelparêziyê li pêş wan vekin.
Welat ji me dixwaze xebat û têkoşîn,
Ne canxulamî, nokerî û serî danîn.
Serê ku bête danîn tucar nayê hildan,
Bi qelsî kes ne bûye xwedî rûmet û şan.
Rûmet serxwebûn e, digel ramanek xweser,
Holê ji bona gel em dikarin bibin rêber.
Rêber serî ye, nabe li pê gel bimeşe,
Tucar natewe, mirin jê ra gelek xweş e.
Rêya felatê pêş me dike ew ravekar e,
Li pêşberê gel û dîrokê berpirsiyar e.
Rêberî ne karê tewtew e û qelsan e,
Dijî koletî, canxulamî û pîsan e.
Bi qelsî nikarin serên xwe hildin, rakin
Welatê xwe bistînin, gel tê da azadkin.
Divê bi xurtî em berên xwe bidin neyar,
Bi jîrî û zanatî millet bikin hişyar,
Bijî welatê min ji bona te gorî can
Sond dixwim ku bibim pandî ji bo Kurdistan.

Osmân Sebri

Pirtûkêñ nû

Di vê quncikê de emê her hejmar pirtûkêñ ku di demêñ dawîn de, bi kurdî an bi zimanê biyanî li ser Kurdan derketine bidin nasîn. Xebat ji bo pékanîna pirtûknasiya kurdî ferz e û em hévidar in ku ewê xwendevan kêmâsiyén ku tê de dibînin ji me re binivîsin.

Em di vê hejmarê de lista pirtûkêñ di salêñ 1981-1982 de çapbûyî didin. Di hejmara 2 de ewê pirtûkêñ di 1983 de derketî bêñ pêşkêş kîrin.

ZIMAN

ALANI, R. E. Kêseyek le rêzmanî kurdî da, Wezareta çand û agahdariyê, Bexda, 1981, 244 rûpel.

Ciyê paşdaniya (suffixe'a) ewe, we di zaravayêñ kurdî de çi ye ? Alanî bi karanîna wê di metnêñ edebî yên bi zaravayêñ baban, mukrî, soranî, ardelanî, goranî, di ya Caf û Hewramîyan de, di lorî, farisî û wisa jî di kurmancî de dide berhev û bi vê lêkolîne dixwaze riya yekkirina zaravayêñ kurdî ronî bike.

BEDIRXAN, K. Elfebeya kurdî, Bonn, çapxana Sîpan, 1981, 28 rûpel.

Alfabeya Mir Kamûran Bedirxan cara pêşin di sala 1938, li Beyrûte çap bû bû û di belavkirina tipêñ latinî yên «Hawarê» de roleke berbiçav leyîstî bû. Bi wesîla 3 saliya mirina Mîr Kamûran, E. Altunç wê ji nû ve li Almanya Federal çap kiriye.

EBRAHÎMPÛR, M.T., Dastûrê Zabanê Kordî (awramî-sanandacî-kermanşahî-mahabadi), Tehran, çapxana Ruzbeh, 1981, 51 rûpel.

Di vê lêkolîna kurt de, Ebrahîmpûr rêzimana çar devokêñ Kurdêñ Iranê dide berhev û ji vê bûnê alfabeylekî erebî ya nû û serbixwe bikar tîne. Ev alfabe, ji yên ku ta niha nivîskarêñ kurdêñ Iran û Iraqê pê nivîsîne cihê ye û gelemeña ku di vî warî de dom dike siviktir nake.

HEWRAMANI, M.E., Zari zimanî kurdî le tirazûy berawurd da, Wezareta çand û agahdariyê, Bexda, 1981, 326 rûpel.

Gelo goranî zaravayeke kurdî ye ? Bi awê iranîzanêñ navdar Minorsky û Mackenzie bersiva vê pîrsê na ye ; goranî dikeve koma zimanêñ iranî yên rojava (lê ne kurdî)

Di lêgerfîna xwe de Hewramanî bi delîlêñ dîrokî zimannai û dinî dixwaze nişan de goranî jî wekî lorî, bacolanî û hewramanî peşkekê zaravayê «kurmanciya xwarû» ye.

EDEBIYAT

BLAU, J. et HAKEM, H., *Perles d'un collier, textes kurdes (soranî)*, Institut National des Langues et Civilisations Orientales, Paris, 1981, 95 rûpel.

Ev 27 nivîsarên kurdî ji berhevoka çîrokên kurdî ya Alaedin Secadî (Rıştey Mirwarî, Bexda, 1957-1980) hatine helbijartîn ji bo xwendekarêni biyanî yên ku dixwazin zaravayê kurmanciya xwarê (Soranî) hîn bibin.

ELÎ, D., Dîlan, şâîr û azadîxuwaz, Bexda, 1981, 76 rûpel.

Lékolineke kurt li ser jiyana şâîr Dîlan û li ser afirandinê wî.

SABAR Y, *The folk literature of the Kurdish Jews, an anthology*, Yale University Press, New Haven and London, 1982, 250 rûpel.

Berî çêbûna dewleta Israîlê qasî 190 cemaetên cihû dijîn li navçeyêni ciyayıyîn Kurdistanê. Ewan di nav xwe de, wekî mesihiyêni Kurdistanê, bi zimanê aramî (zimanê Hezretî Isa) dipeyivî, lê jiyana wan a civakî, folklor û mûsîkiya wan wekî yên Kûrdêni misilman bûn. Cihû di salêni 1950-1951 Kurdistanê terikandin û çûn Israîlê. Niha jî li Qudsê «Taxa Kurda» heye.

Nivîskarê vê berhevoka folklorî Yona Sabar bi xwe jî yek ji cihûyêni Kurdistanê ye ; çîrok, stran, efsane û methelokên wan berhev kiriye û wergerandiye îngilîzî.

BOZARSLAN, M. E., *Meyro*, çîrok, Invandrarförlaget, Boras, 1981, 74 rûpel. Çirokeke bi wêne ji bo zarokan. Li Swêdê bi alfaba latinî bi çapeke bedew derketiye.

BOZARSLAN, M.E., *Mîr zoro*, Meselokêni lawîran I, Invandrarförlaget, Boras, 1981, 75 rûpel.

BOZARSLAN, M. E., *Gurê Bilûrvan*, Meselokêni Lawiran II , Invandrarförlaget, Boras, 1982, 71 rûpel.

Ev her du pirtûk jî ji bo zarokêni kûrdêni dervayî welêt, xasme yên Swêdê hatine çap kirin.

BERGSTÖRM, G., *Ma tu tirsonek i Alfons Oberg ?* Stokholm, 1981, 30 rûpel. Çirokeke bi wêne ji bo zarokêni piçûk. Ji Swêdî hatiye wergerandin.

CIGERXWÎN, Zend - Avista, Diwana 5'a, Stockholm, 1981, 176 rûpel.

Piştî Diwana, Sewra Azadi (Diwana 2a), Kîme ez ? (Diwana 3a) û Ronak (Diwana 4a) vî cildê nû yên helbestêni Cigerxwîn li Swêdê derket.

CIGERXWÎN, Şefaq, Diwana 6'a, Stockholm, 1982, 180 rûpel.

LINDGREN A. WIKLAND I., *Belê lotta kare bajo*, Spango, 1982, 32 rûpel. Çirokeke bi wêne ji bo zarokêni piçûk. Ji Swêdî hatiye wergerandin.

NEBAZ, T., Nigay xoşewîstî, Sulêmanî, 1981, 55 rûpel.

Berhevoka pêşin a helbestên , T. Nebaz tevî pêşgotineke Ebdûl Şarbajêri.

OBEYDÎ, Z., Kit û Mişk, Tehran, 1981, 18 rûpel.

Helbesteke bi zimanê farisî ji bo zarokan hatiye nivîsin ku Ehmedê Qazî wergeran-diye kurdî.

ŞAHREZÎNÎ, E.M., Pendî Pêşinanî Kurd, cild 1, Bexda, 1981, 55 rûpel.

Gotinêne pêşîyan û methelokên kurdî bi zaravê soranî. Di 1971 de Mihemmedê Xal li Silêmaniye 3700 methelok çap kiri bû û pêş wî ji şâirê navdar Pîremerd 6500 di wan kiribû helbest da kur ew neyên ji bîr kirin. Di zaravê kurmancî de jî berhevokên Roger Lescot û yên Ordixanê Celil û Celilê Celil derketine.

ŞARBAJÊRÎ, U., Gewherê goranîyekanî Hesen Zîrek, Bexda, 1981, 366 rûpel.

Hesen Zîrek yek ji hêjatîrin dengbêjên Kurd bû. Hin ji stranêne xwe bi xwe nivîsi bû û himan jî ji folklorâ kurdî an ji helbestvanêne klasik an nûjen ên kurdî stendiye. Şarbajêri stran û helbestên ku H. Zîrek distiriya di vê berhevokê de civandiye.

ZAZA, N., Ma vie de Kurde ou le cri du peuple kurde, éd. Pierre-Marcel Favre, Lausanne, 1982, 223 rûpel.

Bîranînen Dr. Nûredîn Zaza ; zarotiya wî, di dewra osmaniyan de, rabûna M. Kemal, serhilanîna Şêx Seid, salêne sirgûnê li Suriya jîr destê Fransa, sazbûna Komela Xwendekarêne Kurdistan li Awrûpa û ya PDK a Sûriyê, zîndanêne Sûriye, Libnan, Iraq û Urdîne. Bîranînen nivîskarê navdar û dîroka gelê Kurd a nêzîk di gelek ciyan de tevî hev dibin. Şahideyeke sereke ye ji bo dîroka kurdî.

DÎROK

BABAN C. Hendêk damerî benawbang, Bexda, 1981, 250 rûpel.

Çend dameriyêne (mehkemeyen) navdarêne dîroka cihanê : yên Sokrat, Louis XVI, Dreyfus, Mosadeq, Şêx Mahmûd, hwd ... bi kurdiyeke xwerû û spehî.

BOIS Th. Kurdes et Kurdistan in Encyclopédie de l'Islam (Nouvelle édition), tome V, livraison 85-86, r. 441-489, 1981 (E.J. Brill, Leiden ; Ed. G. P. Maisonneuve et Larose S. A ; Paris)

Thomas Bois kurdizanekî fransizî mezin bû. Piraniya jiyanâ xwe li Rohelata Navîn û di nav Kurdan de derbas kiri bû. Xebatêne wî yên zanistî li ser dîrok, ol, edebiyat û folklorâ kurda bi zimanê fransizî û ingilîzî derketine. Vê benda han a li ser dîrokê ji bo çapa nû ya Ansiklopediya Islam pêş mirina xwe (1975) nivîsi bû.

CHALIAND, G., Les Kurdes et le Kurdistan, la question nationale kurde au Proche Orient. François Maspero, Paris, 1981, 369 rûpel.

Çapa nû, di nav pirtükên berîkê de, tevî agahdariyêne teze li ser Kurdistanâ Iranê. Çapa pêşin a vê pirtûka li ser dîroka Kurdistanâ ji sedsala XIX ta iro bi bendêne A.R Ghasem-lou, Kendal û I.C Vanly di 1978 de derketibû, ingilîziya wê jî di 1980 de (Zed Press, London).

GHAREEB, E. *The Kurdish Question in Iraq*, Syracuse University Press, New York 13210, 1981, 223 rûpel.

Serén Kurdên Iraqê ji 1919 ta îro ji bo azadî û mafêneteweyî. Tevgerên partiyêن Iraqê li hemberî pirsa kurdî, bi çawê nêrevanekî libnanî, nivîskarê «Al-haraka al-qawmiyya al-kurdiyya, Dâr al-Nahâr, Beyrût, 1973» .

ŞEREFXANÊ BIDLISI, Şerefname, Tehran, 1981 ; 871 rûpel.

Şaîrê navdan Hêjar, vê afirandina klasik a dîroka Kurdistanê ji farisî wergerandiye kurdiyekede edebî û dewlemend. Xizmeteke dîrokî ye ji bo çanda kurdî.

GORKÎ, M., Dujminan, Bexda, 1981, 204 rûpel.

Maxime Gorkî vê piyesa şanoyê (tiyatroyê) di 1905 de li ser şerê karkerêna fabrika-yekê nivîsi bû. Ewrahman Haci Marif û Mihemedê Mela Kerim wê wergerandine kurdî û nivîsareke Plexanov li ser «psîkolojiya şerê karkeran» jî bi ser ve zêdekirine.

HELBESTEN ŞOREŞGERI ji Kurdistan Iraq, Swêd, 1981, 60 rûpel.

Berhevokeke helbesten Goran, Bêkes, Zêwer, Kakey Felah, Piremeđ, Hawar, Ehmedê Herdî, Şewketê Huşyar, Dildar, Kameran, Mukrî, Dîlan, Şewnin, Cemal Şarbajîri, Abdullah Pêşew û Hêmin. Bi alfaba latinî teví ferhengokeke Soranî / Kurmancî.

HIKMET, N., Dastanî Şêx Bedredin kuri qaziy Simawne, Bexda, 1981, 78 rûpel.
Şukur Mistafa vê afirandina bijare ya Nazim Hikmet ji tirkî wergerandiye kurdî.

NAVIDI, N., Xermanî xem û pejare, Mahabad, çapxana Aso, 1981, 53 rûpel.
Piyeseko şanoyî bi farisî nivîsi ji alî Celîl Gadanî ve hatiye wergerandinê kurdî.

Joyce Blau
Dominique Ferrendini
Helkewt Hakim


ÇAPA KURDİ HEWCÊ ALÎKARIYA HER WELATPARÊZÊ KURD E

Jiyana zimanê gelê me bi pêşvebirina xwendin û nivîsandina kurdî dibe. Kesên xwendewar hewcê kitêb, kovar û rojnaman in ji bo firehkirina zanîna xwe. Nivîskar jî hewcê wan in ji bo belavkirina afirandinêxwe.


Di hoyêñ (şertêñ) ku iro Kurd tê de ne, çapeke azad dikare tenê li derveyî welêt bijî. Lê, ji alî malî û diravî ve, jiyandina vê çapê karekî gelek dijwar e. Rojname û kovarêñ awrûpayî bixwe, pirîcar, ancax bi saya pesnakan (reklaman) li piya dimînin.

Himin ji bo hişyarî û azadîya gelê me çapeke azad, bi zimanê kurdî, ferz e, divê ku her welatparêzê kurd di vî warî de bi berpisiyarî biliye, erkêñ (wezîfêñ) xwe zanibe : kovar û kitêbêñ kurdî xwendin, dan xwendin, belavkirin, alîkariya wan a diravî, teşwîqa wan. Wisa jî kesên ku dizanin binivîsin divê ji wan re bend û nivîsandinan bişînin, kêmasiyêñ wan bi aveyekî çêkirox rexne kin, da ku çapa kurdî meh bi meh, sal bi sal xurtir, hêjatir, dewlementir û jîndartir be.

Enstîtu ji her kurdî hêvî dike, ne tenê kovar û kitêbêñ Enstîtuyê, hemû weşanêñ bi zimanê kurdî bixwînin, alîkariya wan ji xwe re erk zanibin. Bila kes tucar mebêje : « ku ez nekim, ewê hevalêñ din alîkariya wan bikin ». Şerê çandî pareke hîmîya şerê azadiyê ye. Ev şer ewê tenê bi alîkarî û hevkariya hemû welatiyêñ me, hemû Kurdêñ dilsoz dikaribe serkeve.



Dumilî



Dimilkî de lêkerê hevedudanî

Lêker (verbe, fi'l) : Kelîmeya ki kerdiş, biyayış nê zî hereket ifade kena tira lêker vajiyêno. Dimilkî (Zazaki) di lêkerî tewir tewir i :

I – Lêkerê basîtî (lêkera xwerû) : Ay lêkerê ki yew kelîma ra viraziyayê tira lêkerê basîtî vajiyêno.

II – Lêkerê hevedudanî (verbe composé, fi'lî murekkeb) : Ay lêkerê ki çend kelîman ra, nê zî berlêker (préverbe, pêşpiristik) û lêker ra viraziyêne tira lêkerê hevedudanî (félé bargiranî) vajiyêno. Ma tiya di mester (infinitif) ê nî lêkeran sero vindentîme.

Lêkerê hevedudanî, hîrê gruban ra yenê meydan :

A – Lêkerê hevedudanîyê ki berlêker û lêker ra viraziyênê.

B – Lêkerê hevedudanîyê ki name (nom, îsm) û lêker, nê zî sifet (adjectif, rengdêr, xeysetnav) û lêker ra viraziyênê.

C – Lêkerê hevedudanîyê ki yew kelîma di ray vata (tekrar kerda) û lêker ra viraziyênê. Nika ma nî gruban sero yew bi yew vinderîme :

A – Lêkerê hevedudanîyê ki berlêker û lêker ra viraziyênê : Nî lêkerî hîrê şaxan ra yenî meydan :

- a) berlêkero basît + lêker
- b) berlêkero lihevxitî (contracté) + lêker
- c) berlêkero hevedudanî (composé) + lêker

a) berlêkero basît lêker : Niy lêkerî yew berlêkero basît û hina vi şî lêkeranê ardimkerdoxan (fêlén ardimiyê) ra viraziyênê.

Lêkerê ardimkerdoxî : Dimilkî di lêkeranê ardimkerdoxan ra çend teney nîy ê :

Dimilkî (Zazakî)

ameyîş (homeyîş) / ameyine (D)
 biyayîş (beyîş) / biyayîne (D)
 dayîş / dayene (D)
 gîrewitîş (gurotiş) / guretene (D)
 kerdîş / kerdene (D)
 kewtiş / kewtene (D), kotîş
 mendîş / mandene (D)
 vistîş*

Kurmancî (Kirdası)

*hatin
 bûn
 dayîn
 gîrtin
 kirin
 ketin
 man, mayîn
 xistin*

Dimilkî di berlêkerê basîtî zî nîy ê :

- 1) a- 2) ci- 3) de- (di-) 4) der- 5) ra- 6) ro- 7) vaz- 8) ver- (var-)
 9) vir- 10) we- (wur-, hur-).

1 - A-**Dimilkî****Hewramî / Gûranî****Kurmancî**

<i>a-</i>	<i>a-, awa-, horo-</i>	<i>ve-</i>
<i>ageyrayîş</i>	<i>horo gelay</i>	<i>vegerîn</i>
<i>akerdîş / akerdene (D)</i>	<i>awa kerdey</i>	<i>vekirin</i>
<i>alaqnayîş (leqnayîş)</i>	<i>aloçnay (halûçiyan)</i>	<i>daleqandin</i>

Dimilkî di : 1) *abiyayîş (abeyîş); 2) açınayîş; 3) ageyrnayîş; 4) aqitnayîş.*
 Kurmancî di : 1) *vebûn; 2) vejenîn, veçînîn; 3) vegerandin; 4) veqetandin.*

Dimilkî di çend lêkerê hevedudanîyê bînê ki berlêkerê a- reydi dest
 pey kenê bi alfabetik nîy ê : abiriyayîş, abirnayîş açarnayîş, afînayîş ,
 agirewtîş (agirotîş), akewtiş , amendîş , aniştîş (S), avistiş.

2 - CI-

No berlêker, hina vîşî dimilkîya Sîwereg û Bîngol'î di vajiyêno. Dormarê Pîran'î di herunda «ci-» di gege «de-», gege zî «der-» vajiyêno. Çend mîsalî :

Bîngol (Çewligî)**Pîran**

<i>cigeyrayîş</i>	<i>dergeyrayîş, bede geyrayîş (G.)</i>
<i>cisanayîş (B), cisänayîş (S)</i>	<i>deşanayîş</i>

<i>ciniştis</i>	<i>deniştis</i>
Dimilkî	Kurmancî
<i>ci-</i>	<i>jê-</i>
<i>cikerdis (S)</i>	<i>jê kirin</i>

3 - DE- / DI- (B)

Dimilkî	Kurmancî
<i>de-, di-</i>	<i>da-</i>
<i>dekerdis</i>	<i>dakirin</i>

Dimilkî di : debestiş, debiyayış, decenayış, defereknayış (defirknayış), definayış / difinayış (B), degeyrayış, degirewtiş (degurotiş), degunayış, dehesiyayış, dekewtiş / dikotış (B), dekupiyayış (dekupeyış), dekupnayış, dekutiş, depernayış, deniştis, depiştis (tebiştis), deresayış, deresnayış, desawiyayış, desawitiş, desanayış, deşiyayış (deşeyış) / dişiyayış (B), devistiş / divistiş (B), digînayış (dugnayış), digîrotiş (dugrotiş), deverdayış, deverdiyyayış.

4 - DER-

Dimilkî	Kurmancî
<i>der-</i>	<i>jê-</i>
<i>dergeyrayîş</i>	<i>jê gerîn</i>

Dimilkî di : dermendiş, derqeleybiyayış (bider qelebiyayış), derqelibnavış (bider qelebnavış).

5 - RA-

Dimilkî	Kurmancî
<i>ra-</i>	<i>ra-</i>
<i>ravistîş, rakerdis</i>	<i>raxistin</i>
<i>rakewitsîş</i>	<i>raketin</i>

Dimilkî di : radayış, rabiyyayış (rabeyış) / rabiyyayene (D), ra dime kotene (era dime kotene) (D), rafînayış (S), rageyrayış, rakerdiş / rakerdene (D), raqilaşıyene (D), raşaniyayış / rasaniyayne (D), raşonayış (B), ravernayış (S), raverdene (D) / ravertiş (B, S), ravistiş (S), ra vîr ameyine (D), ra vîr kewtene (D), rawiştayini (E).

6 - RO-, RÛ- / RUE- (B)

Dimilkî	Hewramî	Kurmancî
<i>ro-, rû-, rue (B)</i>	<i>ere-</i>	<i>rû-</i>
<i>ronıştıg, ruenıştıg (B),</i>		
<i>ronistene (D)</i>	<i>ere niştey</i>	<i>rûniştin</i>
<i>ronayış / ruwenayış (B)</i>	<i>ere niyay</i>	<i>danın</i>
<i>roşanayış / ruweşonayış (B)</i>		<i>rûniştandin</i>
<i>rokerdiş / ruekerdiş (B)</i>		<i>rokirin</i>

Dimilkî di : robiyyayış, rodayış, rojanayış, rojaniyayış (rojaneyış), rokewtiş / rukotış (B), roşaniyayış, rovetiş (rûvetiş).

7 - VAZ-

Dimilkî	Hewramî	Kurmancî
<i>vaz-</i>	<i>baz-</i>	<i>baz-</i>
<i>vazdayış / vazdayine (D),</i>		
<i>vostayine (E)</i>	<i>bazday</i>	<i>bazdan</i>

8 - VER- (VAR-)

Dimilkî	Hewramî	Kurmancî
<i>ver-</i>	<i>wer- (wel-), werû-</i>	<i>ber</i>
<i>verdayış, verradayıg /</i>		
<i>verdayene (D)</i>	<i>werday</i>	<i>berdan</i>
<i>verkewtiş / verkewtene (D)</i>	<i>werkewtey</i>	<i>berketin</i>
<i>vérdis (vêretiş, viyartış)</i>	<i>welday</i>	<i>bûrîn, derbaz bûn</i>
<i>vervistiş</i>		<i>ber xistin</i>

Dimilkî di : ver bider dayış (ver bere dayış), ver dayene pêw (D) / ver pê dayış, ver dayîne de (D) / ver de dayış, ver dayîne ra (D) / verdayış ra (B), verdayış, verdiyayış (verdeyış), ver finayış, ver pê dayış, ver pê diyayış (ver pê deyış), ver resayış, ver şanayış, ver şiyayış (ver şeyış), ver tê miyan dayış, ver tê miyan diyayış (ver tê miyon deyış), ver vistış, ver xwi dayış.

9 - VIR-

Dimilkî

vir-
virbiyayış
virkerdiş

Kurmancî

hil-
hilbûn
hilavêtin

10 - WE-

Dimilkî

we-
wegirewtış (*wegirotiş*,
wegurotiş)
webiyayış, *webeyış*
wekerdiş (S)/ *wekerdene* (D)

Hewramî

hur-
hurgirtay

Kurmancî

ra-
ragirtin
vebûn
vekirin

Dimilkî di : weçînayış, wedariyayış (S)/ wedareyış, wedayış, wedertiş (wedetiş)/ wederdayene (D), wedaritene (D), weferiyayış (wefireyış), wefernayış (wefirnayış), wenayış, wenîştîş, weşanayış, weşaniyayış (weşane-ış), weşonayış (B), weteriyayış (wetireyış), wetirnayış (waternayış).

11 - WER- (WUR-, HUR-)

Dimilkî

wer- (*wur-*, *hur-*)
wereznayış, *wuriznayış*
weriştîş, *wuriştîş*
werantiş

Hewramî

wur-, *hor-*
wuriznay, *urznay*,
huriznay, *hurgeray*
hurestay, *hurstay*,
hurzay

Kurmancî

hil-, *ra-*
hildan, *rakirin*
rabûn
hilkirin, *hildan*

- b) berlêkerô lihevxitî +(yew kelîma) + lêker
 Dimilkî di berlêkerê lihevxitî nîy ê :
 1) cê- 2) pa- 3) pey- 4) pê- 5) po- 6) ta- 7) têw- (tê-), 8) to-,(tû-)

1 - CÊ-

Dimilkî

cê-
 cê kerdiş, ci kerdiş (S).
 cê biyayîş (cê beyîş)
 cê kewtiş (cê di kewtiş)

Kurmancî

jê- (ji hev-)
 jê kirin (ji hev kirin)
 jê bûn
 ji hev ketin

2 - PA-

Dimilkî

pa-
 pa biyayîş (pa beyîş)
 pa kerdiş
 pa nayîş
 pa şiyayîş (pa şeyîş)

Kurmancî

pê ve-, pê de-, pê re-, pê-
 pê re bûn
 pê ve kirin
 pê xistin, vê xistin
 pê ve çûn, pê de çûn

Dimilkî di : pa aniştiş (S), pa bestiş, pa çerayîş (pa çertiş), pa dayîş, pa
 diyayîş (pa deyiş), pa dusayîş, pa dusnayîş, pa fînayîş, pa gunayîş (pa
 ginayîş), pa kewtiş, pa niştîş, pa niyayîş (pa neyîş), pa şendeliyayîş (pa
 şendileyîş), pa şiyayîş (pa şeyîş), pa vistiş.

3 - PEY-

Dimilkî

pey-
 pey hesiyayîş / pey
 heşiyayine (D)
 pey zanayîş

Kurmancî

pê-, bi wî-
 pê hesîn
 pê zanîn

Dimilkî di : pey ameyîş, pey îman ardiş, pey kay kerdiş, pey merdiş, pey
 nayîş, pey niştîş / peya niştîş, pey paye kerdiş, pey paye kewtiş, pey şanayîş,

pey şiyayış (pey şeyiş), pey şînayış, pey vindertiş, pey viraştiş.

4 - PÊ-

Dimilkî

pê vero kewtiş

Dimilkî

pê-
pê ameyış (*pê homeyış*)
pê ardiş
pê geyrayış
pê kerdiş / pîya kerdiş (S)
pê kewtiş
pê mendîş, pê manayış
pê hesiyayış (*pey hesiyayış*)

Hewramî

pê were kewtey

Kurmancî

pê-, bi hev (pev), li hev (lev), lê-
li hev hatin, lê hatin
li hev anîn
li hev gerîn, ji hev gerîn
bi hev kirin (pev kirin)
bi hev ketin
bi hev man
pê hesin

Dimilkî di : pê daritiş, pê feka nayış, pê feko perrayış, pê fek ra vatis, pê ginayış (pê gunayış), pê girewtiş, pê mişewriyayış, pê persayış, pê pey ginayış (pê pey gunayış), pê pey nayış, pê pey niştîş, pê pîs beyış, pê reşayış / pê reşteni (E), pê rîz biyayış, pê rîz kerdiş, pê ser biyayış, pê ser nayış, pê serra kerdiş, pê serra kewtiş, pê serro dayış, pê serro gunayış, pê ser şiyayış (pê ser şeyış) / pê ser şiyayene (D), pê ser visnayış (S), pê şanayış (pê şonayış), pê şatnayış, pê vera kewtiş, pê verro kerdiş, pê vero nayış, pê vero şiyayış.

5 - PO-, PÛ-

Dimilkî

po-, pû-
po kerdiş

Kurmancî

pê ve (bi ... ve)
pê ve kirin

Dimilkî di : po fînayış, po vistiş (pû vistiş).

6 - TA-

Dimilkî**Kurmancî***ta-**pê-, tê-, lê**ta kewtiş**lê ketin**ta vistiş**pê xistin, vê xistin*

Dimilkî di : ta ameyîş, ta ardiş, ta çarnayîş, ta dayîş, ta fînayîş, ta fîneyîş, ta geyrayîş, ta şuyayîş, ta şuya biyayîş.

7 - TÊ- / TIYE- (B)**Dimilkî****Kurmancî***tê kewtiş**vê ketin*

Dimilkî di : tê bestiş, tê bina kerdiş, tê birnayîş, tê dayîş / tiyo dayîş (B), tê diyayîş (tê deyîş), tê elawitiş, tê elawiyayîş, tê fek vistiş, tê geyrayîş, tê hefilnayîş, tê kerdiş, tê kewtiş, tê miyan biyayîş, tê miyan kerdiş, tê miyan kewtiş (tê miyo kotiş), tê miyan nayîş, tê pey gunayîş / tiya pey ginayîş (B), tê pey kerdiş, tê pey niştîş, tê pey ra kewtiş, tê qest kewtiş, tê quesnayîş, tê qesiyayîş, tê qiy nayîş / tê qini nayîş, tê ri kewtiş, tê sawiyayîş (tê saweyîş), tê sawitiş, tê ser di qelebiyayîş, tê ser di qelebnayîş, tê sere biyayîş, tê sere kerdiş, tê ser nayîş, tê serra kerdiş, tê serra kewtiş, tê serro dayîş, tê şanayîş / tiye şonayîş (B), tê şaniyayîş (tê şoneyîş), tê tewr kerdiş (S), tê ver kerdiş, tê vera kewtiş, tê veriki kewtiş, tê veriki nayîş, tê ver nayîş, tê verro kerdiş, tê vero şeyîş, tê verro şiyayîş (tê verro şeyîş).

8 - TÊW- (TÊ-) / TEOW- (B)**Dimilkî****Kurmancî***têw- (tê-)**tev**têw dayîne (D)**têwo dayîş, tiyo dayîş,**tê dayîş**tev dan***9 - TO-, TÛ-**

Dimilkî**Kurmancî**

to-
to kerdîs

hil-
hilkirin

Dimilkî di : to biyayış (to beyîş) , to dayîş, to vetîş.

c) berlêkerê hevedudanî + lêker :

Ma berlêkerê hevedudanî cêra nawitîme. Zeki haseno nîyan di « bi, ci, di, pe, pi, te, ti, te, ver » ra yew û « de, der, ra, ro » ra yew yenî têver. Ma vajîme :

cira (ci + ra)
dirra (di + ra)
pira (pi + ra)
tira (ti + ra)

Dimilkî di lêkerê hevedudanî nîy ê :

1) bider- (bere-) 2) cira- (tira-) 3) dirra- (dira-) 4) pede- (pedi-) 5) pêra- (piya-) 6) pêro-, pyerû-, pyor- (B) 7) pira- 8) piro- 9) tede-, tedir-, tey- 10) têra- 11) têro- 12) tira-, dîra-, cira-, pira 13) tiro- 14) vera- 15) verra- 16) vero- 17) verro- .

Nika ma yew bi yew nîyan bivînime :

1 - BIDER-, BERE- / BEDE- (G)

Dimilkî**Kurmancî**

bider-, bede-, bere-
bider suwar biyayış

lê
lê suwar bûn

Dimilkî**Hewramî**

bide-, bere
bide huwayış

pene
pene xuway

Dimilkî di : bider geyrayış (bere geyrayış), bider hewniyayış (bere howneyîş), bider kerdîş, bider nawitiş (bere nawitiş), bider qelebnayış, bider sawitiş, bider sawiyayış, bider şanayış (bere şanayış), bider şeyîş, bider tadayış.

2 - CIRA- (S) / TIRA- (P)

Dimilkî

cira- / tira-
cira girewtiş
(tira girewtiş)

Kurmancî

jê-
jê girtin

Dimilkî di : cira ameyiş, cira birnayiş, cira girewtiş, cira şiyayış (tira şiyayış), cira vetiş (tira vetiş).

3 - DIRRA- (DIRA-) / TIRA- (Pa)

Dimilkî

dirra-
dirra biyayış
dirra kerdiş

Kurmancî

jê-
jê bûn
jê kîrin

4 - PEDE- / PEDI- (B)

Dimilkî

pede- / pedi-
pede leqnayiş
(pede alaqnayiş)
pede dayiş
pede şiyayış / pedi şiyayış (B)

Hewramî

pore
pore aloçnay

Kurmancî

pê de-, pê ve-
pê ve dan
pê ve çûn (bi... ve çûn)

Dimilkî di : pede ameyiş, pede ardiş, pede fînayış, pede giyriyayış, pede kerdiş / pedi kerdiş (B), pede kewtiş / pedi kewtiş (B), pede şendiliyayış (pede şendileyiş) pede şendelnayış, pede vistiş.

5 - PÊRA- (PÎYA)

Dimilkî

pêra- (piyâ)

Hewramî

pêwa-

Kurmancî

pê ve (bi hev re)

Dimilkî di : pêra bestiş (piyâ bestiş), pêra dayiş, pêra kewtiş, pêra nayış (piyâ nayış), pêra neyiş (piyâ niyayış), pêra weş biyayış (pêra weşî biyayış).

6 - PÊRO / PIYERÛ-, PYOR- (B)

pêro biyayış (pêro beyış), pêro dayış / piyerû dayış (B), pêro dayene (D), pêro gunayış (pêro ginayış).

7 - PIRA- / TIRA-

Dimilkî

pira-
pira kerdiş (tira kerdiş)

Hewramî

pore-
pore kerdey

Dimilkî di : pira bestiş, pira dayış, pira girewtiş, pira guretene (D), pira kerdiş (S), pira nayış, pira şanayış (pira şonayış), pira şaniyayış (pira şoneyiş), pira şiyayış (pa şeyış).

8 - PIRO, PERO, PURO / PIRUE- (B), PURE-, PURI- (B)

Dimilkî

piro-, pede-
piro alaqnayış
(pede leqnayış)

Hewramî

pore-
pore aloçnay

Dimilkî

piro-
piro dayış, puri dayış (B)
pero dayene (D)
piro kerdiş
piro şanayış

Kurmancî

lê-
lê dan
lê kirin
lê reşandin

Dimilkî di : piro bereziyayış (piro berrizeyış), piro bestiş, piro birnayış, piro biyayış (piro beyış) / pure biyayış, puri biyayış (B), piro cenayış / puri cenayış (B), piro çungirriyayış, piro ginayış (piro gunayış), piro girewtiş, piro kurri kerdiş, piro mal biyayış, piro masnayış, piro nayış, piro nurrî kerdiş, piro pêser biyayış, piro pêser kerdiş, piro qelebnayış, piro sur biyayış, piro şanayış / puri şonayış (B), piro şikitiş, piro şiyayış (S), piro tadayış.

9 - TEDE-, TEDIR-, TEDI- / TEY- (S)

Dimilkî di : tede behs kerdiş, tede dejayış, tede girewtiş, tede kar kerdiş,

tede mahkima biyayış, tede mendiş, tede rayîr deyîş, tede serî şeyîş, tede şeyîş, tede şêllik biyayış, tede şêllik kerdiş, tede tey vetiş .

10 - TÊRA-

Dimilkî di : têra biyayış (têra beyîş), têra çarnayış, têra geyrayış, têra kerdiş, têra şiyayış (têra şeyîş).

11 - TÊRO-

Dimilkî di : têro çarnayış, têro dayîş, têro pêşiyayış (têro pêşeyîş), têro şiyayış, têro şiyayış-ameyış (têro şeyîş-ameyîş).

12 - TIRA- / DÎRA- (E), CIRA- (S), PIRA-

Dimilkî Kurmancî

<i>tira-, dîra-, cira-</i>	<i>jê-</i>
<i>tira ameyîş</i>	<i>jê hatin</i>
<i>tira birnayış</i>	<i>jê bîrin</i>
<i>tira girewtîş</i>	<i>jê girtin, jê stendin</i>
<i>tira kewtiş</i>	<i>jê ketin</i>
<i>tira mendîş</i>	<i>jê man</i>
<i>tira peye biyayış</i>	<i>jê peya bûn</i>

Dimilkî di : tira cigriyayış, tira çarnayış, tira dayîş, tira hera geyrayış, tira hes kerdiş, tira heybî kewtiş, tira hîlle kerdiş, tira kerdiş, tira lomey kerdiş, tira mana vetiş, tira mehrûm mendiş, tira mîzzi ver xwi dayîş, tira mîzzi xwi ro kerdiş, tira nayîş, tira peyda biyayış, tira şanayış, tira şeyîş (tira şiyayış), tira teber kerdiş, tira vetiş, tira wardîş (tira werdiş), tira xwi kerdiş.

13 - TIRO-

Dimilkî di : tiro ameyîş, tiro cenayış, tiro kerdiş, tiro şiyayış (tiro şeyîş).

14 - VERA-

Dimilkî Kurmancî

<i>vera-</i>	<i>jî ber ... ve</i>
--------------	----------------------

vera dayış

ji ber ... dayin

Dimilkî di : vera ci dayış (S), vera geyrayış (S), vera girewtiş (vera guretiş), vera kerdiş, vera kewtiş, vera nayış, vera şiyayış (vera şeyiş), vera xwi ... kerdiş.

15 - VERRA-

Dimilkî di : verra antiş, verra çarnayış, verra dayış, verra diyayış (vera dayış), verra geyrayış, verra kerdiş.

16 - VERO-

Dimilkî

vero-
vero ameyış
vero geyrayış
(vera geyrayış) (S)

Kurmancî

li ber-
li ber rabûn
li ber gerîyan

Dimilkî di : vero dayış, vero deştiş, vero kewtiş, vero nayış, vero niyayış (vero neyiş), vero şiyayış (vero şeyiş), vero viraştış.

17 - VERRO-

Dimilkî di : verro ameyış, verro kerdiş.

B — Lêkerê hevedudanîyê ki name û lêker, nê zî sifet û lêker ra viraziyênenê :

- a) Name + lêker
- b) Sifet + lêker

a) Name + lêker - çend mîsalî :

Dimilkî

ca ardiş, ardiş ca
kay kerdiş
muçî kerdiş
qise kerdiş (qisey kerdiş)

Hewramî (Pawe / Kurdistanê İranî)

we ca awirdey
kaye kerdey
maç kerdey
qise kerdey

Kurmancî

bi cî anîn
lîztin (leyîztnîn)
maç kirin
qise kirin

sit dutis

gut ditey

şîr dotin

Dimilkî di : citi kerdiş / cite kerdene (D), eştiş teber / estene tever (D) bari kerdiş / bare kerdene (D), zurî kerdiş / zûrî kerdene (D), derg kerdiş / derg kerdene (D), va dayış (S) / vay dayış (B,P), girê dayış (girey dayış), merr kerdiş, goşî ronayış, sond wardış (P) / sond wendene (D).

b) Sifet + lêker - çend mîsalî :

Dimilkî

Hewramî

Kurmancî

berz biyayîş (berz beyîş)

berz biyay

bilind bûn

teyşan biyayîş

tajne biyay

tî bûn

wişk biyayîş (wuşk biyayîş)

wişk biyay

hişk bûn

Dimilkî di : derg kerdiş / derg kerdene (D), kilm biyayîş (S) / kirr biyayîş, pirr kerdiş / pirr kerdene (D), weş biyayîş / wese biyayne (D), lezi kerdiş / lerze kerdene(D), hîy biyayîş / hîy biyayene (D), vînd biyayene (D) / vîn biyayîş, xirabe biyayîş / xirave kerdene (D).

C – Lêkerê hevedudanîyê ki yew kelima di ray vata (tekrar kerda) û lêker ra viraziyênê. Çend mîsalî :

felqe-felqe kerdiş, vit-vit kerdiş, vîzzili-vîzzilî kerdiş, wîç-wîç kerdiş.

DIMILKÎ DI ÇEND XUSUSİYETÊ LÊKERANÊ HEVEDUDANÎYAN

Çend xususiyetê nîy lêkeran estê ki bala kê kaş kenê :

1 - Nîy lêkeran ra tayî, ca ra ca ma'na xo vurinenê (bedelenenê). Çend mîsalî :

Ca ra ca Dimilkî

Kurmancî

çarnayîş (P)

gerandin

çarnayîş (S), çarnayine (D)

zivirandin, vegerandin

wekerdiş (P)

hilkirin, hildan

wekerdiş (B), wekerdene (D)

vekirin

weşanayîş, weşonayîş (P)

weşandin, hejandin

weşonayîş (B)

hilweşandin

2 - Demewo ki nîy lêkerî anciyênenê (kaş benê) zî ca ra ca beyntar di ferq esto. Çend mîsalî :

Dimilkî	Hewramî	Kurmancî
<i>ronıştış / ronistene (D)</i>	<i>ere niştey</i>	<i>rûniştin</i>
<i>nerî : ez ronişto / ez nişto ro</i>	<i>niştere, niştawé (**)</i>	<i>ez rûniştim</i>
<i>maykî : ez ronişta / ez nişta ro</i>		
<i>nerî : ti ronişti / ti nişti ro</i>	<i>niştire</i>	<i>tu rûniştî</i>
<i>maykî : ti ronişta / ti nişta ro</i>	<i>niştire</i>	<i>tu rûniştî</i>
<i>nerî : ay (o) ronişto / we (yû) nişto ro</i>	<i>niştere, nişt</i>	<i>ew rûnişt</i>
<i>maykî : a (ya) ronişta / ya nişta ro</i>		
<i>ma ronişti / ma niştime ro</i>	<i>niştimere</i>	<i>em rûniştin</i>
<i>şima ronişti / sima nistî ro</i>	<i>niştidere</i>	<i>hun rûniştin</i>
<i>ê (yê) ronişte / yê nistî ro</i>	<i>niştêre, niştêwe</i>	<i>ew rûniştin</i>
<i>emîr : roge / ruweşi (B)</i>	<i>nişere</i>	<i>rûne</i>

Dimilkî	Hewramî
<i>wereznayış</i>	<i>wuriznay</i>
<i>emîr</i> <i>werizni, wurizne</i>	<i>wurpêzine</i>
<i>emîr</i> <i>wuriştiş, weriştî</i>	<i>hurestay, hurzay, wurzay (Nowsûd)</i>
<i>emîr</i> <i>warde, wurzi, urze ra</i>	<i>hurzde (hurezde), horze, hurze</i>

CA RA CA DIMILKÎ :

Dêrsim	Pîran	Kurmancî
<i>kotene ra dime (era dime kotene)</i>	<i>dimi kewtis</i>	<i>dû ketin (bi dû ketin)</i>
<i>kot ra dime, kewt era dime</i>	<i>dimi kewt</i>	<i>bi dû ket</i>
<i>rakerdene</i>	<i>rakerdiş</i>	<i>raxistin</i>
<i>emîr</i> <i>rake</i>	<i>raki (rake)</i>	<i>raxe</i>
<i>vînd biyayne</i>	<i>vîn biyayış</i>	<i>winda bûn</i>
<i>bi vînd</i>	<i>vînî bi, vînî bîy</i>	<i>winda bû</i>
<i>emîr</i> <i>vînd be</i>	<i>vînî bi</i>	<i>winda be</i>
Sîwerek	Pîran	Kurmancî
<i>lew pa dayış</i>	<i>lewi pa dayış</i>	<i>maç kirin</i>
<i>lew na pa</i>	<i>lewi pa day</i>	<i>maç kir</i>

<i>lew meni pa</i>	<i>lewi pa medi</i>	<i>maç neke, maç meke</i>
<i>akerdiş</i>	<i>akerdiş</i>	<i>vekirin</i>
<i>akerdo</i>	<i>akerdo, akerda (mayki)</i>	<i>vekirîye</i>
<i>piro dayış</i>	<i>piro dayış, dayış piro</i>	<i>lê xistin</i>
<i>piro da</i>	<i>da piro</i>	<i>lê xist</i>
<i>piro mede</i>	<i>medi piro</i>	<i>lê nexe (lê mexe)</i>
<i>ronistiş</i>	<i>ronistiş</i>	<i>rûniştin</i>
<i>ro menisi</i>	<i>meroşi</i>	<i>rûnene (nerûne)</i>

Bingol (Çebaxçur, Çewligî)

	Piran	Kurmancî
<i>abiyayış</i>	<i>abiyayış (abeyış)</i>	<i>vebûn</i>
<i>bi a</i>	<i>abi / abîy (mayki)</i>	<i>vebû</i>
<i>akerdiş</i>	<i>akerdiş</i>	<i>vekirin</i>
<i>a meki</i>	<i>me aki (m'aki)</i>	<i>veneke</i>
<i>a nékeno</i>	<i>nê akeno</i>	<i>venake</i>
<i>kerd a</i>	<i>akerd</i>	<i>vekir</i>
<i>dekolış</i>	<i>dekewtis</i>	<i>ketin nav ...</i>
<i>kot di</i>	<i>dekewt</i>	<i>ket nav ...</i>
<i>nékot di</i>	<i>denêkewt, nédekwet</i>	<i>neket nav ...</i>
<i>pure dayış</i>	<i>piro dayış, dayış piro</i>	<i>lê xistin</i>
<i>emir</i>	<i>bidi piro</i>	<i>lêxe</i>
	<i>bidi piro</i>	<i>lêxin</i>

MALMİSANIJ

- * (D) : Dêrsim (Tunceli)
- (B) : Bingol (Bingöl)
- (S) : Siwerek, Sêwregi (Siverek)
- (E) : Ezîrgan (Erzincan)
- (G) : Gel (Eğil)
- (P) : Pîran, Piro (Dicle)
- (Pa) : Pali (Palo)

** Christensen, Arthur-Benedictsen, Åge Meyer, les Dialectes D'Awroman et de Pawa, Kobenhavn, 1921, r : 45.

MacKenzie, D, N. The Dialect of Awroman (Hewraman-i Luhon), Kobenhavn, 1966.

Folklorê Kurdi ebe zarava dimilkî

Her çiyo ke wertê miletî de ebe vaten û qeseykerdene vajîno (edebiyat), kay beno, ebe bera pî û kalikan devam keno, ci ra folklor vajîno. Bera pî û kalikan kî hê be hê ama, resta pê. Naê ra gore folklorê Kurdi be xo, tarixê miletê Kurdi ano ra zan. Ebe vatena folkloristê Kurdi yê pîlî, yê Ordixanê Celîlî, «tarixê miletê Kurdi de teynîya folklorê Kurdi nêkoto ra destê dismîn û zorkeran, yîyê ke wasto ke Kurdanê mîrxasan ebe adir û asin binê bandira xo kerê» (2).

Tarixê Kurdi de her hadîseo sosyal, herv bo, pêrodayîsê aşiran bo, haskerdene bo, pêrodayîsê verva dismînan bo, pêro lawikan û şwaran û sanikan de yênenê ra zan, vajînê, qesey benê. Naye ra gore her hadîseo sosyal, qiz ra be pîl, zê ayney edebîyat de aseno. Na folklor û edebîyat de milet rind û qolae, rast û xeletîye, cwamerdêni û bêbextîye ebe usila şînat û estetikî ano têverver. Sanikan û destanan û meselan û vatena virênan de her tim na yêna ra zan. Edebîyatê qeseykerdene de her waxt pêguretena çiyê rind û rastî be yê heq û neqî ra yênenê vatene. Heto heq dayîma kuno ra hetê neqî ser, sono reseno mirodê xo. Pêrodayisê ke verva zulim û zorkariya xayinan û dismînan bena, folklorê Kurdi de ebe zarava Dimilkî zaf est ê. Pêrodayisê nianêni lawikan û sanikan de vajînê ke, miletê Kurdi tarixê xo de se kerdo se nêkerdo, se vato se nêvato, ci wasto, ci nêwasto pêro tede beno eskera. Miletê Kurdi tarixê xo de çitûrî seweta azadiya xo dismînê zalim û zorkarî de do pêro, folklor û edebîyatê Kurdi de beno arêze. Her çığaş ke folklorê


(1) Dimilkî ra, Zazakî kî vajîno. Tekstê ke ita wanine hetê Dersimî ra ê. Komentarbe fekê Dersim de telafuzê «C» û «Ç» y niya beno:

C + vengino qolind = (dz) ; cor (dzor) , cemed (dzemed)
C + vengino barî = (dz) ; cêr (dzér) , ciran (dziran)
Ç + vengino qolind = (ts) ; çum (tsim) , çare (tsara)
Ç + vengino barî = (tş) ; ci (tşl) , çêver (tşever)

(2) O. Celîl , C. Celîl ; *Mesele û metelokên Kurdi*; Zürich, Weşanên Ronahî, 1976, pere 1

Kurdî ebe zarava (lehça) Dimilkî (Zazakî) xêlê zengîn o, hata nika keşî bine ra arê nêkerdo, pêser nêardo. Kolonîperestanê Tirkî nêverdo ke miletê Kurdî çimanê xo wekero, xo ser urzo. Yîne her çığaş ke miletê Kurdî kerd binê bandira xo, hama bese nêkerd ke zan û kultur û folklorê ey kî werte ra wedarê. Dismêno xayin nae rind zaneno ke, ebe siyasetê asîmîlasyonî pesew û peroz gureêno ke folklora ma kî ma dest ra bicêro. Yîne xêlê zerar da be kulturê Kurdî, xezna kulturê dey ra taê telef kerd, kerd vindî. Coka o ke, ma gune qiymetê folklorê xo, nîya ra tepîya dayîna rind bizanîme. Her çiyê folklorî yo ke kuno ra ma dest, top kerîme, biniwsîme, vindbîyaêne ra bixelesnîme.

Zarava Dimilkî de hata nika edebîyatê qeseykerdene fek ra be fek, gos ra be gos vajîyo amo. Na edebîyatê qeseykerdene de sanikî, lawikî, mesele û mertalî, vatenê virênan be vatenê bînî ra ebe tore tore vajînê.



Zarava Dimilkî
Zarava Sorankî

Zaravê Bînî

Zarava Kirmancî
Zarava Gorankî

(ji M. M. Van Bruinessen, Agha, Shaikh and State, rûpel 31)

I - SANIKÎ

Tore tore sanikî est ê. Tayê sanikan de ïsan est o, tayîne de kî heywanî, teyr û turî teder ê. Sanikê ïsanan, meselê ke amê vêrdê ra, yîne ra pêda bîyê amê. Sanikanê nianênan de leto zêde, milet çitûrî verva dismenê teberî lez keno, tey ceng keno, û yêno ra zan. Hadîseê nîyanêni amê, vêrdê ra, zamanê ra tepîya bîyê sanikî mendê. Na sanikan de çêrênî û cwamerdiye, cînîenî û cwanikîye, haskerdena cînîan, haskerdena lazî be ma û pî ra, haskerdena hurdî biraan, haskerdena welat û miletî wes vajîna, ïsanî sero zaf tesîr kena, tede kar kena. Zu hetê sanike nîyar o. Heto bin de kî dismêno zalim û zulimkar be xayinan ra vînînê. Sanika Şevdîn Begî, yê Dewrêş Begî, yê Kulikî nianênan ra say benê.

Xelê sanikê henêni kî est ê ke, tede dêv be ïsanî ra vejînê. ïsan, heto rind, dêv kî heto xiravin temsîl keno.

Sanikanê heywanan de, bize, verg, hes, lûye be kerzik û qirnikî ra yêneneydan.

Sanikanê ïsanî ra tayê kî ïsanî fînê huyayîs, ebe û tore gosedaran xecellenê. Nianênan ra sanikê Keçelekî zaf wes ê.

Keçelek sanike de dayîma heto heq, heto rast temsîl keno. Ü, hêfê xo hetê neq û xiravinî ra ebe cambazêni û anazêni, ebe fêndî, ebe xapnayîs cêno, kuno ra ser. Hetê neqî fîno halo henê ke, gosedarî zaf pê huynê, ero ci wes yêno, benê sa.

Sanikî, leto zêde seweta teviäkerdena domonan zaf muhim ê. Ronisten û raustena domonan ebe vasita sanikan asil bena. Sanikî, rastî û xeletîye sero, rind û qolae sero, bomêni û baqilêni sero hem kî haskerden û zerevêsaenî sero derse danê ïsanî.

TIXTIXAN Û LINGMIRCAN

Bize ve Kole ra benê lengî, malî ra vişînê. Bize Kole ra vana : « Kolê, ala bê mîja xo bikeme, mîja kamî ke kef dana, a sona resena malî. » « Heya ! » vana « bizê bê.. ». Mîja bize ke kef dana, sona resena malî, kole hurendîa xo de manena. Kole se kero se nêkero, sona koyê jê koyê Jêle ra çerena. Waxtê ra tepîya zêna, di bijekunê xo ana. Na, bijekunê xo ana, cayê kena eskeft, sero çêver nana pa. Waxto ke sona tever, bijekunê xo temey kena vana.

*Tixtixano, lingmircano
da heyran o, ba qirvan o
ez son ko ra çerenu
ھۆی کەم و کوری سیاسی و نیزا میوه تىك چوو کە جىگاى باس
کردنی ئىرە نیه .

چىزۆکى " نان و فیشەک " کە نۇوسەدىكى شۇرۇشكىرى كورد
نۇوسېيىھەتى دەسکردىكى جوانى ئەددەبى ئەو سالانەی کوردەدە كە
با سى چۆنیەتى پىۋەندى " پىشەمەرگە " و خەلکى ھەۋا رى کوردەوارى
ئەکات . له لايەكەدە با سى چۆنیەتى فتنەسى (جا سووسى) ئەو
چەلکا و خۇرە خىوّفرۇشا نە ئەكە كە چلۇن بە تىكرا يى مافى دەدە بەگ
و حکومەتى زۆردا ران ئەپارىزىن وە چلۇن بىرى كەس لەنە و كۆمەلدا
ھەن كە " له ھەچ لايەكەدە باي بى شەن ئەكەن " سەردەملىك ئەبن
بە شۇرۇشكىرى لە بەر ئەوھە با وە ، سەردەملىك ئەبن بە لايىكىرى
حکومەتى زالىم و خويىخور و له ئەنجا مدا ھەو سەر شۇرۇرى و
رېسوايىيان بۇ ئەمېنېتەوە گەرچى ما وھە كىش بە روالىتەت
سەركەوتتوو ئەبن و دەسەلاتدار .

ئەم چىرۇكە کە با سى ئەوھە ئەكە كە چلۇن " پىشەمەرگەي "
خەلکى لە گەل زەممەتكىشەكان ئەحەواپىتەوە و بە دەرد و مەرگى
ئەزانى - و ئەينىوېنى كە بۇچى گىانى خۆى كردوھ بە قەلغانى
خەلکى ھەۋار و گەر ئەو بە راستى بى خەلکى چلۇن لە پىشەمەرگەي
خۆى پشتowanى ئەكە . ئەوھە لە کوردستانى عىراق بۇ ما وھى ١٨ساں
خەلکى لە گەل پىشەمەرگە يار كردوھ و لە سالانى ٤٧-٤٦ دا لە
کوردستانى ئىرانا يىش ھەر وەھا ، بەلگەيەكى باشى مىژۇوېيە بۇ
ئەم كارەساتە .

ئەم چىرۇكە لە سەردەمى توندترىن تەنگانەدا لە کورد -
ستانى ئىرانا نۇوسرا وە ، سەردەملىك کە خەلکىيان رەش بىگىر ئەكەرد
و دەيان تىكۈشەرى كوردىيان لە سىدراھ ئەدا يان تىرە بارانيان
ئەكەرد ، ھەر بۇيە لەو كاتەدا زۆر بە كەمى بلاوكرايىمەوە و
تەنانەتھەمۇوى ھەر بە دەسەنۈس بوجە كە بۇ خۆى کەم و کورى
ئەو كەسانە كە خەويىكى كارەسا تىكى وەھا يى بۈون بە جوانى
تىكدا ئاشكرا يە .

ئىمە بە ئەركى سەر شانى خۇمانى ئەزانىن كە ئەم جۇرمە
نۇوسرا وانە بلاو كەينەوە تاكو خزمەتىك بە ئەددەبى نويى كوردى
بىكەين و بىخەين بەر چا وي خەلک .

میژووی گهلى کورد شهوهی ده رخستوه که چينى " گريلدرا و بـه ئيمپيريا ليزمى " گهلى سمردهستى ئەو ولاتا نەي که بهشىك لـه كوردىستانىان لەزىر دەسدا يە ، بـه بـى پـىوهندى توند و تـىز لـه گـەلـلـى چـىنى دـەـرـەـبـەـگـ و كـۆـنـەـپـەـرـەـسـتـىـ كـورـدـداـ و درـوـسـتـكـرـدـنـىـ دـەـسـتـەـيـەـكـ چـلـکـاـ وـخـۇـرـ و جـاشـنـەـيـاـنـ تـواـنـىـوـهـ وـنـاـتـواـنـ خـۇـيـاـنـ دـاـسـهـپـىـئـىـنـ بـەـسـەـرـ خـەـلـکـىـ هـەـزـارـ وـچـەـوـسـاـ وـهـىـ كـورـدـداـ .

دوـزـمنـاـنـىـ زـەـحـمـەـتـكـىـشـانـ وـبـهـ تـايـبـەـتـ جـوـتـيـاـ رـاـنـىـ كـورـدـسـتـانـ هـەـوـلـىـانـ دـاـوـهـ کـهـ لـهـ نـاـ وـ دـەـسـتـ وـ پـىـوهـنـدـەـكـانـىـ خـۇـيـاـنـ لـهـ دـىـ وـ شـاـرـەـكـانـىـ كـورـدـسـتـانـداـ هـەـنـدـىـ كـەـسـ ھـەـلـ خـەـلـەـتـىـنـ وـ بـىـانـ كـىـنـ شـاـ فـتـتـنـەـيـىـيـاـنـ بـوـ بـكـەـنـ وـ ئـەـواـنـىـشـ ئـەـوـهـ بـكـەـنـهـ هـۆـىـ گـەـوـرـەـيـىـ وـ ذـلـ كـرـدـنـىـ خـۇـيـاـنـ لـهـ حـەـنـاـيـ دـەـوـلـەـتـاـ وـهـ بـوـ زـوـلـمـ وـ زـۆـرـ كـرـدـنـ لـهـ خـەـلـكـ .

لـهـ چـەـنـ سـالـىـ رـاـبـوـوـدـوـوـدـاـ وـبـهـ تـايـبـەـتـ لـهـ سـالـانـىـ دـەـسـ پـىـ كـرـدـنـىـ جـوـوـلـانـهـوـهـ چـەـكـداـرـانـهـىـ كـورـدـسـتـانـىـ عـىـراـقـهـوـهـ سـالـاـوىـ "ـ پـىـشـمـەـرـگـهـ "ـ نـاـوـىـكـىـ پـىـرـ بـهـ نـرـخـ وـ خـۇـشـوـيـسـتـ بـوـهـ .ـ لـهـ دـلـىـ خـەـلـكـىـ هـەـزـاـرـىـ كـورـدـهـوـارـىـاـ .ـ ئـەـوـ نـاـوـهـ جـوـانـهـ هـاـنـدـەـرـ بـوـهـ بـوـ خـەـلـكـىـ چـەـوـسـاـ وـ دـلـەـ لـەـرـزـىـنـ بـوـهـ بـوـ چـىـنىـ چـەـوـسـىـنـدـرـ .ـ هـەـرـ كـاتـىـكـ لـهـ قـوـزـبـىـنـىـكـىـ كـورـدـسـتـانـهـوـهـ جـوـوـلـانـهـوـهـيـهـكـىـ چـەـكـداـرـانـهـ بـوـوبـىـتـ خـەـلـكـىـ كـورـدـ بـهـ گـەـرمـ وـ گـۈـرـىـ "ـ نـاـنـ "ـ يـاـنـ بـىـ دـاـوـهـ وـ يـاـرـمـەـتـيـاـنـ بـوـ بـرـدـوـهـ ،ـ "ـ پـىـشـمـەـرـگـهـ "ـ شـلـهـ "ـ فـىـشـەـكـىـ "ـ خـۆـىـ بـوـ بـهـرـەـنـگـارـىـ لـهـ مـاـفـىـ رـەـهـوـاـيـ خـەـلـكـەـيـ دـەـسـ كـورـتـىـ نـهـكـرـدـوـهـ .ـ چـونـكـوـ خـەـلـكـىـ كـورـدـهـوـارـىـ پـىـشـمـەـرـگـەـيـ خـۇـيـاـنـ خـۇـشـوـيـسـتـوـهـ وـ خـۇـشـيـاـنـ ئـەـوـىـ .ـ هـەـرـ بـوـيـهـ يـەـكـىـ لـهـ هـۆـنـهـرـاـنـىـ كـورـدـ شـەـلـىـ :ـ

سـلـاوـىـ گـەـرمـىـ دـلـىـ پـىـرـ هـۆـمـىـدـىـ مـەـتـ پـىـشـمـەـكـەـشـ
پـلـنـگـىـ هـەـرـدىـ وـلـاتـ !ـ

ئـەـيـ جـەـواـبـىـ پـىـشـمـەـرـگـهـ !ـ

لـهـ دـەـورـىـ دـەـسـتـ وـ تـفـەـنـگـتـ گـەـرـىـمـ
كـەـ رـۆـزـىـ خـەـبـاتـ
لـهـ عـاـسـتـىـ هـەـلـمـەـتـىـ تـىـزـتـ
جـ نـاـگـرىـ بـەـرـگـهـ !ـ

بـزوـوتـنـهـوـهـ سـالـهـكـانـىـ ١٣٤٦ـ٤٧ـ لـهـ كـورـدـسـتـانـ ئـىـرانـ
بـەـشـىـكـهـ لـهـ بـزوـوتـنـهـوـهـ مـىـژـوـوـبـىـ گـەـلـىـ كـورـدـ كـهـ بـهـ تـهـواـيـ كـمـ وـ

نا وه را استی گرتوهه بهر. تیکوشه رانی کورد زور ده میکه بُو ئه و
مه بدهسته تی ئه کوشن ، به لام هه مهو کاتیک ئه م تیکوشانه گه رچی
به شیوهی رامیاری (سیاسی) ش بوویی به بی گرتن و لیدان و
کوشتن چهن که سیک ته وا و نه بوه . دوخی تایبته کوردستان و
دواکنه و توویی گه لی کورد له با ری کومه لایه تی و رامیاری و
ئا بووریه وه له لایه ک وه زه بروزه نگی ده ره به گایه تی و کونه
په رستی له کوردستان له لایه کی توهوه ، ئه وهی چه سپا ندوه که
بزووته وهی رزگا ری خوازی گه لی کورد و به تایبتهت و هده س
هینانی ما فی چینه چه وسا وه کانی ، وه له ئه نجا مدا و هدی هینانی
ما فی چاره نووسی ئه م گله به بی بوونی هیزیکی چه کداری خلکی
زه حمه تکیش نابی و ناکریت . لمبه ر ئه وهی که چه وسینه رو نا خوی
کوردستان نه ک هه ر خوی چه کداره و به چه کداری خوی سه پا ندوه
بده سه ر خلکی ولاتی کورده وا ریدا ، به لکو هه میشه له لایه ن چینی
ده سه لاتدا ری گه لی سه رده ستی ئه و لاتانه که کوردی تیا یه ، به
هیزی نیزا می پشتیوانی لی کراوه ، وه ئیستاش هه ر بهد وه واه .

۳- پیش ئیسلاحي زراعی کویخا سجیل = موختار له لایه ن ٹاغا وه
پیشیار و له لایه ن ڑاندا مرییه وه په سند ده کرا ، پاش ئیسلاحي
زراعی له لایه ن ئه نجومه نی گوندہ کانه وه که له ڈیر ده سه لاتی
جو تیاره خا وه ن مولکه کاندا بwoo هه لدہ بزیردرا و "ساواک" برپاری
له سه ر ده دا .

۴- گه لیک میرزا و خویندہ واری گوندہ کان له پیش ئیسلاحي زراعی
له دیوه خانی ٹاغا دا ده زیان و کافه زیان بُو ده نووسی و ده رسیان
به منداله کانی ده کوت و پاش ئیسلاحي زراعی به پیشی په سندی
حکومهت بون به نووسه ر و میوزاری ئه نجومه نی گوندہ کان .

۵- گه لیک له رونا کبیرانی شورشگیر بُو دریزه دا ن به خه بات
و خو شاردنده وه له حکومهت ده سوونه فهقی و ده چوونه حوجرهی
مزگه و ته کان به بیانووی خویندی عه ره بی و زانستی ئاییشی وه وه
کا رتی ئه ندا مهتی و کا وتی یا رمه تیان له ناو جه ما وه ری زه حمه
تکیشی گوندہ کاندا بلاو ده کرده وه و ده بیان ثوانی به نسا وی
خویندنه وه به ئاسانی بچن بُو کوردستانی عیراق و بگه رینه وه .

دهن هیئانی مافی چاره نووسی ئە و گەلە لە مىزە رۆزە لاتى

بە شىوه يەكى ھەرە ساکا رى زەوانى نا وچى موكريان نووسراوه تا پىشمه رگە كان بتوانن لە بنكەكانى خۇيان و لە مزگەوتى گوندە كان بە دەنگ بىخويىنە و زە حەمە تكىشانى كوردىستان بە باشى تىيى بگەن . بزووتنە وە ٦٨-٦٧ دەنگانە وە ئەتكەدا رانى سەرەتاي واقىعى گۇپانىكى بىنەرەتى بولە كە لەنا و كۆمەللى كوردەوارى و لە پەيوەندى نېوان چىنەكاندا پىكەتلىبوو، سەرەتا يەك كە سەرەنجام بە درېۋاىى دە سال و تا كاتى رووخانى رۈزمى شا وزەى ماددى و ورەى زەنلى دا . بە كرىكەران و زە حەمە تكىشانى كوردىستان كە بە يارمەتى روونا كېيرانى شورشىڭ يېرىزە كانى خۇيان بىتەو كەن ، نويىندەرانى سىاسى و تەبەقاتى خۇيان بخولقىيەن و لە خەباتى رىگا رىخوازانى گەلنى كورددادا بە كرددە و بە با وەر دا واي سەركەدا يەتى بکەن . " نان و فيشەك " كە ھەر لە جەنگە زوودا وە كەدا نووسراوه باسى پەيدا بۇونى پىشمه رگە و بەرپا بۇونى ھېزىكى جاش بە نا وى " موقا وە مەتى مىللەي " لە لايەن ڙاندا مرىيە و دەكا و ھەلۇيىتى ھەركام لە چىنەكانى كۆمەل دەردەخا كە زابوردوو سىاسى و شەخسىيەتىشيان بە پىيى گۇپانى بارى زيان و بەرەم هىئانىيان دەگۈرى : يَا گەشە دەكا و دەخەملى با دەگە رېتە و دەگەنلى ؟

چەند روون كردنە وە يەك :

۱- ئىستا كە دواي شازىدە سال نان و فيشەك چاپ دەكترى دە توائىم و دەمەوى دەستىكى تى بەرم ، چە لە كاكلۇ و چە لە تىكۈلىدا، بەللام پىيم وا يە ئەم كارە نووسراوه كە لە " بەلگەيەكى مىزۇوېي بۇ دىا رى كردى كە دە خاتە رۇو " دەگۈرى بە چىرۇكىكى ئاسايى ، ھەر بۇيەش بە تەواوى خۇم پاراست .

۲- لە سالى ١٩٦٣ ئىسلامى زراعى لە ئېران كراوه ، جوتىياراشى " خاوهن زەوى " بۇونە " خاوهن مولك " و جەما وەرى بىي زەوى لە گوندە كان كە پىيان دەكوترا رەشا يى = قەرە = خۇش نشىن ئاچار يَا بۇونە پالە و " سەپانى " خاوهن مولكە تازەكان و دەستىيان دا يە ورددە كارى پىشەمىي نا و گوند يَا بۇ كرىكەرە چۈونە شارە گەزە كان .



* نان و فیشک *

سەلاحوددینی سوھتەدى

سەرەتا :

بلىيسيدى ئاگرى خەباتى رۆگارى خوازى گەلى كورد بۇ بە

* ئەم چېرۇك لە سالى ۱۹۶۷ نووسرا وە و بە نەيىنى و دەست بە دەست بلاوبۇتەوە . لە سالى ۱۹۶۸ لە زىندانى جەلدىان كە زىاتر لە يەكەزار تىكۈشەرى كوردى تىپدا پە دىل گىرا بۇ نووسەرىيش و گەلىك كەسى دىكەشى لەسەر ئەشكەنجه كرا و "ساواك" جە لە شاوهكەي هىچ راستىيەكى دىكەي بۇ دەرنەكەوت . لە سالى ۱۹۷۹ لە لايەن دەزگا يەكى انتشاراتىيەوە كە لە شارى "سە" بە يادى شازنا وي شەھىدى نىشتمانپەرەمەر و پىشكە و تىخوازى كوردىستان كاك سەعىدى موعىنىيەوە شاوى نرابۇو "خانە" بۇ چاپ ئامادە كرا و لە لايەن شۇرۇشكىرى گەورەي گەلى كورد شەھىدى ئازا و زانا "كاك فوئاد" وە پىشكەكى بۇ نووسرا ، بەلام فەرمانى پەلامارى كوردىستان و كوشتارى گەلى كورد كە لە تاوه راستى مانگى ئووتى ئە سالىدا لە لايەن خومەينىيەوە دەرچوو ئە مجاresh "نان و فيشەك" ئى نارەوە نا و كورپى رەفيقان و كۆبۈونەوەي شۇرۇشكىران و نەيەيشت چاوى لە جىهانى چاپەمنىدا بېشكۈي . ئە نو سخەيە پاش شەھىدبوونى گەلىك لە لاوه تىكۈشەركانى "انتشاراتى خانە" كەوتەوە لاي خۆم و هەر رەوەك خۆم "چەند شاران گەرا چەند خاگە سارى ، بۇو بە شوانەكەي ھەق نادىارى ؟" .

"نان و فيشەك" پىشكەش بە قارەمانى شۇرۇشە چەكدا رانەكەمى ۶۷-۶۸ ئى كوردىستانى ئىرا ن شەھىدى بەنا و بانگ كاك سايلى شەرىفزا دە كراوە و هەر لە كاتى زيانىدا و لەسەردە مى شەرەكائىدا بىۋى ناردرابە . ←

دلنیا ییم ئەکرده وە
لە کۈپى دۆست و خزمانا
بەلام ھېشتا لە لای ئىمە
نووسىنى وەك نووسىنى تۇ ،
لەگەلىشىۋىنى كوردىستان
تەنها باسى كوردى تىا بىى
قا چا غە وەك تلىاڭ و بەنگ
پەنجاي پى ئەخرييە زىندا ن
ئىمەي كوردى لە ماف بىيەش
لە ووولاتى كوردىستان
گىرۋەدە دا گىرگەرى واين
ھەم خانى ناخاندانا نە
ھەم ئەلقە لە گويى و مل كەچە
بو ئىستىعما ر و بىڭانە

یا دی ئەو رۆژانەی وەک مەل
 بىٽرس ئەمدا لە شەقەی باڭ
 دۆل و نشىو و دەربەندم
 دار و بەردى ئەپشىنى
 تا دارستانى لاقەدپاڭ
 بەلام ئىيىستە ئەو ووللاتە
 ھىننە شىّوا و و يرلانە
 ئەو شتەيى كە زۆر ھەرزانە
 تەنها ھەر نرخى ئىنسانە
 ئەگەرجى تۆش لە لاويىتا
 وەک زۆر بەر رۆلەيى داغستان
 تا مى ئەشكەنجهت چىشتىبوو
 نا لادىن دبۈوت لە ڇىير بارى
 بىڭار و ئەرك و زولمى (خان)
 بەلام ئىيىستە بە كا مى دل
 وەكى مەل لەم چىل بۇ ئەو چىل
 خۇت تىئىر ئەكەدى لە شىلەيى گۆل
 بە بىٽرسى درىك و چىل
 ھەموو بەرھەم و نۇو سىنت
 شىّوه و شەقلى داغستانى
 سپىوه يە وەك ما ركەي كارگە
 باسى ھەر روودا و يك سكەي
 ئەگەر پىيەتە و بۇ (تسا دا)
 بە خۇت بە كۈلى دىيا رى
 نا و ھەمانە و خورج و بارگە
 وەفا دارى بۇ نىشتىما
 سەر بلەندى و روو سوورى يە
 كە متەرخە مى و لە يادچىونى
 شەرمەزا رى و شۇورە يىيە

خۇزگە وەك تۇ خواپىدا و
 بەختە وەر و سەربەست ئەبۈوم
 لە ڇىير ئالا نىشتىما ،
 بىٽرسى زۆر دار ، پشتىنى

به دوايا ئەگەرى و ويلى
كتىبى داغستانىكەت
ھەموو ووشە و رستەيەكى
خونچەگولى نا و چەمەنە
نەك گولى ساختەي كاغەزى
بە دىيمەن جوانى بى بۇنى
دروسكرا و نارەسەنە
گولى بۇن خوشى نا و باغانى
دا غستانە دلگىرەكەت
كارىكى واى كرد لە گيانم
وا سەرخوش و مەستى كىردىم
بە جارىك ھەستى ھەۋانم
وەك منداڭ كەوتىم گاگۇلکى
پەلم كوتا بۇ چەن دېرى
تا نەختىك داي مەركىيەنەمە
گولى جوشخوا رەدووي گريانم
دېرى مەبەست لىيم ياخىبسو
نەگەيە فرييائى ها وار و
ناالەي دلى پى لە ڙانم
تاي خەيال و ئالۇزكا و بۇو
ھەرچەندىم كرد نەكرا يەوه
نە بە پەنجهو نە بە دانم
پى بە دل ئا واتەخوا زام
چەپكىك گولى بۇن خوش و جوان
لە با غچەي بەرھە مت بچىم ،
بىيخەم نا و گولدا نەوه
ھەرچەندىم كرد ، دلەم نەھات
زۇر ترسام لەوهى بىزاكىت
بە دەس چىنگ و پەلى ناشىي
وەكى منى نەزانەوه
ھەموو ووشە و رستەيەكى
دا غستانە ئا زىزەكەت
زا مى كۈنى كولانەمە
يا دى دۆزىانى جارانى
منداڭى بىر ھىنا مەوه

رازی ده روونک...

پیشکهش به ره سوولی حمزمه تؤفی داغستانی بئی

هاوار

کاک ره سوولی حمزمه تؤفی
 شاعیری گوندی (تسادا) ای
 زمان ئاقاری داغستان
 هەرچەن بە دىمەن لىّم دوورى
 بەلام بە گيانلىتىزىك
 وەك بىرسىيەك چا و بېرىتە
 نانەوايدك بۇ لمەتىن نان
 بىمبۇرە وا رەپ و رەوان
 وەك شوانىك با نىڭتەكەم
 هەروەك شوانىكى شا و ران
 بەدا خەوه دەنگىھۆزەم
 ناگاتە گۈيەت لەبەر دوورى
 تا بە تەواوى تىپگەي
 لە رازى دەرەوونى منى
 ئاوارە و دوور لە نىشتىمان
 منىش وەك تو شاخا و يم
 لە گوندىكى نا وچەي سىوهيل
 لە شارباژىرى كوردستان
 چيا هەرچەند پە لە پىچى
 تۈولەرىگەي نا و دەربەند و
 لووتکەي لە ئاسمان چەقا وە
 بەلام ژيان و هەلكردى
 راست و رەوان و بئى پىچ و
 بئى فىل و بئى چا و راوه
 بىنۋىيە وانووكى پىنۇوسى
 چىا يى راست و بئى فىلە
 وەك دىوانە كەشكۈل بەدەس
 مىملى ووشەي خا وينە و

دا ده نیشم ... هزر ده که م .
سه رنچ ده ده م .
دا ده نیشم ... سه رم ده بیته هه وریکی که لدگت و
بمسدر که لی په مه بیدا
دا ده چوپری ،
له ته ک زه ردھی ئیوا ره یا تیکه ل ده بی ...

سُؤْلَةَ نَتَوْنَا - سَوِيدٌ

باکت نه بwoo ..

نه تده زانی مه لبندی ژین ههتا کوئیه ..
ده رکهی شاری مه رگ کا مهیه ،
شهوو روئت لهلا یهک بوون ..

له روئخی پهنجه رهی شهوا داده نیشم .
له تونیلی شه وگا ره وه
ده روانمه ترووسکه یهک روونا کای و
نیوی ده نیم نیشتمن .
ده روانمه ئه ستیره یهک
له ئه سوهه ری تونیلی شهورا دیاره و
نیوی ده نیم کوردستان .
ئاخ کوردستان ،

لانکی ئیش و سهربه رزی و ئه فینداری ،
ولاتی خوینی خوینا وی ،
خاکی بريینی بريیندار ،
نیشتمن خه می خه مبار .

له روئخی پهنجه رهی شهوا داده نیشم ،
ده روانمه تولله ریگهی تاریکستان ،
به شکه م کزهی با یهک بیت و
بوون و بدهرا مهی تؤی پی بی ..
به شکه م ئه مشه و فریشته یهک
ویل بووبیت و ریی که ویسته ئدم مه لبنده و
چرا و گیکی سپی بی بی ،

ترووسکه کهی له ترووسکه
ئه ستیرهی ئاسما نی ولاتی من بچی ..
خهون ده بینم ؛

خوئگه ئه مشه و با رانیکی وا ده با ری
هه رچی داره چرؤی ده کرد ،
چی خونچه یه ده کرا یه وه ...
هه موو بالدار فیر ده بوون چون
به شه وو روئ بچریکینن ...
به لکوو ئه ودهم له نیو دلی
ته نهای منیشا خونچه یهک
پشکووتبا .

دهشت و ده رو دوّل او دوّل و کون به کونی
 ئەم سەرده مە دەپشکتى ...
 ئاخۇ ئىستا لە کامە شار ، لە کامە گوند ،
 يەكىكىيان وەگىر ھىنابى و
 وەبەر قەمچى و دارى بىدەن ،
 هەموو ويڭرا كەوتتىتنە ويّزەي گىانى و
 لىيى نەگەرپىن ، هەتا ھەلا ھەللى دەكەن ...
 ئاخۇ ئىستا ، لەم دەمدا ،
 لە کامە مال ، لە کامە ژۇور ، لەسەر کام نوين ،
 شۇخە كىيىن لاشەي گولپەنگى خۆى دەكا
 بە سىۋىك و دەيختە بەر دەستى دىلدارە لاوهكەي ...
 ئاخۇ لە كوى ، ئىستا ، يەكى
 (يەكىكى بىنَا وى ون بۇو) ...
 رىل دەرناكا ،
 كەسيش نى يە ئاگاى لې بى و
 دەنگى وە ئاسما نىشىن ناگا ...

بىرت وەكۈر رەوە مەلىكى ئاوارە و سەرەھلگەرتوو
 يالەم يال و ئەم دارو ئەم دار دەكات و
 ها ئىستا ، ها تا ويڭى دى
 لەسەر دارتەلەلەك نىشته وە
 لە جرييە و جووكە كەوت و
 پەنايى برده بەرخەونتىكى دوورو درېزى شەوانە ...

سەرچ دەدەيت .
 (لە دەرەروونى بىرەكانت ورد بەرەوە) ،
 ورد بۇويتە وە .
 ئەم دەم ھىشتا ئا سۆي خەون و ھيواكانت
 پەمەيى بۇو ،
 رادىكال بۇويت ،
 حەزەكانت رادىكال بۇون .
 پېتىدەنايە نىيۇ ھەرىمى مىردىن و خوين ،
 كۆچەرەل بۇوي
 لە سنۇورى نىوان وەرزۇ وەرزىكى دى

گەرەنە وەيھەك

فەرھاد شاکەلى

كە ئىۋاران روونا كا بى
لە پەنجەرەي ژۇورى مەست و خەمبا رتەوە
دەچىتە دەر ...

دادەنىشىت ، دەرۋانىتە شۇوشەي لىلْ و تەمداگرتۇو ،

دەنك دەنك

دلىپە باران دە ژمېرى
دەدا لە شۇوشە پەنجەرەي مەست و خەميا ر .
چا و ھەلّدەخەي ،

ئاسمان بۇتە چارۆكە يىكى رەش و مۇر ،
جىڭە گوللىكى تىا نىيە ، سۆزى دلت
دا گىرسىن .

چا و گىر دەدھىي ، زەوي بۇتە دەسمالىكى
سوورى خويىن رەنگ
لە چمگىكىيا جىڭى دلى تۇ نا بىتەوە .

باش دەزانى و لە لات روونە
ئەم ئىوارە خەمەيىنەرە
چۈن شەۋىكى بەدوا وەيە .

باش دەزانى ئەمشەو ھەرجى خەونت ھەيە
بە قەنارەي ئەم شارەدا

شۇر دەبنەوە و
ھەرجى تاسەو حەزەت ھەيە ، دەبىي وەكۈو
پەلاسە كۈن

لەسىر دىيوارى پېشا نگە و مۆزەخانە

ھەللىيان بەخدى

با ھەتا وي

سەرددە مەكانى پېش مىژۇو لېيان بدا ،

وشك بەنەوە ..

سەرنج دەدەي ..

بە دووربىنى بىرگەردە وەت

له فکری وەکوو بىهكى رەسمى نىّوان نەتهوان . سنور و حەد و سەدى ئە و فکرە ھېشتاش لە قازانچى بەرزى شۇرىشى پرۆلىتارىا يىنىونەتە وە يىدا خۆي دەدىتە وە .

ئە و نۇوسىرە ما ركسىستا نەي باسى ناسىيونالىزم دەكەن بە غالىبە وا بىردىكەنەوە كە كاشىك ئەوان ئەم دىياردەيە لە بارى ئا بۇورىدا شىكەنەوە ئىتىر ئەركىان تەواو بۇوه . بەلام لە واس提دا ئەم دىياردەيە هەر بە شىكردىنەوەي ئا بۇورى لىك ئادرىتەوە . بەلام ئەدەبىاتى ما ركسىستى دەربارەي ناسىيونالىزم خۆي لە قەرەي ھەموو قوتا بخانەيەكى دىكەي فکرى لە سەروبەندى ئىمەدا دەدا ، لەبەر وردبۇونى لىكدا نەوەي ، لەبەر بەربلاۋى و ھەممە لايەنە بۇونى ، و لەبەر بايدىخى سىستېمى سەرەتا يى بۇچۇشى . ئەگەر ما ركسىزەم ھەموو گرى و قورتىكى بەر لە كاتى سەرەھەلدانىيەن ھەلگەنەھىينا وە ئەممە ئابىتە ھۆي شەرم و بەخۆدا شەنەنەوەي . رووخان يان مانەوە سىستېمىكى تىۋىرىك لەسەر بنا و انى دۆگمى را بىردوو نىيە .

بەلکوو ما نەوەي ئە و سىستېمە بەستراوهەتەوە بە زەرفىيەت و چىكىلدانە بۇ بەگۈزدا چوون و بە پىرە وەچۈشى كىشە و گىرى و قورتى تازەي كە سەرەھەلدىن و وەدىا ر دەكەن . و بە ھۆي ئا مادەكىدىن و دۆزىنەوەي زىيى جىيەجى كەنەنەن بە ئا وايەكى بەكەلك . لەم مانا يىدا ما ركسىزەم و مىتۆدى بۇچۇونى دىاليكتىكى بە شىۋىيەكى دەولەمەندانە ما وەتەوە و خۆي دا مەزراندۇوە . قىسە لەسەر ئەوە نىيە كە داخوا ئەوان دەزگا و ئىرادرە ئەوە يان هەيە كە ھەلەكان ساغ كەنەوە ؟ گرنگىي قوتا بخانەمە ما ركسىستى و ئىستىعادى بۇ لىكدا نەوەي دروستى ما ركسىستى ئەم گرى هەرە گەورەيە واتە ناسىيونالىزم بىرىتەوە بېتىتە ھۆيەك بۇ خزمەت بە ئا مانجى بە پىت و بەكەلك لە بات ئەوەوە كە بەشەرىيەت تىك و پىك بىدا .

تا ئه و جىگا يەى كە گدرا با وە سەر ولاتانى كاپيتالىستى نزىك بۇونەوە . دروشمى شكانى نىشتمانى با ب و باپیران لەلايىھەن لېنىيەنە و ناكرىيە بە هېچ جۇرېكى تر لىك بىدرىتەوە ؛ ئە و دروشەم " نىھىلىزمى نەتەوايدتى " نەبۇو، بەلكۇو باسى زەمان و شوينىكى تا يېدتى دەكەد و خزمەتى بە ئامانجىكى زۆر گرنگ كەردبۇو ئەۋىش ئە و بۇو كە جىاوازىي نىّوان نىشتمان پەرەستانى راستەقىنە و زەرە نىشتمان پەرەستان توند و تىئەتر بىئى و چاكتەر لىك بىكەنەوە .

له راستیدا جیگی سه رسپور مانه که لهم زه مینه یهدا و ههدا
وهها له بهشی دیشدا مارکسیزم گهره کسه فه ریکی وهها دریزی
کردمبا بتو دیتنه وهی ئاما نجی کومدیلیکی بئی چینی سه رووی نه ته وه .
وهکی رابه رانی یه که تی شوروه وی که خویان له ههلویستیکی وادا
دی که مه جبور بوون ده کرده وهدا پی له سر پیویستی نابه رابه دی
داهات له دوای شورشدا دا بکرن ، وهکوو ریگای هه ره راسته ورها است
به ره و کومونیزم ، جا بتویه هه ره عهینی ئه و رابه رانه مه جبور
بوون نرخی پیویستیش بدهن به ناسیونالیزم به هه لیپه و توند و
تیزی هه ره که سیکی دی کاتیک ئه و ناسیونالیزم بتو کاریکی پیر
با یه خ و به که لک به کار ده بدردا . ئیمه با سی ئه وه مان کرد که
ئه مه ههلویستیکی مارکسیستی بوو ، لهم ههلویسته را مارکس چ
با یه خیکی تایبته تی به نه ته وه له سه روبه ندی کا پیتا لیزم دا
نه ده دا ، سه روبنی قسه له سر ئه وه بوو که داخوا دی ساردهی
نه ته وه بتو ئه وهی ئاما نجده کانی شورشی پرولیتا ریا بی نی وه
بزر ده بئی ناسیونالیزم دریزه به مانی ده دا به لام نه ک ناسیونا -
لیزمی جوئی " خویستی تیکرا بی " له با تیان ئیمه کوشت بتو
وهک یه کی ده بینین ، به ریگای دوستانه دا ، له نیوان گشت
فه رهه نگی ئینسا نیدا .

سەلما ندنى ئەسى دىا رى كردىنى چارەنۇوسى خۆ لە لايمەن
ما ركسىستەكانى وەك لىينىنرا قەت كامىل نەبۇو رۆزا لوڭزا مېبورگ
ھەر وەك دەردەكەئى ئەو ئەسىلى بە هيچ كلۇجى نەسە-
لما ند . بەلەم ئەو فکرە تا ئەو رادەيە كەوەخۇكرا بىۋە
ھۆى كىزبۇونى تەئكىدى ما ركس و ئىتىنگىلىس لەسەر داخواز بەرزىترە-
كانى نەتەوە بە ژمارە مەزىنەكان ، و نىزىك بۇونەوە يەكى زىيا تىر

به دوای یه‌کدا به رپه‌رج ده‌داتهوه ، هه‌ر به‌رده‌وا م بون له‌سهر باسی ئه‌نته‌رنا سیوّنا لیزم کردن ئه‌وان مه‌بستیان ئه‌نته‌رنا سیوّنا - لیکی کا پیتا لیستی بولو ، و هه‌ر وه‌ک لیتین نیشانی دا بچوونی ئه‌وان به ته‌واوی غه‌یری واقیعی و غه‌یری ما رکسیستی بولو . به‌لام ئه‌نته‌رنا سیوّنا لیزمی پرولیتا ریا یی ، که تییدا چینی کریکار له ولاتانی جیا وا ز یه‌ک ده‌گرن بولو شه‌ری ئه‌مپریا لیزم ، وه‌ک به‌شیک له تیوری ما رکسیستی ما یه‌وه .

ما رکس و ئینگیلیس قمه‌ت به ته‌واوی له‌سهر ئه‌وه ساغ نه‌بوو - نه‌وه که ج هله‌لویست و بچوونیکی یه‌گجا ره‌کی یان سه‌باره‌ت به ناسیوّنا لیزم هه‌بی . به تا یبه‌تی ئینگیلیس به دلگه‌رمیکی زوره‌وه مه‌یلی خوی بولو فه‌ره‌نگی نه‌ته‌وا یه‌تی ئال‌مان پاراستبوو ، ئه‌گه‌رجی ما رکس لای به‌دلتر بولو که باسی خوی وه‌ک ته‌به‌عه‌یه‌کی جیهان بکا ، لیتین ، وه‌ک باکوئین ، هه‌ستی به‌ستراشه‌وهی خوی به زمان و خاکی رووسیا ده‌کرد ، باوه‌کوو له‌بهر سالانی دریزی ته‌ریک بیوون و به‌شداری چا لاکانه و ئاگا داری له‌مەر بزووتنه‌وه سوّسیا لیستی یه‌کان له چه‌ندین ولات و قاران ئه‌وهی کردوووه ئه‌نته‌رنا سیوّنا لیستیکی به کرده‌وه وه‌ک ما رکس و ئینگیلیس . لیتین زوری هه‌ول دا بولو ئه‌وهی خلای بپاریزی له‌وهی که هه‌ست و گیرؤوده بونوی به رووسیا وه به‌سهر حوم دانی ده‌رباره‌ی ئه‌وهی که ج به قازانچی بزووتنه‌وهی شور - شگیرانه‌ی جیهانه زال نه‌بی .

باویر و رینیر زوریا ن زه‌حمدت کیشا ئوتريش - مدجا وستان وه‌ک ده‌وله‌تیکی نه‌ته‌وا یه‌تی رزگار بکهن ؛ ئه‌وان به راشکاوی ناسیوّنا لیست بونو ، به‌لام نه‌ک به مانای ، دووره‌په ریزی لام بیگانان ، و مل لی بادانیان . له نووسینه کانیاندا ج شوکنه‌وا - ریک له شوقیتیزم و شه‌رخوازی نابیندری . هیندی نووسه‌ری شیوه ما رکسیستی " سوّسیا لیست " به ره‌چا و کردنی ناسیوّنا لیزمی تیکوش‌ری بورؤوازی خویان له جو‌ولانه‌وهی مارکسیستی ده‌رده‌ها وین .

له کاتیکدا ما رکسیسته ره‌سه‌نه‌کان به‌رده‌وا م بون له‌سهر نیشاندا نی هه‌ست و به‌ستراوه‌بی به ناسیوّنا لیزم له ریک فه‌ره‌نگیدا به هاتنی ۱۹۱۷ له هله‌لویستی دئی نیشتمان په‌رسنی - ره‌نگه به شیوه‌یه‌کی کاتی - پیش شه‌ری سه‌ندیکا کریکاریه‌کان ،

کرده وهی چینیکی پیشکه و تنخواز دئی زورداری بدرکیّن هدنگا و ۷۵ به ره و پیشه وهیه ، هدر وهکی دزا یهتی لدگه ل ۷ مپریالیزم و پشتیوانی تدوا و له جوولانه و نهته وا یهتی یه کانی موسته عمده کانی نیش ئا وایه . له نهتیجه لمه بر یه ک هدلوه شانی ئهنته رنا سیونالی یه کم و به دووی ویرا ئهنته رنا سیونالی دووهه م ، تهئکید لمسه ر خه با تی چینا یه تی نیو خویی له با تی تهئکید لمسه ر خه با تی چینا یه تی له ریکی نیو نهته وه بیدا تا راده یه ک به په ژیوانی یه وه خوکرا . به لام به هلی لیدوان و باس و خواهی قوو ل دهرباره ته بیعه تی ده ولت له سه رده می تازه هی ئه مپریا لیزمدا تیوریی ما رکسیستی به نه غدهن خوی بو ئه و ئالوگوره ئاما ده کردبوو . رقه بمه ری نهته وا - یه تی که لمه بر خه بات بو بازاران و بو موسته عمه ران سه ری هدلدینا ئاخره کهی ببوروه جیگای لیخوردبونه وه و چا و تیبرین . مونوپول و پاراستنی کدل و په لی خویی وا وه بمه چا و ده هات که هیزان وه بمه تهئکیدی نوی لمسه ر ناسیونالیزم نابی . سه ره رای شهوش گونگی بهرگویی ناسیونالیزم هیشتا به تموا وی په گه یشتبوو .

هدنگا وی چل و نیوه چل له خه با تی دئی کا پیتا لیستی لمه سه رده می ئه مپریا لیزمدا چی لی ئاكه و یتنه وه . ما ئگرتئی گشتی دئی شهر ، دا خوازی پیک هینانی میلیشیا خه لک ، و ، سه لماندنی پیویستی چه ک دا مالیں جلاره بیروبا و ریک بعون که ما رکسیسته کان به که میان گرتبوون و قوماریان پی کردبوو هدر وه ک باقی بزووتنه وهی کریکاری و سوسیا لیستیش لمه با ره یه وه ئا وا جوول - بعونه وه . ئه ودا نه میشن . به نیو کردنی (ناسا ندنی) شه ری دیفا عسی نزم کرابووه یا ان چاکتر بیلیں گوله درا بیوو ، و بهم پی یه نیشا - نه یه کی تر له هدلبران له فکری ما رکس و ئینگیلس خلی ده رده خست .

ئال و گوله همه مه زن له تیوریی ما رکسیستی نهته وه دا ناسینی ئه وه بیوو کم " ئهنته رنا سیونالیزم " بهو جو رهی لمه لایه ن ئهنته رنا سیونالی دووهه میا دیاری کرابوو ، ببیووه چا و ترا ویلکه یه ک . له راستیدا ده کری ئه و ئال و گوله وک دهستیوو بودن و گورسینی تیوری " خهستی " ما رکسیستی لمه چا و بگیری ، چونکوو بچوونی ما رکس بیو ئهشتہ رنا سیونالیزم به مانای کرده وهی راسته و خو له لایه ن پرولیتاریا له ریکی نیونه وه بیدا بیو له کا تیکدا قسنه ویژه کانی ئهنته رنا سیونالی دووهه م ئه گه رچ داخوازی تایبھتی بیو جیبھ جی کردنی کرده وهی راسته و خویان یه ک

ناسیونالیزم و سوپریالیزم

تیوری یه مارکسیستی و کریکاری یه کان

درباره ناسیونالیزم تا سال ۱۹۱۷*

نووسینی - هوراس . بی . ده یقیس
وهرگیرا وی - حسه‌نی سه‌یف

تیوری مارکسیستی ده رباره نهتهوه به و جوره که تا زه‌مانی شورشی رووسیا له سالی ۱۹۱۷ دادا پیگه‌یشتبوو له چند لاینه و زور که وه بیرونی مارکس و ئینگیاس ده چوو . ئه و ئاں و گورانه به سه‌ر ئه‌م تیوری‌یدا هاتبوبون بېشیکیان ده رها ویشن و فریدانی فورموولی نالهبار و نادرست‌لهم با رهیوه بوبون ، و بېشیکی دیکه‌شیان تا زه‌کردنه و جور ده رهینانه وهی ئه‌م تیوری‌یده ده گه‌ل سه‌روبه‌ندی روز بوبو . ته‌تکیدی نوی له سه‌ر نیوه‌رۆکی دروشمی دیاری کردنسی چاره‌تووسی خوا له نه‌تیجه‌ی پیدا چوونه وه وه‌لانانی هەلگویسته‌کانی پیشبو و سده‌هاتایی نه‌بوبو بەلکوو له‌بیدر تیگه‌یشن و ناسین چلۇنا یه‌تیی جو‌لانه وه ناسیونا لیستی‌یده‌کان بوبو که سه‌ریان هەلگینابوو - بوجووسی سده‌هاتایی لینین له روال‌هتدا به زه‌حمدت‌له بوجوونی مارکس و ئینگیلس جیا ده‌کراوه - سه‌لما‌ندنی ئه و فکره‌ی کە جو‌لانه وه ناسیونا لیستی‌یده‌کان شیا وی پشتیوانی لیکردن بېت‌سو

* Horace, B. Davis: Nationalism and socialism, marxist and workers theories on nationalism up to 1917.

ناسیونالیسم و سوپریالیزم ناوی کتیبکه که له لایه‌ن نووسه‌ری ئه‌مریکایی ده‌یقیسرا نووسراوه و تییدا نووسه‌ر به ئاوایدکی هه‌مه - چشنه بیرونی بیره وه رانی وهک مارکس ، ئینگیلس و لیئین ده‌رباره‌ی نه‌تهوه و ناسیونا لیزم ده‌تویزیت‌تهوه . پوخته‌ی ئه و باسانه‌ی لئه کتیبکه‌کەدا هاتبون و له لایه‌ن نووسه‌ر را گەلاله کراون ده‌خینه به و چاوی خوینه‌ران .

(شیکردنده وهی وهرگیر)

گرتنی قهلهای دمدم نزیکمی ههشتا و شهشکیز و تازهبووکی کورد له
ترسی ناپیا وهتی قزلباشان و ئەفسار که نهباذا داوینیان پیس
کەن خوّیانیا ن لهسەر بەردی شمشیر خانی فرهدا خواره و خوّیا -
نیان کوشت (۳۶).

قهلهای دمدم سەرەرای ئە و ھەمووھ لىدۇانە ، کە تەواوی دیوا -
رەکانی بە گوللەی تۆپکون کون ببۇون بەلام دیسان قەلايىھە زۆر
قايم و نەبەز بۇو .

له سەرەمی نادر شادا ، کە بەشى لە کوردستان و ئازەربا -
يجا ن کەوتبوھ دەستى عوسما نېھوھ يەكى لە میرانى عوسما نى بە
نا وي يۈسف پاشا حکومەتى ورمى بە دەستەوھ بۇو کە دىتى کارو
با رى ئىرماڭ باش نېھ دەستى كرده تالان و چەپا وي دەوروبەر . کاتى
کە نادر شا بەم کارەساتە زانى بەرە و ئەم ناوه هات . يۈسف
پاشا له ترسدا خوّى خستە قهلهای دمدمەوھ . نادر قهلهای گەما رو دا .
يۈسف پاشاشت و مەکى پا راستى قهلهای نەبۇو ھەر زوو خوّى دا
بە دەستەوھ . ئەم کارەساتە له سالى ۱۷۲۹ ز . پۇوی دا .

بە ئەمرى نادر شا يۈسف پاشا كۈزراو قهلهای دمدم بە تەواوی
رووخىنرا (۳۷).

له رۆزگارى ئىمەدا تەنبا نىشانە دمدم شاخىكى بەرزە و
ھىچى تر بەلام نىشانە و بىرەوەرى دمدم لە دلى گەلى كورددادەتە
ھەتا يە ھەر بەرزە .

(۳۶) ھەمان سەرچاوه ، ل ۵۵ .

(۳۷) ھەمان سەرچاوه ، ل ۷۷ .

ته مر خان له سالی ۱۶۲۶ ز. کاتی کلب عدلی خانی ئەفشار حاکمی ورمى بwoo جا ریکی تر قه‌لای دمدمى گرتەوە و دیسان بیره وەرى با وکى زیندۇوکرده وە (۳۳). پیشەرگەكانى ته مر خان ئەو كەسانە بwooون كە با وک و براکانيان له شەپى دمدەدا شەھید كرا بwooون . ميرزا رەشيد دەللى: قه‌لای دمدە نووسا بwoo به هەرىمى عەشيرەتانا كوردى سەر سنورە وە ئەوانىش به هوئى تەعەسوب و قىنى كە لە لەشكىرى ئىرمانيان هەلگرتبوو چوونە يارمەتى تەمر خانەوە شەپىكى وايان ساز كرد حاکمی ورمى نەيتوانى چارە سەريان بكا و داواي يارمەتى لە براکەي كرد (۳۴).

كەلب عدلی خان و لەشكىرى سەرەپاي ئەوە كە قه‌لای دمدەيان گەما رو دا بەلام هيچيان به هيچ نەكەد و كورده كان ئازا يانە شەپىان دەكەد و بۇ پاراستنى قه‌لاكە لە خۆ بەخت كەرنىش درېغى - يان نەدەكەد . كەلب عدلی خان تىگەيىشت به شەپى ناتوانى كورده - كان بشكىنى ئەويش دەستى دايە فروفيلى . بەلام كورده كان جارپىك فربىويا خواردبۇو و ئەمجا رە دوزمنى خۆيان به باش دەناسى .

كەلب عدلی خانىش دەيزانى قه‌لای دمدە لە بارى ئا وە وە زۆر كزە، ئەويش به تاقمى خۆي گوت سەرچا وە ئا وى قەللاكە بەۋزىنە وە . بەلام نەيان دەزانى سەرچا وە كە لە كويىيە . ميرزا رەشيد دەللى كەلب عدلی خان ئەم فيلەمى دۆزىيە وە بۇ دۆزىيە وە سەرچا وە ئا وە كە . گوتى هيسترېك بىيىن ، سى شەو و سى رۇڭ تفاقي بەنهنى و ئا وى مەدەسى . رۇڭى چوارەم بەرەلە كەن رەنگە تىنۇويەتى زۆرى بۇ سېنى هەست بە ئا و بكا و سەرچا وە كە بەۋزىتە وە . بە ئەمرى كەلب عدلی خان چەند خەروا رەفتىيان لە سەرچا وە كە بەردا تا ئەو جىگا هەموو ئا وى خەلکى نا و قەللاكە بwoo به نەوت . ديسان چەن رۇڭى وا بە كويىرە وە ئىيان بەلام ئاخىرى هيچيان پى نەكرا و خۆيان دا بە دەستە وە (۳۵).

ميرزا رەشيد دەللى: لە عەجا يېرى رۇڭگار ئەمە يە شەوى پېش

(۳۳) تارىخ افشار ، ل ۵۲ .

(۳۴) ھەمان سەرچا وە ، ل ۵۲ - ۵۳ .

(۳۵) ھەمان سەرچا وە ، ل ۵۳ - ۵۴ .

قه‌لای دمدمیان گرتەوە . بەلام بە ھۆی کە مبی پیشمه رگەوە نهیان تواني قه‌لاكه راگرن دیسان لەشكري حکومەت زال بwoo بەسەرياندا و سەرلەنوي قه‌لاكه داگيرکرد . شا عەباس لە دواي ئە و ھەمووھ كوشتن و مال وىراني يە کە هيئانى بەسەرگوردەكەندا دیسان دەستى لەسەريان ھەلنه گرت ئينجا سيا سەتى ديكەي بەكاره ھېيتا . سيا سەتى گويىزانەوە كوردەكەن بو ئەم لا و ئەدو لا . لە رۇزەھەلاتى ئېراندا شا عەباس دوزمنىكى گەورەي ھەبwoo ۋەويش ئوزبەكەكەن بۇون . شا بۇ ئەدەم كوردەكەن لەنا و بەرى و ھەم ئوزبەكەكەن كوردە - كانى نارده سەر سەنۋوري ئەوان . محمد كاظم نووسەرى مىژۇو " نامى عالم آرای نادى " نووسىيە : " شا عەباس سى ھەزار مالى كوردى گويىزا يەوە بو خۇراسان و لە ھەرىمى خەبووشان (قوجان - ع . م) هەتا ئالاداغ داي مەزراندن (۳۱) .

شا عەباس بە ناوى بەرگرى لە ولاتئەم كارانەي دەكىرد كەچى لە راستىدا مەبەستى كوشتنى كوردەكەن بwoo بار تولد دەنۇوسى : " شا عەباس بۇ پا راستنى ولات لە چەپقا وي تۈركەن و ئوزبەكەكەن بېيارى دا كوردە شەپكەره كەن لىنە رۇزئا و اوھ بگويىزىتەوە و ھەر بۇ ئەم مەبەستە پىنج مەلبەندى كوردىشىنى لەسەر سەنۋور لە ئەستەر ئابادەوە تا چىاران دروست كرد لەو پىنج مەلبەندە ئىستاسى مەلبەندى واتە بىنورد و قوقان و دەرگەز ھەر لە جىگاي خۇياندا ماون (۳۲) .

گويىزانەوە ئەم كوردانە بۇ خۇراسان بwoo بە ھۆي پچىرىنى ئەوان لە ئا و و خاكى با ووپاپيريان .

لە پىشدا گوتمان خانى لەپ زىپرىن كورپىكى ھەبwoo بە ناوى تەمر خان . تەمر خان لە پىاوهتى و ئازايدىدا رېگا وشۇينى با وکى گرتىبووه وە . شا عەباس زۆر جار لە خانى لەپ زىپرىن داوا كردىبوو ئەم كورە ھەر وەك بارمىتە بىنېرىتە دەربارى شا بەلام ئەمیر خان گويى خۆي لى كەر كردىبوو .

(۳۱) محمد كاظم ، نامە عالم آرای نادى ، جلد اول ، چاپ عكس ، مسکو ، ۱۹۴۰ ، ل . ۲۰۰ .

(۳۲) بارتولد ، و . و . : تذكرة جغرافية تاریخی ایران ، ترجمە حمزە سردار دور ، تهران ، ۱۳۰۸ ، ل . ۱۴۵ .

کویله‌تی برا ن و تولمیان لی سهندرا یه وه^(۲۸) . میژو و نووسیکی دیکه له سه ر قهلاچوی کوردی موکری ده لی: شا به له شکره که که شهست هه زار که سبوون ئه مری کرد هه مهو عیلی موکری له مهودای دوانزه فرسخی ده و رو به ر له هه ریمه که یا ن که س زیندو و نه هیلن و ئه م له شکره چوار شه و چوار رؤژ خلکی بی گوناهیان کوشت^(۲۹) .

جلال الدین محمد یزدی ئه ستیره ناسی شا عه باس که له نزیکه وه چاوی بهم کاره ساته خوینا ویه که و تووه ده لی: له دوای ئه وه علی خانی شا ملو هیرشی برده سر قهلای حسین سلطان برای قوباد خان (ربیع الآخره ۱۰۱۹ ای کوچی - ۱۶۱۰ ذ) و به فروفیل خلکی نا و قهلاکه هینایه ده ره وه ، خلکیان به دیلی گرت . له نیویاندا کوریکی کوردی هه شت ساله هه بیو که با وکی به دهسته وه گرت و کابرای بریندار کرد و ووتی: "ئه وه تولمهی با بم" ، ده س به جی کوریان کوشت . هه روه ها ژنیکی که کوردی دووگیان له گه ل کچیکی شه ش ساله که قزلباشی دا وینی پیس کردم بیو کاتی که قزلباشه که ده چیته حه مام و دیته وه ده بینی ژنه سه ری کچه که بیو و زک و مندالی خوی دریو و خه ریکی کوشتنی خویه تی و ده لی له دوای میرده که م ئیدی ژیانم ناوی^(۳۰) .

دوای دا گیرکردنی قهلای دمم له لایه نی شا وه قه باخ خان بیگدلی بیو به خاوه نی قهلای دمم . له سالی ۱۶۱۵ ای . ز . یه کی له ژنانی خانی له ب زیرین ، که ئه و هه مهو کوشن و برینه هی دیبیو هه ر له قهلای دمم مابووه و له خزمه تی قزلباشاندا بیو ، به لام ساتی بیری توله له میشکی ده رنده چوو تا هه لی بیو هه لکه و ت رؤژی قه باخ چووبووه را و بیکی له خزمانی ئهمیر خان به نیوی "ئولوغ بیگ" ئاگا دار کرد که خوی ئا ماده بکا . ئولوغ بیگ نیوه شه و خوی و چل پهنجا که س له هه قه لانی دیسان

(۲۸) هه مان سه رجاوه ، ل ۸۱۳

(۲۹) فلسفی ، نصر الله : زندگی شاه عباس اول ، جلد سوم ، ل ۱۹۴

(۳۰) روضه الصفویه ، ب. زندگی شاه عباس اول ، جلد سوم ، ل ۱۹۴

که ووت و کوژرا (۲۶). ئەسکەنده‌ری مونشی دەلّی؛ ئەمیر خان و خان عه بىدااَل و هاوه‌لاني وەختى زانيان له دەستى قزلىباشان گيان به ساقى دەرناكەن وايان به باش زانى به چەكەوه خۆ بەدەستە وە و بچەنە ناويان جا له هەللىكدا هەرجى بتوانن لىيان بکۈزۈن تا قزلىباشەكانى دىكە ورپا دەبنە وە دەستى خۇيان دەوهشىئىن. ئەگەر پىيانيان زانى خۆ تۆلە خۇيان دەستى خۇيان دەوهشىئىن. ئەگەر كۈزۈن وون (۲۷).

بەم جۇره قەلائى دەمم داگىركرى و لەشكىرى بى بەزەيى شاي ئېران شەلم كويىرم نا پارىزم دەستيان كرد بە كوشتن و بىپىنى ژن و مندااَل و پىر و ساواى كورد.

دواى كۈزانەوهى كارەساتى دەمم شا عەباس را يىسىپ ساراد لەشكىرى ئېران له هەر لايىك كوردى موكىرى چا و پى كەوت بە بى پرسىن بىداتە بەر شير.

لە سالى ۱۶۰۰ ب.ز. دا كاشى كە شا عەباس بۇ خۇي هاتە هەر يىمى مەرااغە قوباد خان و مەزنانى عىيلاتى موكىرى چوونسە لاي ديا رىيەكى يەكجار زۇريان بۇ بىردى بەلام بە فرمانى شا له رۆزى دووشەممۇسى ۱۸ اى رەبىع الاحرى سالى ۱۰۱۹ اى كۆچى هەمۇۋىان كۈزۈن و هەر ئەو وەختە ئەمرى قەلاچۇي كوردانى موكىشى دەركەرد. ئەسکەنده‌ری مونشى دەلّى: قەلاچۇي كوردى موكىرى بە خا مەى چا رەنوس لە مىژۇوىي روزگا ردا نۇوسرا بۇو و هەر لەم روژەدا دەستە كوردانىان دەھىنە و بە شير سەريانىان دەپەرەند. بەھرامى جەلاد ساتى ئارامى نەبۇو هەر خەرىكى كوشتن بۇو ...

بە كورتى بىبىرىنە وە بن و بىنچىنەنە كوردى موكىرى دەرھەينرا، پىاوانيان كەوتتە بەر شير و ژن و منداالىان بە

" (۲۶) محمود پىدرام له وتارىكدا بە نا وي " لەسەر قەلائى دەمم " گۆفمازى هەنر و مردم، زمازە ۱۵۱، گولانى ۱۳۵۲، كە بە زمانى فارسى نۇوسىویەتى، دەلّى: ئەمیر خان و منداالەكانى خۇيان لە بەردى شەمشىرخانى بەردا وەتە وە. ئەم قىسىم راست نىيە. (۲۷) عالم آرای عباسى، جلد دوم، ل ۸۱۱.

بریندا ره کاندا دوو سوار ههبوون یهکیکیان ئەفغانی بولو و ئەوی تریان پا زووکی . پیشمه رگه کورده کان ئەو دوو کەسمیان گرت و بدپریان کردنه ناو قەلاکه وە ، خانی لهپ زیپرین ئازایەتی و دلیزی ئەو دوو سواره پی گرنگ هات و نەی هیشت بیانکوژن . را یسپاره بیرینه کانیان دەرمان کەن و ئینجا رزگا ریان کەن (۲۴) .

سەرداری ئیران پاش ما وەیەکی شەپ بە تەواوی لە شەرکردن نا ئومید بولو . ئەسکەندەری مونشی دەلی کۆۋەر و بیریندار ئەوهەنە زۆر بولو ، كە ترس و دوودلی نیشته دلی لەشكري شاوه . تەنانەت سەرەك وەزیر پەشیو و توورە بولو و هەرەشە ییک قورسی لە سەردارانی شەپ کرد (۲۵) .

شەپ لە نیوان کورده کان و قىزلىبا شەکاندا بەرده وام بولو تا لە رۆزى ۱۸ مانگى ذوالحجەدا لەشكري قىزلىباش سەرچا وەی ئا وی قەلای دەمدە دۆزىيە وە و بەم جۆره بە بېرىنى ئا و خەلکى قەلایان خستە مەترسى مەرگ و ژيانە وە .

خانی لهپ زیپرین و خان عەبداللە کە بەم کارە ساتەيان زانى چى دىكەيان پی نەكرا ھاتنە سەر ئەوهە خۇيان بەدەن بە دەستە وە بەلام بەم جۆره :

خان عەبداللە و ھەقلانى بە خۇيان و چەكىانە وە لە قەلە بچەنە دەرە وە و بىن بە میوانى ئەلیاس خەلیفە قەرەدا غلۇوی پیا وی حکومەت . ھەر وەھا ئەمیر خان و کورە گەورە كەھى تە مەر خان و سەد كەس لە براادە رانى بچەنە مال مەحەمەد بەگى سەردار . باقى لەشكەرە كەش قەلای دەمد بپا رىزىن تا بىزان دەبىتە چى .

كاستى کە خان عەبداللە ھاتە مال ئەلیاس خەلیفە ھەللىکى بولە لەكەوت و بە شيرە كەھى كەوتە گىاشى قىزلىباشان . لە ئەنجامدا ئەلیاس خەلیفە و زۆر كەسى ترى لە قىزلىبا شەکانى كوشت ، بەلام قىزلىباشان گەلە كۆمەيان لىكىد و كوشتىان .

لە لايىكى ترە وە خانى لهپ زیپرین قېرى خستبووه نىساو قىزلىباشان بەلام كوتۈپە ئەويش وە بەر شىرى سەربا زىكى ئیرانى

(۲۴) عالم آرای عباسى ، جلد دوم ، ل ۸۰۰

(۲۵) هەمان سەرچا وە .

شده که دا خدّلک توشی بی ئا ویه کی کوشنده بوون ، سه‌لام سه‌رای ئەمەش شەش مانگ و به وتهی دیکه نو مانگ خوئی پاراست (۲۲).

لەم سه‌روبەندەدا چەن روودا ویک قەوما کە با رى شەرى بە سوودى كورده کان بىرده پېشەوه . يەكەم : مەھەممە پاشا سەرۆكى كوردى جەلالى لە ناكا و مرد . لە دواى مردى ئەو بلاؤه و دوو بىرەكى كەوتە نىيۇ جەلالىدە کان . هەروهە برا دۆستە کان لەبەر بى ئا وي لەمان و نەماندا بوون كوتۈپر با رانى بارى و بى ما وەي مانگىك بەردەوا م بۇو . خەلکى قەلەكە زىندۇوكىرده وە . گۈنگۈتىرىن روودا و ئەمەش بۇو كە حاتەم بەگ شەۋى نۇوست و ئىدى هەلنىستايەوه . مردى حاتەم بەگ لەشكىرى ئىرانا تووشى گىروگەرفتىكى زۇر كرد .

ھەرچەند سوپاي شا چەن بەرا بەرى پېشەمەرگە کانى خانى لەپ زېرىن بۇو بەلام ئازايدەتى و دلىرىي پېشەمەرگە کان قەره وى ئەم كەم بۇونە دەكردەوه . ئازايدەتى و دلىرىي پېشەمەرگە كورده کان وەها بۇو ، كە ئەسکەندەرى مۇنىشى نەيتوانىيە ددانى پېيدا نەنى كە دەلى : لەبەر ئازايدەتى كورده کان سوپاي ئىرانا هېچى بى نەدەكرا و ژمارەيدەكى زۇر لە سوپا لە نىيۇ چوون و يَا بىرىندار بوون . حەسەن خان (يەكى لە سەردا رەكانى ئىرانا بۇو - ع . م .) لە ئازايدەتى كورده کان شەرمەسار بۇو (۲۳) .

لە پېشدا گۇتمان قەلائى دىمدەم لە با رى ئا وەوه لە مفترسىدا بۇو . سەرچاوهى ئا وەكه لە دەرەوهى قەلەكەوه بۇو . كاتىسى سەرۆكى لەشكىرى شا ھەستى كرد ناتوانى بە شەپ و چەك كورده کان بشكىنىيەتە سەر ئەم رايە بەشكۇو سەرچاوهى ئا وي قەلەكە بدۇزىيەوه و بە بىرىنى ئا و خەلکى نا و قەلەكەش بىفەوتىنىي يَا لە بى ئا ويدا خۇيان بىدەن بە دەستەوه .

سەرۆكى لەشكىرى قىزلىباش بەشى لە سەربا زەكانى خۇي كرده بەرپىرى دۆزىنەوهى سەرچاوهى ئا وەكە . لەو سەربا زانە ھەشت كەسيان نەبى كە بىرىندار بوون ئەوانى تر ھەموو كۈزان . لەنىيۇ

(۲۲) تاریخ افشار ، ل . ۳۰ .

(۲۳) عالم آرای عباسى ، جلد اول ، ل . ۷۹۸ .

کودن ، به لام سی سه د چوار سه د که س لدوا ن چوونه سه ر له شکری ئه میر خان و ئه وی تریا ن شان به شانی شای ئیرا ن دز به ئه میر خان له شه ری دمدمدا به شاداریا ن کرد و بیون به هوی کوشتن و زیانیکی زور له کوردستا ندا . ئه میر خان که ههستی به پشت هستوری خوی کرد ورده ورده به تهوا وی وهلامی شاشی نه دهداوه . جاریک شا عدبا س ئه مری پی کرد له شه ری چه غال ئوغلى سه رداری عوسما نی ، که هیرشی هینا بووه سه ر ئازه ربا يجان يا رمهتی سه رداری ئیرانی ئه للا ویردی خان بدادات . به لام ئه میر خان سه ره رای نزیکی له میدانی شه ره وه يا رمهتی ئه للا ویردی خانی نه دا . له کاتی ها سنتی کورده جه لالیه کاندا شا ههشت هزاری لیان سه رشکین کرد به سه ر برا دوسته کاندا ، به لام ئه میر خان نه چووه ژیری و هیچیانی و هرنگرت . کورده وهی ئه میر خان به ره به ره شا و دام و ده زگای خسته په زا وه وه . يا خی بیونی خانی له پ زیرین شا عدبا سی به تهوا وی خفهت بار کرد . میرزا ره شید ده لئی قزلبا شه کان بیری ئه وهیا ن ئه کرده وه ئه گهر خانی لـهـ پ زیرین ، که خزمه تکاری نزیکی دهولهتی شا عدبا س بیو ، وا ببزوی ده بی ئیمه چون چا وه روانی خزمت بین له لاین مه زنه کانی دیکه کورdestane وه (۲۰) . شا به تهوا وی حالی بیو ئه میر خانی لـیـ یـاـ خـیـ بـوـ وـ لـهـ شـکـرـیـ نـارـدـهـ سـرـیـ .

له روژی بیست و شهشی شه عبا نی ۱۷ ای کوچی (۱۶۰۸ ز) له شکری شا عدبا س قه لای دمدمی گه مارو دا و شه ری دمدم دهستی پی کرد . شا سه ره کوه زیری خوی حاتم به گنی ئوردو با دی کرده فه رمانده و به رپرسی ئه م شه ره و پی راسپارد : ئاگری يا خی بیونی ئه میر خان به ئا وی کوشتن و بیین بکوژیننه وه و مه لبه نده که دهنه دهستی جه لالیه کانه وه و ئینجا دهست بکه ن بـهـ قه لاجوی کوردا ن (۲۱) .

له م لاشه وه خانی له پ زیرین درکی قه لای دا خست و خوی بـوـ به ربه ره کانی ئا ما ده کرد . قه لای دمدم قه لایه کی يه کجا ر قایم و له بار بیو ، ته نیا که م و کوری بـیـ ئـاـ وـیـ هـبـیـوـ . له مـاـ وـهـیـ

(۲۰) تاریخ افشار ، ل ۰۴۶

(۲۱) عالم آرای عبا سی ، جلد اول ، ل ۷۹۵

کاربدهه ستانی دهولهت کاروبا ری ئەمیر خان و قەلای دممیان
دا بە دەستى پیر بوداقەوه . پیر بوداق دوو پیا وی خۆی نےاردە
لای ئەمیر خان تاکارەساتی خۆی و شای بو بگېرىنەوه . خانى لەپ
زېرین کە دىتى پیر بوداق خان خەریکە دەست دەخاتە نېیو کاروبا ری
ئەمەوه خىّرا سپاوه کانى پیر بوداقى كوشت و بهم جۇرە نېیوانى خۆی
و حکومەتى شاي يەکالا كردهوه . كاتى كە كورده كان زانى يان ئەمیر
خان دەز بە شا را وەستاوه و هەروەھا نېیوبانگى قەلای دممیان بىست
دەستە دەستە خۆیان دا يال ئەمیر خان (۱۸).

(۱۸) امین زکی ، محمد : کوردی بەنا و بانگ ، گوچاری گەلاؤیز .

(۱۹) عالم آرای عباسی ، جلد اول ، ل ۷۹۳

حاکمی ئەم مەلپەندە . بەلام ئەمیر خان سەری بۇ ئەم حاکمە
دا نەنەواند . بە ووتەی ئەسکەندەری مونشى لەو کاتەوە ھەرچار
لەلای يەكى^٧ لە مەزنانى كوردهوھ بۇو . ما وەيەك ھەڭلە ئۆمىھەر
بەگى سۇرا ن بۇو و لە جەرگەي شەپى عومەر بەگ و دۈزمناندا
دەستىكى ئەمیر خان پەرى ئىتىجا پىيان دەگوت ئەمیرە كوج (١٤) .
كاشى^٨ كە شا عەباس خەرىكى وەرگەتنەوە و داگىركردنى ئىسرەوان و
ئەنچەوان لە دەستى دەولەتى عوسمانى بۇو ، ئەمیر خان خۇيى و
لەشكىرى چووه يارمەتى شاوه . شا عەباس كە ئازايىتى و دلىرىي
ئەمیر خانى پە شەپى عوسمانىدا چا و پى كەوت خۇشە ويستى ئەمیر
خاپى چووه دىلدەوە و رىزى لىگرت و سەردا رى عەشيرەتى برا دۆست و
مەلپەندى تەرگەۋەر و مەرگەۋەری بە ئەمیر خان خەلات كرد و ناز
نا وي گەورەي خانى پى بەخشى . ھەروەھا حکومەتى ورمى و شىنۇ
كە بەشى لە ئازربايجان بۇو و لە دەستى قىزلىباشەكاندا بىسو
پېشىكەش ئەو كرا و شا رايىپارد ھەرە وەستا ئازرىنگەران دەستىك
لە زىر بۇ ئەمیر خان دروست بىكا و بە دور و گەوهەرى ئا ياب
بىيرا زىننەتەوە و بىكەنە دەستى ئەمیر خان .

هه ر لەم وەختە وە خۆشە ویستى و پايدى ئەمیر خان لە بەرز
بۈونە وەدا بۇو . ئەسکەندەری مونشى دەللى: سەربەرزى ھەموو ھاوتا
و ھا وەللانى خۆي بۇو و چەن ھەرىپىمى لە دەستى میرانى عەشىرەتى
کوردەكانى سەربە عوسمانى دەرهەينا و داگىرى كرد و لە نىشىو
فەرمائىھە ما كانى كوردستان بە بەرزى پايدە و زۇرى لەشىكىر
بەنا و باڭ بۇو (۱۵) . لەو رۆزە وە شا عەباس دەستى زېرىپىنى بۇ
ئەمیر خان دروست كرد نازىنا وى خانى لەپ زېرىپىنىشى پى بەخشى (۱۶)
خا وەنى عالم آراى عەباسى دەللى لەمە و دوا زۇر بەشى
عەشىرەت و ميرەكانى كورد ھاتنە خزمەتى ئەمیر خان و لە ژىر
ساپىھى ئەودا حەوانە (۱۷)

(۱۴) ئۆسکار مان دەلّى: ئەسکەنەدەرى مونشى لە قىنا بە ئەمیر خان دەلّى كوج. (تحفه مظفرىيە، پىشەكىئوسكارمان، بغداد، ۱۹۷۵ ل.

^{۱۵)} عالم آرای عباسی، جلد اول، ل ۰۷۹۲

(۱۶) امین زکی، محمد: کوردی بهنا وبا نگ - ئه میر خانی برادوست، گوشا ری گهلاویز، زما رهی ۳، سالی یەکەم، شوباتی ۱۹۴۰.

^{۱۷)} عالم آرای عباسی، جلد اول، ل ۰۷۹۲

میرزا رهشیدیش ده‌لی^۹ : به وتهی با وی خدک ، پیش‌ثیسلام
لهم شویندهدا دوو قهلا ههبوو که کورده‌کان پیان گوتتووه دوم‌دوم
و جوم جوم . ئەم دوو قهلايیه به هوی زه‌مان‌دوه کون و ویران بwoo
و ئەمیر خان سمر لەنوي ئاوه‌دانی کرده‌وه (۹).

سەرەرای ئەوه کە ئەم دوو میژوو نووسە باسی کونی قەلای
دمدمیان کردووه بەلام شەرەف خان له میژووه‌کەيدا " شەرەفنا مە"
ھیچ ناوی ناھیئى . شەرەف خان تەنیا له بەشی فەرماننەپەیانى
تەرگەوه‌پدا باسی قەلايیک دەکا به ناوی داود ئیتر لە سەرى
نا رپوا (۱۰).

لە سەرەمی شا عەباسدا سەردا رى عەشیرەتى برا دۆست ئەمیر
خان بwoo . میرزا رەشید ده‌لی^{۱۱} ئەمیر خان لەسەرتادا پیا ویکى
ندناسرا و بwoo (۱۱) . عەرەب شەمۇش ده‌لی^{۱۲} بەرپیوه‌بەرى ئەم شەپەرە
(دمم - ع.م.) نە میر بwoo نە بەگ و نە ئاغا ، بەلکىو
کوردىّ بwoo ناوی خان بwoo (۱۲).

بەلام ئەم قسانە لمگەل نووسرا وەکانى ئەسکەنەدرى مونشیدا
رېک ناكدون . ئەسکەنەدرى مونشى ده‌لی^{۱۳} : لە سەرەمی شادا (شا
تەھماسب - ع.م.) لەم عەشیرەتە پیا وی^{۱۴} ههبوو ناوی قەرە تاج
بwoo يەكى^{۱۵} لە خزمەتكارانى دەزگاي ئەم دەولەتە بwoo و شاش
ھەرپىمى تەرگەوه‌پ و مەرگەوه‌پ لمگەل ورمى و شنۇي پى خەلات
كرد (۱۳).

لە سەرەمی محمد شاي خودا بەندى كۈرى شا تەھماسى بادا
دەولەتى عوسمانى ھەلمەتى بىرده سەر خاکى ئىران و ئازربايجانى
داگىر كرد . لەشكىرى عوسمانى خوى و سەلماس و ورمىي لە دەستى
كا رېدەستانى حکومەتى ئىران دەرهەينا و شا مەحمدە بەھە
نا ویکىان لە میرانى سوما برا دۆست لە لايەنی خۆيانوھ كىرده

(۹) تاریخ افسار ، ل ۲۱

(۱۰) شرفنا مە ، ل ۰۳۸۴

(۱۱) تاریخ افسار ، ل ۱۹

(۱۲) عەرەب شەمۇش ، قەلايی دمم ، بىداد ، ۱۹۷۵ ، پىشەكىنى
نووسەر ، ل ۰۲۳

(۱۳) عالم كراي عباسى ، جلد اول ، ل ۷۹۲

عوسمانی یه کانیش به پیچه و آنه وه بیریا ن ده کرده وه . ئەم دوو دهولته کاتی^۷ ناوی کوردیا ن ده برد و باسی کوردیا ن ده کرد که بیان بەن بو شەر و به کوشتنیا ن بدهن . ئەم سیاسەتە نالەبارە شوینی خسوئی لەسەر کوردەکان دانا و کردیانی بە دارەدەستی ئەم دوو حکومەتە . بە دریزا بی میژووی ناکۆکی نیوان ئیران و عوسمانی کوردەکان بۇون کە زۆرتربن زیانیا ن لى کەوت . ولاتەکەمیا ن بۇو بە مەیدانی شەپەری ئەم دوو دهولته و پیاوه کانیا نیش بۇون بە قوربانی دەزایەتی ئەم دوو دهولته .

سیا یەتى تەفروتوونا کردنی مەزنانی کورد لە لایەنی شا عەباسەوە بۇ جا ریکیش لە بیر نەدەکرا و هەرجار ھەلی⁸ ھەلکەوشبا لەشکر و سپاى دەولەتی دەھاتە کوردستان بۇ کوشتن و چەپماو کردن .

کارەساتى دمم دەنچا مى نەخشەی شا عەباس بۇو بۇ لەنداو بىردى مەزنانی کوردستان .

لە ھەندى⁹ کتىبى میژووی فارسىدا ووشەی دمم " دوم دوم " نووسراوه و تىكىرای تۈرك و ئاسوورى یەکانى دەرۋوبەرى قەللى دمم دەللىن دوم دوم ، بەلام کوردەکان دەللىن دمم .

مانای دمم چىه و بۇچى بەم قەللىيە گوتراوه دمم ، ھېشتا بە باشى روون نەکرا وەتمەوە و هەركەس مانايىكى لى¹⁰ دەداتەوە . بە رای ئىمە ، دمم بريتى بە له دوو ووشە دم دم . دم لە زاراوهى کوردانى موکريدا بە مانای لووت يا كەپوویە . جا چۇن قەللى دمم خۆى وەکو لووتىكى دریزە و دەرۋوبەرى قەللاڭەش بەردى گەورەگەورەن کە ئەوانىش لە لووت دەچن و له قەللاڭەوه ھاتۇونەتە دەر . خەلک نا ويان ناوه دمم . بە رای ئىمە دوم دوم نادروستە . ئەگەر ئىيىستاش سەيرى بەردى شمشىر خانى ، كە بەشىكە لە قەللى دمم بکەين كوت و مت دەللى لۇوته .

قەللى دمم قەللىيەكى میژووی و زۆر كۆنە . ئەمكەنەدەرى مونشى دەللى¹¹ : لەنیو کوردان باوه بەر لە ھاتنى ئىسلام و لە سەرددەمى ساسانى یەکاندا ھەر لەم جىگايىدا قەللاڭەدە كەبۇوه ، كە بە قەللى دمم نیوبانگى دەركەدووه و رۇزگار كارى تىكەردىووه و لە نىئۇ چووه^(۸) .

فهرمان نپهوا یه کی بچووکه وه ، که هر به ناو له زیر رکیفی ئیران
بوون .

کاتی که شا عباس هاته سر تهخت کوردستان له بازیکی
تا یبه تیدا بwoo . له کوردستانی ئه رده لان هه لّو خان (له سالی
۱۶۲۷ مرد) دز به شا عباس راوه ستا بwoo . میژوو نووسیکی کورد
سه باره ت به هه لّو خان ده لّی : دیاری بو هیچ خاوهن ده سه لاتیک
نه ده نارد ، هه رو ها زور هه ولی ده دا له شکر و سپا پیکه وه بنی و
ولاتی خوی ئا ودها ن بکاته وه . با جی به که سنه ده دا و ملی بسو
که س شوپ نه ده کرده وه (۵) . شا عباس هه ولی له نا وبردنی هه لّو
خانی دا به لام سه ر نه که وت . ته نانه ت هه لّو خان دوو سی جار
سپای شای ثکاند ، که جاری ئاخرا شا بسو خوی سه روکی له شکر بwoo .
کاتی که شا عباس هه ستي کرد له فرهیدا نیمه بتوانی هه لّو خان
 بشکینی په نای برده فرو فیل . به لام هه لّو خان میریکی لیها توو و
شاره زا بwoo و هه تا ئه و روژه له سه ر حوكوم بwoo سیاستی خوی
به ریوه برد .

سیا یه تی ناله با ری سه فه وی و ووشکه سوفیتی و ته عه سوبی
دیتی یا ن کورده کانی به ته واوی له حکومه تی ئیران دلگیران
کرد بwoo . کوردانی موکریش هه ر له میژ بwoo بwoo بوون به قوربا نی
ئه م سیاسه ته . ئه سکه نده روی مونشی ده گیریت وه ده لّی : له دوای
شه پی شا ئیسما عیلی سه فه وی له دزی ئاق قویونلوه کان بدهه و سارم
به گی کورد ، که له مه لبندی ورمیدا ده زیا ، رویشت گرتی و کوئتی
و عیل و بنه مالهی به بای فه نادا دا (۶) .

هه رو ها شه ره ف خان ده لّی : مه زنا نی کوردستان هه مسوو
پیکه وه به ره و ته بريز چوون بو خزمه تی شا ئیسما عیل به لام به
فرمانی شا هه موویا ن کله بچه کران و خرانه زیندانه وه (۷) .
سه فه ویه کان هیچ کاتی متمانه یا ن به کورده کان نه ده کرد و ئه وا
نیا ن به لایه نگری حکومه تی عوسمانی ده زانی . هه رو هه

(۵) ملا شریف قاضی اردلان: زبدة التواریخ سنندجی ، نسخه خطی
کتابخانه دانشگاه کمبریج ، انگلستان ،

(۶) اسکندر منشی: عالم آرای عباسی ، جلد اول ، ل ۴۱ .

(۷) شرف خان بدليسی: شرفنا مه ، طبع الازهر ، مصر ، ۱۹۳۱ ، ل ۱۶۸ .

نا وەندى ياخى بن. بەم جۇرە پا رچە بۇونى دەولەتى سەفەوى و نېبۇونى بازا رىكى گشتى و هەروەھا نېبۇونى پەيوهندى ئا بۇورى لە مەلېنەدە جۇربەجۇرە کانى شادا كۆنترولى تى يولەكانى زۇر سەخت و گران كردىبوو. بە درىزايى ئەم سەردەم خاۋەن تى يولەكان زۇربەي ھەولىيان ئەوه بۇ تى يولەكانى خۇيان بىخەن بە میراتى و بى مەدرج، ھەر بۇيە دەبىنین لەم دەمدا راپەرينى و ياخى بۇون لە شا و حکومەتە كەمى شتىكى زۇرئاسا يە.

شا كانى ئىرەن و بە تايىبەتى شا عەباس ھەولىيان دا نەھىلەن تى يول بىبى بە میراتى و بى مەدرج، بەلام بارى ئا بۇورى و سياستى دەولەت نەك ھەر نا وەندىپتى بۇ شا پىك نەھىندا بەلكو رىڭىسى ھەول دان بۇ جىا بۇونەوهى لە لايەن دەرەبەگەكانەدە خۇشتى كەردى.

دەرەبەگەكان، كە ھەستىيان بە سەربەخۇيى ئا بۇورى خۇيان دەكەردى، ھەولىيان دەدا سەربەسپتى سياسيش بەدەست بىيىن، ھەر بۇ ئەم مەبەستە دايىم بە گۈزى دەولەتى نا وەندىدا دەچۈون و ھەركات حکومەتى شا لە كىزى و لوازىدا بۇ ياخى بۇونىش تەشەنەمى دەكەردى و حکومەتى دەخستە مەترسىيە وە.

شا عەباس لە سەرەتاي حوكىمپانى خۇيدا ھەولى دا ئەم دەرەبەگە پىر و ياخىيانە تەفر و تۇوتا بىكا. بەلام نە شاعەباس و نە شاكانى ترى پاش ئەو نەيان توانى بە تەواوي ئەم سياستە بەرن بەرىيە.

